



# bangaeq.ji kelhaamed

Kovara Îslamî, Çandî û Hunerî

Sal: 7 • Jimar: 28 • Bihar / 2015-2016 • Biha: ₪8

## Em Li Şerî'etê Xwedî Derkevin Wê Sîstema Zulmê Helweşe


Min Ji Te Re Gotibû

Sebebno!...


*Wîladeta Pîroz*

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)





*Gelî îsana! Ji bo vê heqîqetê ye ku Resulê  
Xweda (s.x.l) berî her qewmî bi kastr û terorîstê  
qewmê Xwe re 'herb kirîye. Ji wan dest pê  
kirîye û hîno hîno daîra mucadele û cîhada Xwe  
berstreh kirîye. Lewra 'herba musulmana bi kastrên  
qewmên wan re ne kirîneke kirêt û birakujî ye.  
Lewra emrê Xweda weha ye. Pêşî Resulê wî  
ev tişt tetbîq kirîye. Hem jî musulman û kastr ne  
birayê hev in. 'Heramîya mezin û birakujî ew e  
ku musulman xwebixwe bi hev re 'herbê bikin.*





# Qewmê Minê Mezlum û Jar

✍ Mela Mîzgîn

Qewmê minê mezlûm û jar  
İslam e riya îzzetê  
Qewmê minê bê hêz û zar  
İslam e riya îzzetê

İslam e dînê 'alemî  
İslam e şer'a xatemî  
İslam e roja her demî  
İslam e riya cennetê

**Dozên kufaran vala ne  
We'dê di wan bêewle ne  
Tev pûç û xap û hîle ne  
İslam e riya îzzetê**

İslam e riya rûmetê  
İslam e riya quwwetê  
İslam e riya murwetê  
İslam e riya cennetê

Ev fikr û dozên kafira  
Ev tevgerên xap û vira  
Qet ji me re nabin çira  
İslam e riya îzzetê

İslame riya wehdetê  
İslam e riya nesretê  
İslam e riya qudretê  
İslam e riya cennetê

Ev sazumanên kafirî  
Ev partiyên bêbawerî  
Şahî nebirne tu derî  
İslam e riya îzzetê

İslam e dînê re'hmetê  
İslam e riya şefqetê  
İslam e şeklê 'hurmetê  
İslam e riya cennetê

Em dûrî wan dozan herin  
Em xwe bi dînê heq girin  
Ya rast ev e şîret werin  
İslam e riya îzzetê

İslam e riya şadiyê  
İslam e riya merdiyê  
İslame riya zindiyê  
İslame riya cennetê

Ala Xweda hildin mila  
Eşqa xweda bêxin dila  
**Mîzgîn** bidin qewm û gela  
İslam e riya îzzetê

İslam e dermanê kula  
İslam e her nûra dila  
İslam e gulzara gula  
İslam e rêya cennetê





# RÊYA AZADÎYÊ

✍ M. Mustefayê Mele Elîyê Ezdarî

Rêya azadiya însan  
Her zeman rêya Rehman e  
Ji boy bîndest û mezlûma  
Nebîyên wî pêşîvan e

Wekî her dem û her zeman  
Muhemmed e ji mer rêzan  
Xelasîya her du cîhan  
Rêya wîye vê bizane

Dînê Xweda ye ji mer nûr  
Me tê de her diye hizûr  
Yek demê em jê nebin dûr  
Dûrbûna jê, lew xusran e

Heqq û mafê her însanî  
Xuda ew kirye nîşanî  
Bi teqwayê ye meznanî  
Tu qewm ne meznê qewman e

Ey gelê meyî musulman  
Guh nede fikrê kâfiran  
Çarew xelâsiya gelân  
Daîm sunnet û Qur'an e

Meqседа kafira ku em  
Biqetin ji Rebbê 'âlem  
Bibin tabî'ê wan her dem  
Ji wan ra bibin perwane

Ew dixwazin em şulam bin  
Ji bonî wan timî ram bin  
Neyarê ehlê Îslam bin  
Ma ev tevde ne xuyane?

Ji Xuda em pir dûr kirin  
Ji hevdû em hûr hûr kirin  
Xelqê feqîr meğdûr kirin  
Dinya li me lew zindan e



[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)



## بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

الحمد لله رب العالمين على الرسالة المحمدية والايان بها، والصلاة والسلام على خير خلقه محمد طب القلوب ودوائها وعافية الأبدان وشفائها ونور الابصار وضيائها وعلى اله وصحبه اجمعين

Ji Kovara **Kelhaamed** re demsala biharê, bidawîbûna salê ye. Havîn ji destpêka salê ye. Bi derketina hejmara me ya 28emîn sala me ya 7emîn tamam dibe. Di dawiya sala me ya heftemîn de bi pêşkêşkirina vê hejmarê ji xwendevanên xwe re em dilşad in û ji Rebbê xwe re hemd dikin.

Ji me re me'neke muhîmtir heye ji bo demsala biharê. Çimkî rehberê xelasiya insanan û rehberê însaniyetê, ewê ku bûye rehmet jibo hemî 'aleman, di biharê de hatiye dinyayê. Evîndarên Pêxember ('e.s.w) bi îdrakkirina wîladeta pîroz, gund û bajarên Kurdistana bakûr û derûdorên din ên ku destê wan dighêjê bi selewat û tekbîr û xwendina mewlûdê tînin 'eşq û coşê.

Ji ber ku me jî wîladeta pîroz îdrakkir... û ji ber ku Xwedê Mûhemmed 'eleyhisselatû wesselam bi pêxembertî şandiye û me pê îman aniye, bi qasi hesenatên Mûhemmed 'eleyhisselatû wesselam û kemalatên Wî û berhemên wî û faîdeyên Wî û bi qasî hesenatên alê Wî û eshabên Wî û ummeta Wî em dîsa hemd ji Xwedê re dikin.

Xwendevanên Hêja!

Emperyalîzma dinyayê, emelên xwe yên qirêj li ser erdnigariya Îslamê didomîne. Sûriye, Filistin, 'Iraq, Yemen, Misir...

Û Kurdistan. Ji alîkî ve hêz û rêxistinên xwedênenas, dinyaperest û dijminê dîn; ji aliyê din ve jî rejîmên zalim li ser hesabê qewmê Kurd, di Kurdistanê de emelên qirêj ên mustekbiran, yek bi yek bi cî tînin. Li rojava remz û nîşanên Îslamî hatin yasaxkirin, dixwazin bi zora xwe her Kurdî bikin komunîst. Li Bakûr Cizîr, Nisêbîn, Farqîn, Gever, Şernex, Silopî, Sûra Kelhaamed û hwd. Tev kirin koncal, li Kurdan herimandin; camî, medrese, Quran û kitêb dan ber gulla; xanî xera kirin, mal telef kirin, ciwanên Kurdan di koncalan de kuştin û dan kuştin. Roj ji rojê xerabtir tê.

Kovara Kelhaamed li hember vê rewşê misyona xwe bikar tîne. Nivîsa Cewad Qemerî "**Se-bebno**" rewşa bakûr bi çîrokekî teswîr dike. Nivîsa Fethullah Yalçın "**Ev Çi Dewre Îlahî**" tercumantiya jana dilê xelkê herêmê dike. Nivîsa Mûhemmed Şakir "**Min Ji Te re Gotibû**" wek ava ku diherike bi zimanekî edebî ku şopa wê di hişê meriv de neqş dike "halê insanê herêmê" teswîr dike û Evîndarên Pêxember tîne ber çava. Bi nivîsek din jî Kovara Kelhaamed, ji 'alim û rêzanên herêmê Reçeta Kurda dertîne holê û dibêje "**Em Li Şerî'etê Xwedî Der-kevin, Wê Sîstema Zulmê Helweşe**". Nivîsa Mela Salih Mîsqeynterî "**Wiladeta Pîroz**" jî her wekî navê xwe şeklê wîladeta pîroz bê ku çawa bûye rehmeten lîl'alemîn nêzi ber zihna merev dike.

Her wiha nivîsên me yên din jî yek ji yekê xweştir û balkêştir bi hêviya ku hûn xwendevanên 'eziz ji wan fêdê bibînin hatine amadekirin. Bi vê munasebetê em malavayiya xwe ji nivîskarên xwe re verêdikin û we digel kovarê bi tenê dihêlin.

Ji Weşankar / .....	1
Gelî Wanê ku Îman Anîne!.....	3
Reçeta Kurdan - 'Erebî / Abdussamed Hilmî.....	4
Reçeta Kurdan - Latînî / Abdussamed Hilmî.....	6
Ev çi Dewre Îlahî / Fethullah Yalçın .....	8
Exlaqê Resulullahî Ra / İbrahim Çabaxçurî .....	13
Her tim Zîkr Kên Homerî / NUREDDÎN KAWARÎ ...	13
Di 'Hedîsên Axirzeman de / Selamiyê Bilêderî .....	14
Ey Resulê Xweda / Mamoste Hezexî .....	15
Birano / Ezîz Mezraqenterî.....	18
Numuna Wezîfedarîyê / Ehmed Zeytunî.....	19
Sureyê 'Eleq / Yusuf Arifoğlu .....	20
Têt/ Şêx 'Elîyê Herîrî .....	23
Şêx 'Elîyê Herîrî - 2 / Ehmed Zeytunî.....	24
Wîladeta Pîroz / Mela Salih Misqeynterî.....	26
Diletî / Mehmed Mircan.....	28
Nur Muhammed / Mela Salih Misqeynterî.....	29
Li ser Biratiyê / Yehya Êzderî.....	30
Xortên Mu'hemmedî / Veysi Uçar.....	31
Min ji te re Gotibû / Muhammed Şakîr .....	32
Dîrok û Halê Ummetê / Nureddîn Qoserî.....	34
Dewra 'Ebbasîyan Dewletên Kurd / Yasîn Demir... 36	
Baran têê, Baran Têê / Ehmed Nas .....	39
Komkujiya Helepçe / M. Mehmûd TIBYATÎ .....	40
Helepçe / Azad Rêbîwar.....	41
Sebebn!! / Cewad Qemerî .....	42
Gotinên Peşîyan .....	44
Dayê / Mela Mîzgin .....	45
Mizgeft Namusa Bawermendane / İbrahim Êlihî... 46	
Ziman û Jîyan - 2 / Şerîf Emîn.....	48
Şahê Teyran û Qîjîk / Kamûran Turgay.....	50
Çima Du'ayê me Qebul Nabin / Fesîh Memîş..... 51	
Xwedîyên Bağa / M. Emîn Zeynî .....	52
Tew Dinyayê / Cewdet Karaman .....	55
Bexçê Zarokan .....	61

## Hin Şîretên Qur'anî



Muhammed Bécirmanî

10


## Nî'meta Herî Mezin Îman e



Mustafa Tûran

16

## Dîroka Îslamêda Dewletê Kurd



Yasîn Demîr

36

Sal (Yıl) : 7 ❖ Jimar (Sayı) : 28 ❖ Biha (Fiyat) : 8 TL

Bihar (Adar - Nisan - Gulan) 2016

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran  
(Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN

Çiyê İdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik  
Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL

Têkilî (İletişim - Sipariş):  
Tel : 0212 562 60 06

Web: www.kelhaamed.com

Mail: bangaheqq@gmail.com

PIT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91

Yaygın Süreli

Çapxane (Matbaa):

DERGAH OFSET : 0212 489 33 33

Nîşe (Not): Mesuliyeta Ramanên Nivîsaran aîde Nivîsaran e.  
Berhemên tene şandin nayên veğerandin.





Ji Qur'an A Mecîd Çend Pend Û Şîret

# GELÎ WANÊ KU ÎMAN ANÎNE!

- Gelî wanê ku îmananîne! Dema hûn ji bo wex-tekî navdayî deyn didin hev, hûn wî binvîsin. Bila ji nav we katibek dadperwer wî binvîse. Û bila tu niviskarek xwe nede paş û bi çi hawayê ku Ellah Te'ala ew daye hînkirinê (bila wisa) zû binvîse. Bila deyndar jî deynê xwe bide nivîsandin. Û bila (deyndar) ji Rebbê xwe bi tirse û bila ji deynê xwe tu tiştêkî kêr nehêle. Eger deyndar yan nezan û sexik yan jî zê'îf be û nikaribe (deynê xwe) bide nivîsandin, wê demê bila weliyê wî bi 'edalet (deynê wî) bide nivîsandin. Û hûn ji zilamên xwe du mêran şahid bigrin. Eger du zilam tunebin wê çaxê du jin û mêrekî ku hûn ji şahidiya wan emînin şahid bigrin. Eger yek ji wan (jinan) ji bîr bike dibê a din wê hişyar bike û têxe bîrê. Û dema şahid bîn gazî kirin bila teksîr nekin (û şahidyê bikin.) Çi piçuk û çi mezin dibe (ew zane) hûn ji nivîsandina deyn bi tevî wexta (dayîna) wî ne kerixin. Ev li nêk Ellah tela bi 'edalettir e (û hem jî) ji bo şahidiyê qewîtir e. Û (hem jî) ji bo ku hûn nekevin şubhê çêtire. Lê eger ticareta we bi danûstana pêşin be û hûn di nav xwe de bidin hev û bistînin, eger hûn wî nenvîsin tu gunehkarî ji we re nine. Dema hûn danûstanê dikin şahida bigrin. Ne bila niviskar û ne jî bila şahid zirarê bibîne. Naxwe eger hûn zirarê bidne wan bê guman ev ji we re gunehkarî û ji rêderketine. Ji Ellah Te'ala bitirsin. Lewra Ellah Te'ala hûn 'elimadin. Ji xwe Ellah teala bi her tiştî di zane.

(Beqere: 282)

- **Gelî bawermendan! Eger hûn bibin peyrewê firqeyek ji wan firqeyê ku kitêb ji wan re dahatîye ew dê we piştî îmananîna we vegevin ser kufre (Alî İmran: 100)**

- Gelî bawermendan! Bi heqqî (li ser teqwayê) ji Ellah Te'ala bitirsin. (Xwe ji hemî munkerat û neqenciyên şîrk û kufre biparêzin) û ji bil musulantîyê (li ser tu 'halî nemrin. (Alî İmran: 102)

- **Gelî bawermendan! (Eman ha eman) hûn wan kesên ku ne ji we ne ji xwe re nekin sirdaş. (Lewra) ew ji bo ku xerabîyê bi we bikin teksîr nakin. Tim dixwazin ku hûn di tengasîyê de bin. (Gelo ma hûn nabînin ku) bê gûman kîn û kerb ji devê wan tê der. (Lê) ew kîn û kerb a ku ew di dilê xwe de vedişêrin hê mezintir e. Bê gûman eger hûn li ser bi fikirin me ayetên xwe ji were beyan kirine (Alî İmran: 118)**

- Gelî bawermendan! Faîza ku qat bi qat tê zêdekirin nexwin. Ji Ellah Te'ala bitirsin da ku hûn bigîjin fela'hê. Û hem ji wî agirî bitirsin ku ji bo kafira hatiye amadekirin. (Alî İmran: 130-131)

- **Gelî bawermendan! Eger hûn ita'eta kafira bikin ew dê we bi paş ve vegevin (û têxin nav kufir û şîrk û tû'xyanê. Bi vî hawayî) hûn dê (li dinya û axretê) têkevin xusran û xesaretê. (Alî İmran: 149)**

### حەقیقەتی

ج: - «بەلێ، کەسێ حەقیقەتی ناسبکە خاتری وێ ژبۆ تو خاتری فەدا ناکە. چمکی خاتری حەقیقەتی دسەر هەر خاتری پرەیه، گەرەك ژبۆ تو خاتری نەبێ فەداکرن. بەس ئەز قی حوسنوظەننا وه (یا بنەزانی) قەبولناکم. چمکی دبه کو هون ژموفسیده کیره ژێ ژحیلە بازە کیره ژێ قی حوسنوظەننی بدن نیشاندان. لازمه هون ژيرو شیاری، لدەلیلو عەقیبەتی بنەرن»

لازمه هون بخوهشکرنا دهقی هەر ئینسانی نەبێن خاپاندن. هوننی بدەلیلو عەقیبەتی وان ژههف ناسبکن. دەلیل قورئانو سوننەتە، عەقیبەت ژێ عەمەلکرنا بهەردوانە. کەسێ بقورئانو سوننەتی خەبەر بە ئو عەمەلی وێ نە لگۆرا وانبه مومکنه کو ئو کەس حیلە بازە کێ خاینبه

س: - «ئەمێ چەوا وان فیم بکن ئو ژههف بقەتین؟ ئەم جاهلن، ئەم ئانجاخ کەسێن وهك وه ئەهلێ علمی تەقلید دکن»

ج: - «هەر چقاس هون جاهلین (وه علم نەخوهندبه) ژێ هون بعاقلن. مەشەلا ئەز بکی ژوهره مهویژا پار بکم هون کارن بزەکا خوه من بخاپینن (پری مهویژا ئو قەنجی وان هون کارن بنالی خوده بدن). دیمەك جاهلتیا وه نە مەعزەرەتە. ها! دە ئیژا فەرقا نافیننا دارین

فیکیا فیکینە» فەرقا نافیننا وان ئینسانی کو گۆتنی وان وه کەهەقن ژێ عەمەلی وانە. کەسێ کو گۆتنا ویو عەمەلی وێ موافقی شەریعەتیبه هون لوی بنەرن «مادەم وه پێیه هون لئەنجاما فکری من و فکری وان بنەرن: ها! قا هون دینن، دیه کیده ئیستیراحەتو ئیطاعەت هەیه» تشتی کو ئەز دبیژم دەما بیبه جی وئ موسلمان تەف لدۆرا قورئانی بجقن، ظالم وئ نکیحوه بکشینن بهرخوه، ئو وئ موئمن رحەت ببنو ئیطاعەتا ئەمری شەریعەتی بکن

«دئیدندە ژێ زرار و ئیختیلاف فەشارتیبه» بزمانی خوه چقاس گۆتینی خوهش بیژن ژێ دئەنجاما گۆتنی وانده

ژبۆ خەلکێ موسلمان ئیختیلاف و زرار فشارتیبه، «ئەز میئالک دن ژێ ژوهره بیژم: دقن صەحرا پیئشیا مەدە (یانی دپاشەرۆژا مەدە) ئاگرکی خویا دکە، ئەز دبیژم ئەو (تشتی کو دئیستیقباڵیدە دینم) نوره، (دزەمانی پیئشیا مەدە نورا شەریعەتی خویا دکە)، هەگەر ئەو نە نوریه ئاگر بە ژێ ئاگرکی زەعیفە ژئیستیدادا کەقن مایه. وەرن ئەم لدۆرا وێ بجقن، لی خودی دەرکەقن، ژێ فەیز بستینن، برا تەبەقا ئاگر بچرە، (ئەم لشەریعەتی خودی دەرکەقن وئ سیستەما ظولمی هەلوەشە) وەرن ئەم ژێ ئیستیفادە بکن. هەگەر ئەو تشتی ئەز دینم نورا شەریعەتیبه ئەمێ ژێ ئیستیفادە بکن. لی هەگەر وهك هاوی کو ئەو دبیژن ئاگر بە ژێ مە ناشەوینە، چمکی مە ئەو تەفەندایه»

«ئەوژی پاشەرۆژی حس دکنو دبیژن؛ ویا ئاگرە کێ بشەواطه. بەس وهك هاوی ئەز دبیژم هەگەر ئەو تشت نوریه (شورایا شەریعی وەرە) وئ قەلبو چاقی وان کۆریکە. ئو ئەگەر ئەو تشت ئاگر بە (دەورا ظولمە کە نو دەست پی بکە) وئ جانو بەدەنا وان بشەوینە. چمکی «نورا سەعادەتی» یا کو ئەو ژپره دبیژن ئاگر لکیرا طەرەفی دنیا پی دەرکەتبه، بملیونا خونا ئینسانا وهك جیژی ئاقی بسەر دەهاتبه پزاندنژی نەهاتیبه طەفاندن. حەتا ئەف دو ساله (چەند سالن) دوولاتی مەدە دو سێ جارا تەشەببوسی طەفاندنا وئ هات کرن، بەس کەسێ خوهستن بطەفینن ئەو هاتن طەفاندن»

س: - «ئەوی کو تە گۆت وئ وەرە ئەول تە گۆت نە ناگرە، نەهازی تو بچاقی ئاگر لی دنەری؟ (کیژان ژقان راسته)»

ج: - «بەلێ، نور ژبۆ خەرابا ئاگرە، وان دشەوینە»





# نهم لشهريعتي خودي دهرکهفن وي سيستهما ظولمي ههلوهشه

عبد الصمد حلمي

## بسم الله الرحمن الرحيم

کو د ئه رضو ئاسیمان هلنایب د قهلیبی موئنا هلتن،  
ژبهرفی لازمه قهلب وهره موخافهزه کرن، گوتنا کو  
هات گوتن ئهول گهرهک لمیزینا قورئان و سوننه تیکهفه،  
کو نه لگور وی میزینیه گهرهک ری لهر نه یی فه کرن  
هه، ده ئیژا گوتنا کو من ژوهره گوت برا ددهستی  
خیالنده بمینه (یانی پچکی لسه ری بفرن، لمیه نکا  
قورئان و سوننه تیخن) کو زیر دهرکهت دقهلبده  
موخافهزه بکن، کو پاخر دهرکهت گهلهک غهیهت  
و نفرای پیشه بکن ئو لمن بزفرین ژغیری قورئانو  
سوننه تی پیشه دتو دهرین دیده لحه قی نه گهرن. ده ما  
کو وه دیت گوتنا من لگوری قورئان و سوننه تییه  
موخافهزه بکن، یان نا گوتنا من لمن بزفرین. دهرحه قی  
ههر گوتنا کو وه بهیسته ژي فی ری بشوینن، دا  
کو موفسد و ره به نۆکی کو بوان هاتنه خاپاندن وه  
نه خاپینن.


س: - چما تو دهرحه قی حوسنوظه ننا مه یا ژته رده  
سوئی ظه ندکی (تو ناهیلی ئه م ته زلامه کی قهنجو  
زانا بینن، گهر تو وهر بکی ئه م دهرحه قی ته ده ظه ننن  
خه راب بکن) حال ئه وه کو پادیشاهو حکومه تی  
به ری نکاربون ته ژحه قی بزفرین، ژۆنتورکان نه کارین  
سه ریته بطه وینن و ته بکن شه لاقی خوه. چمکی ته  
ثاقتین چیس، وی ته دالقاندانان، ته خوه زه لیل نه کرن،  
تو بروین خوهی سپی دهرکه تی. هه م وی مه عاش  
بدانان ته، ته قه بول نه کرن. دیمه ک فان گوتنا تو نه  
ژبو طه رفداریا وان دپیژی، ئه وچاخ تو طه رفدارئ

س: - چما تو ژفانا ته قاره دپیژی نه باشن؟ حال ئه وه  
کو فانا وهک خیرخوایین مه خویا دکن که سی کو  
دخوازه قه وم ژه هف بقه تن ئو ههر قه وم دنا فخوه ده بیه  
سه ربخوه، ئو که سی کو ده عوا جمهوریته تی دکن ئو  
ده عوا ده مؤقراسی دکن وهک هوی خیرخوایین مه خویا  
دکن، قه ی نه باشن؟

ج: - تو موفسد نایژه ئه ز موفسد. ههر دائم  
د صورته تی حه قده تی خویا کرن، یان ژي موفسد  
(سه به ب کو جاهله) باطلی حه ق دینه. به لی،  
که س نایژه ده وی من طرشه، به س حه تا کو هون  
لمیه نکن نه خن نه ستین موفسد نایژه ئه ز موفسد،  
مونا فقی نایژه ئه ز مونا فقم، فانا دصورته تی حه قده خوه  
نیشاندن. یان ژي فانا سه به ب کو جاهلن حه ق و  
باطلی ژه هف ناس ناکن، ئصلاح و ئیفسادئ ژه هف  
ناس ناکن، باطلی د صورته تی حه قده دینن. دقئ  
وه زیه تیده ناسکرنا فانا بمیزینا قورئان و سوننه تی یه.  
عه لامه تی ئه هلی ئیصلاحی ئیمان و عمه لی صالحه،  
ئه هلی ئیفسادئ ژي عمه لی وان نه صالحه ئو ددن دو  
وان که سی کو عمه لی صالح ناس ناکن.

چمکی دتیجاره تیده گهلهک گوتن و په ری قه لب  
دگهرن، حه تا گوتینن من ژي سه به ب کو من گوته  
بحوسنوظه نی لئ نه نهرن ئو به مامی قه بول نه کن،  
به لکی ئه ز ژي موفسدبم یان ژي بنه زانی ئیفسادئ  
دکم. ئه و چاخ ریا چونا بهر بقه لقه نه دن بهر ههر  
گوتنی قه لب عه رشئ ئیماننا بخوه دایه، ئه و خوه دایئ

# Em Li Şerî'etê Xwedî Derkevin Wê Sîstema Zulmê Helweşe



✍ M. 'Ebdussamed 'Hilmî

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

S: - **“Çima tu ji vana re dibêji ne baş in? Hal ewe ku vana wek xêrxwazê me xuyadikin.”** Kesê dixwaze qewm ji hev biqetin û her qewm di nav xwe de bibe serbixwe û kesê ku de'wa cumhûriyetê dikin û de'wa demokrasîyê dikin wek hawê xêrxwazê me xuya dikin. Qey vana ne baş in?

C: - **“Tu mufsid nabêje ez mufsid im. Her daîm di sûretê heq de tê xuyakirin. Yan ji mufsid (bi sebeb ku cahil e) batilê heq dibine. Belê, kes nabêje dewê min tirş e. Bes heta ku hûn li mihengê nexin nestînin.”** Mufsid nabêje ez mufsid im. Mûnafiq nabêje ez munafiq im. Vana di sûretê heq de xwe nîşandidin. Yan jî vana bi sebeb ku cahil in, heq û batilê ji hev nasnakin, îslah û îfsadê ji hev nasnakin batilê di sûretê heq de dibinin. Di vê wezyetê de naskirina vana bi mêzêna Quran û sunnetê ye. 'Elametê ehlê îslahê îman û 'emelê salih e. Ehle îfsadê jî 'emelê wan ne salih e û didin dû wan kesê ku 'emelê salih nasnakin.

“Çimkî di ticaretê de gelek gotin û perê qelp digerin. Heta gotinên min jî bi sebeb ku

min gotiye bi husnûzennê lê nenerin û bi temamî qebûlnekin. Belkî ez jî mufsid bim. Yan jî bi nezanî îfsadê dikim. Ew çax riya çûna ber bi qelb ve nedin ber her gotinê.” Qelb 'erşê îmana bi Xweda ye. Ew Xwedayê ku di erd û asîman hilnayê di qelbê mumina hiltê. Ji ber vê lazim e qelb were muhafezekirin. Gotina ku hat gotin ewil gerek li mêzêna Quran û Sunnetêkeve. Ku ne li gor wê mêzênê be gerek rê li ber neye vekirin.

“Ha, de îja gotina ku min ji we re got bira di destê xiyalê de bimîne (yanî piçkî li serê bifikirin, li mîhenga Quran û Sunnetêxin). Ku zêr derket di qelb de muahfezebikin. Ku paxir derket gelek ğeybet û nifira jî pêvebikin û lîmin bizivîrînin.” Ji ğeyrî Quran û Sunnetê pêve di tu derên dî de li heqiyê negerin. Dema ku we dît gotina min li gorî Quran û Sunnetê ye muahfeze bikin. Yan na gotina min li min bizivîrînin. Derheqê her gotina ku we bihîst de jî vê riyê bişopînin. Da ku mufsid û rebenokê bi wan hatine xapandin we nexapînin.



S: - **“Çıma tu derheqê husnûzena me ya ji te re de sûzendikî (tu nahêlî em te zilamekî qenc û zana bibinin. Ger tu werbikî emê di heqê te de zennê xerabbikin). Hal ewe ku padişah û hukûmetên berê nikaribûn te ji heqiyê bizivirinin. Jonturkan nekarîn serê te bitewînin û te bikin şelaqê xwe. Çimkî te avêtin hepse, wê te daleqandanan, te xwe zelil-nekir. Tu bi rûyê xweyê sipî derketî. Hem wê me’aş bidanan te, te qebûlnekir. Dêmek van gotinan tu ne ji bo terefdariya wan dibêji. Ew çax tu terefdarê heqiyêyi.”**

C: - **“Belê, kesê heqiyê nasbike, xatirê wê ji bo tu xatiran fedanake. Çimkî xatirê heqiyê di ser her xatirî re ye. Gerek ji bo tu xatirî neyê fedakirin. Bes ez vê husnûzena we (ya bi nezani) qebûlnakim. Çimkî dibe ku hûn ji mufsidekî re jî, ji hîlebazekî re jî vê husnûzenê bidin nişandan. Lazim e hûn jîr û şiyarbin. Li delil û ‘eqîbetê binerin.”** Lazim e hûn bi xweşkirina devê her însanî neyên xapandin. Hûnê bi delil û ‘eqîbetê wan ji hev nasbikin. Delil Quran û Sunnet e. ‘Eqîbet jî ‘emelkirina bi herduwane. Kesê bi Quran û Sunnetê xeberbide û ‘emelê wî ne li gora wan be mumkun e ku ew kes hîlebazekî xayin be.

S: - **“Emê çawa wan fêmbikin û ji hev biqetinin? Em cahil in. Em ancax kesên wek we ehlê ‘ilmê teqlîddikin.”**

C: - **“Her çiqas hûn cahilbin (we ‘ilim nexwendibe) jî hûn bi ‘aqil in. Mesela ez bi kî ji we re mewîja parbikim hûn karin bi zeka xwe min bixapînin. (pirê mewîja û qencê wan hûn karin bi alî xwe de bidin.) Dêmek cahiltiya we ne me’zeret e. Ha! De îja ferqa nevbêna darên fêkiya, fêkî ne”** ferqa navbêna wan însanê ku gotinê wan wek hevin jî ‘emelê wan e. Kesê ku gotina wî û ‘emelê wî muwafiqê şerî’etêbe hûn li wî binerin.

“Madem werêye hûn li encama fikrên min û fikrên wan binerin: Ha! Va hûn dibinin. Di yekî de îstîrahet û îta’et heye.” Tiştê ku ez di-

bêjim dema bêne cî wê musluman tev li dora Quranê bicivin. Zalim wê nigê xwe bikşînin ber xwe. Û wê mumin rihet bibin û îta’eta emrê şerî’etê bikin.

“Di ê din de jî zîzar û îxtîlaf veşartiyê.” Bi zîmanê xwe çiqas gotinê xweş bêjin jî di encama gotinê wan de ji bo xelkê musluman îxtîlaf û zîzar veşartiyê.

“Ez mîsalik din jî ji we re bejim: Di vê sehra pêşiya me de (yanî di paşeroja me de) agirî xuya dike. Ez dibêjim ew (tiştê ku di îstîqbalê de dibînim) nûr e. (Di zemanê pêşiya me de nûra Şerî’etê xuya dike.) Heger ew ne nûr be, agir be jî agirî ze’îf e, jî îstîbdada kevn maye. Werin em li dora wî bicivin, lê xudîderkevin. Jê feyz bistînin. Bira tebeqa agir biçire. (Ger em li şerî’etê xudî derkevin wê sîstema zulmê helweşe). Werin em jê îstîfdebikin. Heger ew tiştê ez dibînim nûra şerî’etêbe emê jê îstîfdebikin. Lê heger wek hawê ku ew dibêjin agir be jî me naşewitîne, çimkî me ew tevnedaye”.

“ew jî paşerojê hisdikin û dibêjin: Wiya agirekî bi şewat e. Bes wek hawê ez dibêjim heger ew tişt nûrbe (yanî şûraya şerî’î were) wê qelb û çavê wan korbike. Û eger ew tişt agirbe (yanî ger dewra zulmeke nû dest pê bike) wê can û bedena wan bişewitîne. Çimkî “nûra se’adetê” ya ku ew jê re dibêjin agir, li kîja terefê dinyayê derketibe, bi milyona xûna însana wek cêrê avê bi ser de hatibe ri-jandin jî ne hatiye tefandin. Hetta, ev du sal e (yan jî çend sal in) di welatê me de du sê cara teşebbusî tefandina wê hatkirin. Bes kesê ku xwestin bitefnin ew hatin tefandin.”

S: - **“Ewê ku te got wê were, ewil te got ne agir e. Niha jî tu bi çavê agir lê dineri (kîjan jî van rast e?)**

C: - **“Belê nûr jî bo xeraba agir e.”**

# Ev Çi Dewr e Îlahî

✍ Fethullah Yalçın

Sal û zeman, şev û roj şahidin ji bo vê tarîxê.  
Dî piştî mêvanên se'âdetê gelek dewran derbas bûn.  
Bî sedsala zeman ku dewr bûn li ser erd û axa me  
Min ji geman dunyayek ava kir li ser axa vî welatî  
Qerejdağ di sênga me de hê jî dişewite  
Dişewite hênkayî, dihele aşîtî.  
Hebûna me ji kitêbê bû, kitêb û 'îlim biratî  
Azadîw serxwe bûn bi kalamê qedîm ava bûn  
Pirtûka reş, agirê zerdûşt me dixapînin.  
Ji çirav û zaboqa azadîyê derbasî nabe  
Belê ji azadîya heqîqî xeber tune ye  
Ey kole û gûlamên esareta zulm û kufrê  
Ji rezaleta we kûçik fedî dikin  
Roj heye ku ruyê we ji sîla azadîyê biteqe  
Jîyan di çalîk û koncala de 'asê bûye.  
Li bin sûra Diyarbekir, li ber deryê camîya mezin,  
Li 'hewşa Endulusê rûniştîm û ez girîyam  
Bang û qêrîn e ji camîya Qudsê  
Ji halê xwe re ez kûr fikirîm ya îlahî  
Ev bar zêdeyî qaweta min e, ez dibinde qamet nakim.  
Bar giran e li ser milan, taqet nakim.  
Berya mecnûn ez dîn bûm, min hiş berda li ser Dîyarbekir.  
Ji bajarkî bêtir kanîya 'îlm û 'îrfan, ciw warê 'urf û tarîx, mîrasa pêşîyan  
Ez hêjî dîn û meczûb im, ne gihîştîm leyla.  
'Eşq daîma li pişt derî ye, ev derî li ruyê min tim girtîye.  
Dî piştî Leyla ez brîndar bûm ji 'halê vî bajarî digrîm dinalim ez bê halim.  
Ev çî dewr e Îlahî rûhê min naqedîne  
Dil ne Kelha Amed'e van derda bihebîne  
Derd bûne kûra gema her yek tèn bi hezara  
Derve 'alem şewitand hundir min dihelîne  
Ey xwedyê mohr û wehyê qeder lime nivîsîn  
Ji kerba azadîyê kulîlkê me çilmisîn  
Rûzemîn 'eware ye çênabe sekn û hedan  
Dî heyûla xelasî de'wû doz tev xemişîn  
De'wû dozên gemarî hemî kevn bûn rizîyan  
Dî çerxa felekê de li şerq û gîrb helîyan  
Hebûna wan ne ji bo xelasîya însan in  
Azadîya me însan ew mîrasa pêşîyan  
Azadî, azadî, azadî  
Dema însan di secda bendeê de hunda bû  
Ew hunda bûn hebûniye  
Dema min bigre himêza xwe ew dem.  
Lezzetê dunyewî têra min nakin  
Cennet li ber nigê min rêz dibe ew dem  
Nûrû rohnayîyê ku tu nebînî qebheta roj û hîvê tune ye.  
Perdê rake ji ser çava tê bighê jî ronahîyê  
Azadîw rohnayî nakevin nav xirbew kavila



Di ça'lik û koncala de ji 'asê nabin.  
Di dilê nûranîw sênga 'ilmê de efsûn kirîye  
Dûaw tekoşîna heq rêw û menzil in  
Duâ wek ava pişt bende ye, hêdi hêdi zêde dibe.  
Roj heye ku ew bend jiber wê xera bibe ew du'a ciyê xwe bigre  
Mucadele û dû'â şoreş û leşkerê nebez û bê ketin.  
Roj ew roj bû li hember Ebrehew leşkerê wî.  
Leşkerê me tunebûnan teyrên ebabîl hebûn, dû'â hebûn ji dil û can.  
Tarix pêşve çûnê qeyd dike, tarixa rêvegerê tuneye.  
Min huzna xwe li bedena Diyarbekir di nav kevirê hûnandî veşartibû.  
Agirek hat ji rojava,  
Ji şewata agirê nîfaqê ji nav derza kevirê tarîxê huzn û matem diherike.  
Bilûrvan kul û keder dirêjin newal û erxê welat.  
Menzil drêj e, rê dûr e  
Mjok û ximbilê ça'l û koncala xweyna me drêjin  
Bi qanda îsrail wehşî  
Ez keçika me'sûm, diya min porê min şeh dikir  
Xayîna di kaviil û koncalan de ez fetisandim  
Ez dibêr dilê diya xwe de bûm bi delalî  
Çetewariyê wehşî di ça'lika de ez xeniqandim  
Weka her dewrê di vê demê de ji karwan dimeşe.

### ŞEHÎD, ŞEHÎD, ŞEHÎD.

Şehîda me jibîr nekir, me şehîda  
Can Huseyn Ca'ferê delalî li ğurbet.  
Te bi nav malbata xwe şehadet vexwar veşartîw nepenî  
Çêlyên tarîw zulûmatê ji weka eslê xwe wehşî ne.  
Xwedyê vê zihnîyetê mel'ûn in.  
Tu ji boy menzilê av û nûrî xortê nûhatî.  
Dilê me şewitî li ser te kezêb peritî.  
Belê te me îhya kir di vê şeva tarî.  
Carek din hat famê welat ne ev der tenêye.  
Kurdistan, Turkistan, 'Arabistan, 'Ecemû Rom, cîyê azan tê xwendin herder welatê 'ezîz e ey can.  
Bi zimanê hal şehîd bersiva xwe dike gazî  
Di nav gulistanê de sorgulek nazende me  
Di eywana 'eşqê de ez yarek bazende me  
Geli dost û hevala ez şahidê de'wa heq  
Di roja se'y û cehdê merdekî ferzende me  
Yek caran ev dilêmin xweş bifirê dikeve  
Bazikê min li deryê 'eşqê sekin dikeve  
Hesret û evîna dil diqede bi yekcarî  
Rûhê min mest dibe ew dem bi şewq tê li heve  
Demsala her dewranê ger bihare gul ez im  
Di wexta zor û ğela zîlan û sumbul ez im  
Çi roja dunya tarî ji bo mizgîna dila  
Li asîmanê kerbê şalûr û bulbul ez im.

# Hin Şîretên Qur'anî

✍ M. Muhammed Bêcîrmanî



بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ  
تَبَّتْ یَدَا اَبِی لَهَبٍ وَتَبَّ مَا اَغْنٰی عَنْهُ مَالُهُ وَمَا كَسَبَ سَیْضَلِی  
نَارًا ذَاتَ لَهَبٍ وَاَمْرًا تُهَمَّالَةً الْحَطْبِ فِی جِیْدِهَا حَبْلٌ مِّنْ مَّسَدٍ

“ Herdû Destê Ebû Leheb ‘hişk bibin. Çawa ku ‘hişk bûn jî.

Mal û keda wî feyde neda wî.

Wê zatê (Ebû) Leheb bikeve agirekî pêfîhilda.

Jina wî ya ‘hemalê piştîyê sitirî û êzinga jî.

Ewa kû timî werîsekî ji lîfê pelê xurma di sitûwê wê de ye.”

Di heqê sebebê nuzûla vî sûretê de Îmamê Buxarî û hin ‘alimên din, ji Îbnî ‘Ebbas wiha rîwayet kirine:

Îbnî ‘Ebbas (r.a) dibêje: Rojekî Resûlê Xweda (s.x.l) derket ser girê Sefayê û gazî kir: YA SABA’HAH Qebî-la Qureyşîya lê civîyan. Resûlê Xweda weha got: Eger ez xeberê bidim we û bibêjim: “Dujmin vê sibehê yan jî êvarê wê bi ser we da bigre. Ma winê ji min bawer

bikin?” Teva gotin erê. Resûlê Xweda (s.x.l) got: “(Vê bizanibin) ez pêxember im. Ji aliyê Xweda ve ez ji we ra hatime şandin. Ez bi ‘ezabekî dijwar dizanim. (Eger hûn bawerî bi min neynin û ‘ta’ata min nekin hûnê bikevine wî ‘ezabî).”

Liser vê yekê Ebû Leheb ji Resûlê Xweda re got: “Zî-yan ji te ra be. Ma te em ji bo vê yeke civandin?”—



Liser vê gotina Ebû Leheb, Xweda ê Te'ala ev sûret nazil kir.

Îbnî Cerîr jî bi riya Îsraîl<sup>2</sup> ji Îbnî Îshaq wî jî ji 'alimekî Hemedanî<sup>3</sup> rîwayet kiriye ku pîreka Ebû Leheb sitirî davêtin ser riya Resûlê Xweda (s.x.l). Bi sebeb vê yekê ev sûret nazil bûye.

Îbnî Munzir jî rîwayeteke wek vê rîwayetê ji Îkrîme rîwayet kiriye.<sup>4</sup>

Gelî Însana! Xwedayê 'alemê bi vê suretê gelek şîretên muhîm li me dike û gelek mesûliyetên me hînî me dike. Mesela:

1. Xwedayê 'alemê şîret li me dike kû em li ber de'wetvanê dînê wî, ranebin. Lewra ê liber de'wetvanê dînê wî rabe 'eqîbeta wî weke Ebû Leheb li dunyayê zîyan û xesarete. Ên wilo ne malê wan, ne jî keda wan feyde nade wan û wan jî zîyan û xesaretê na parêze û xelas nake. Li axretê jî wê ew bikevin agirî bi pêtî û gurr.

Divê xusûsê de ferqa zîlam û pîreka tune ye.

2. Xwedayê 'alemê şîret li me dike ku em, ezyet û te'dê nedin ehlê wî û de'wetvanê riya wî. Lewra ê ku ezyetê bide wan welew pîrek be jî 'aqûbeta wî li dunyayê zîyane û li axîretê jî agir û xusrana ebedî ye. 'Hetta mirov bi çi tiştî te'de li ehlê Xweda bike, Xweda jî mirov bi wî tiştî dide 'ezabê. Weke ku pîreka Ebû Leheb li axretê bi werîsê xwe tê 'ezabkirin. Lewra wê bi werîsê xwe piştîyê sitirîya jî çiyê tanî û bi şev tavête ser riya Pêxemberê Xweda. Ji bonî ku sitirî di lingê wî de herin.

3. Xweda ê 'alemê li me şîret dike kû ji zerar û zîyanê pê ve feyda kesî di ezyetdayîna de'wetvanê riya wî de tune ye. Çawa Ebû Leheb û jina xwe jî, zerar û zîyanê pê ve ji vî karî tişteke neçînîn. Tarîx şahid e ku 'heta îro jî tu kesî ji zîyanê pêve feyde ji neyratîya de'wetvanên riya 'heq nedîtiye. Em Mensûbên 'Hîzba Xweda gelek çara bûne şahidê vê yekê.

4. Xweda ê 'alemê şîret li me dike û bi haweyekî vekirî beyan dike ku di dînê Îslamê de qewmîyet û nijatperestî tune ye. Fikra qewmîyetê fikreke şeytanî ye. Ji bonî ku pê jî dînê Xweda dîr bibin û li ser fikreke vala û pûç jî hev re bibin dujmin û hevdû bikujin, şeytan ev fikir avêtiye nav zarwê 'Hz. Âdem. Tu manekî ji fikra qewmîyetê re tune ye. Lewra temamê qewma însan in. Însan jî di eslê xwe de tev zarwê yek dê û yek

bavî ne. Zarwê yek dê û yek bavî jî bira û xuşkê hev in. Nexwe însan tev yek reh in, yek nijad in, yek qewm in û tev bira û xuşkên hev in. Ji ber vê yekê Xweda ev fikra bê me'neya şeytanî 'heram kiriye.

Binêrin, Ebû Leheb tevî kû 'emê efdelê mexluqabû jî jî ber kû îman neanî û dijberîya Resûlê Xweda (s.x.l) kir, Xweda ev sûretê Qur'anê di zema wî û jina wî de nazil kirîye û bi nav tê da zikra wî kirîye. Da ku 'heta qiyametê ji hemî însan û nesla re bibe ders ku nijadperestî û 'hemîyeta cahilî di Îslamê de tune ye. 'Heta qiyametê zema wî bi vî suretî têkirin.

Yahûdî jî tevî kû ji zuryeta Hz. Îbrahîm, Îshaq û Ye'qub in jî, jiber kû îman bi Resûlê Xweda (s.x.l) neanî û dujmintî pê re kirin, Xweda ê 'alemê di gelek sûret û ayetên Qur'anê de zema wan kirîye û le'net li wan anîye.

Di Qur'an û Sûnnetê de bi te'bireke din di dînê Îslamê de Xweda ê 'alemê însan tev kirine du sinif û bend. Sinifa musulmana û sinifa kafira. Benda Xweda û benda şeytan. Bi te'bîreke din jî sinfa 'adila û sinfa zalima. Yan jî sinfa mutî' û asîya.

Musulman, benda Xweda, 'adil û mûtî': Ew in kû îman bi xweda û bi pêxemberên wî anîne û li gorî emrê wan dijîn û dimeşin.

Kafir, benda şeytan, zalim û 'asî ji: Ew in kû bawerî neanîne û wek emrê Xweda û pêxember nameşin. 'Îsyana wan dikin û di erdê de texrîb û zulum û terrorîstiyê dikin.

Çawa ji her qewmî musulman hene herwiha ji her qewmî kafir jî hene. Belê musulman ji kîjan qewmî bin ferq nake. Xweda ew jî hev re kirine bira û ew wek milletek 'hesibandine. Kafir jî ji kîjan milletî dibin ew zane Xweda ew jî wek milletek hesibandine.

Îro em dibinin ku kafir ji kîjan qewmî bin ferqa hev nakin, daîma di dujmintîya Îslam û musulmana de alîkarîya hev dikin û ji hev re dibin pişteke. Hevsarê wan di destê şeytan de ye û şeytan wan dajo vî karê çepel.

Xweda ê 'alemê jî emrê musulmana kirîye kû ji kîjan qewmî dibin bila bibin lazime bê ferq di şer û cîhada bi kafira re alîkarîya hev bikin û ji hev re bibin quwet û pişteke.

Xweda ê 'alemê ji ber ku hem Xaliqê însan û kaînatê ye hem jî Xwedî û Sultanê wan e emrê benda

xwe, îbadên xwe yêñ musulmanên 'adil û mûti' kirîye ku bi benda şeytan a kafir, zalim û 'asî re mucadele û cihad bikin 'heta ku wan vegeerînin îman û îta'etê. Yan jî heta ew dev ji texrib û îfsad û terorîstiya xwe berdin.

Xwedayê 'alemê di cezakirin û îmhakirina kafir û terorîsta de, 'haşa ne kû ihtiyaca wî bi musulmana heye ku emrê wan dike bi şer û cihad û mucadela wan. Lewra bi qasî mirov çavê xwe bigre yan jî veke Xweda dikare teva bi carekî bimirîne û îmha bike. Lakin Xwedayê 'alemê ji bo sîrrê îmtîhanê muhletê didê kafira. Ji bo ku kufr û terorîstiya wan nişanê 'alemê bide da kû li axretê dema wan bêxe cehennemê û îsmê Xwe yê Qehhar li ser wan bide tecellîkirin seh neyê ser navê wî yê 'Adil.

Xwedê Te'ala digel îmkanê hindik jî emrê musulmana bi cihada kafira dike da ku dereca îta'eta wan a ji Xwe re nişanê 'alemê bide û dema wan li axretê bêxe cenneta ebedî û sîrrê îsmê Xwe yê Cemîl li ser wan bide tecellîkirin'edaleta wî jî pê re bi awayek aşîkar û tetmînkâr bê tecellîkirin.

Gelî îsana! Ji bo vê heqîqetê ye ku Resulê Xweda (s.x.l) berî her qewmî bi kafir û terorîstê qewmê Xwe re 'herb kiriye. Ji wan dest pê kiriye û hino hino daîra mucadele û cihada Xwe berfireh kirîye. Lewra 'herba musulmana bi kafirên qewmên wan re ne kirineke kirêt û birakujî ye. Lewra emrê Xweda weha ye. Pêşî Resulê wî ev tişt tetbîq kiriye. Hem jî musulman û kafir ne birayê hev in. 'Heramiya mezin û birakujî ew e ku musulman xwebixwe bi hev re 'herbê bikin. Lewra

Xwedayê 'alemê ev yek 'heram kiriye û musulman jî hev re kirye bira. Dînê Îslamê ev e. Ev yek bi Qur'an û Sunnetê û îcraata Resulê Xweda û se'habîyên wî sabit e. Ên kû bi vê yekê ne razîbin bila ji xwe re li dînekî din bigerin.

Gelî musulmana! Netîce eve: Dînê Îslamê dînekî 'alemî û cihanî ye. Xîtabî tevê însana dike. Qewmîyet û nijadperestî tê de tune. Li gorî Îslamê musulman tev yek milleti n. Yek 'hîzb û yek bend in. Tev birayê hev in. Kafir jî tev yek millet in, yek bend in. Di dujmunîtiya musulmana de tev alîkarîya hev dikin. Ferz e ku musulman jî di dujmîntî û mucadela bi kafira re alîkarîya hev bikin. Naxwe fitnê mezin dertên holê. Ev fitnê ku îro di 'alema Îslamê da mewc û pêl didin jî netîca vê îhmalê ne.

Resulê Xweda (s.x.l) çawa pêşî bi emrê Xweda zema 'emê xwe kiriye û binavê wî wî zikir kirîye divê em jî ji kafirê qewmê xwe destpêkin. Pêşî xerabî û kufra wan jî însana re beyan bikin û bînin ziman.

Lewra di her xusûsî de nûmûne û mîsal, Resulê Xweda (s.x.l) ye. Ev sûret jî di warê vê 'heqîqeta ku me zikir kir de delîleke mezin e.

Eger em di vê xususê de qelsîyê nişan bidin emê tu carî di mucadela Xwe de muweffeq nebin. Ne jî qewmê xwe re û ne jî tu kesî re emê nebin mîsaleke qenc. Lewra muweffeqîyet di tabî'tiya Qur'an û Sunnetê de ye û zafer ji ba Xweda ye.

Xwedayê 'alemê me teva mu'hafeze bike û nehêle em ji îstîqameta emrê wî şaş bibin. Ez xwe û we emanetî Xwedayê 'alemê dikim.

1-) Ev gotineke 'Ereba ye. Dema talûkekî dibînin jibonî qewmê xwe li hember wê

talûkê şiyar bikin pê gazî dikin. Bi me'na gazîkirina hewarê ye

2-) Îsrail Navê 'alimekî ye

3-) Ji wî 'alimê Hemdanî re tê gotin Yezîdê Kurê Zeyd

4-) Lubabunnuqûl fî esbabunnuzûl / Suyûtî

5-) Lewra Xwedê Te'ala ev dunya kiriye hola îmtîhanê

6-) Lewra nijadperestî û qewmperestî li gorî Îslamê 'heram e.

**Rîwayet:** Ragîhandin ango neqilkirina gotinekî ji yekî din.

Zîyan ji te ra be: Tu helak bibî.

**Nuzûl:** Dahatina we'hyê.

**Fikra qewmîyetê:** Ew fikre ku meriv çî heq û çî niheq tim û daîm piştgiyîya qewmê xwe bike û qewmê xwe ji herkesî çêtir bizanibe. Ne ew fikre ku meriv qencîya gelê xwe bixwaze. Di warê xêrê de daxwaza qencîya qewm 'hemîyetek Îslamî ye.

**'Em:** Ap.

**Dijberî:** Muxalefet

**Zem:** Rûreşkirin ango bi tirkî qinama.

**Nijadperestî:** Qewmperestî ango bi tirkî irqçilix.

**Mûti':** Îta'etkar

**Karê çepel:** Karê şaş

**Cihad:** Mana kelîma cihadê gelek berfireh e. Bi kurtî jî hemî xeyretên Îslamê re cihad tê gotin. 'Herba bi kafira re tenê beşek jî cihadê ye ku 'alim wek qital binav dikin.

**Seh:** Sî.

**Îsmê Qehhar:** Wesfekî Xwedê ye ku li gorî şanê vî navî li neyare xwe 'xezebê û wan qehr û perişan dike

**Îsmê Cemil:**

**Muweffiq:** Bi serketin Navê Xweda yê ku xweşkayiyê di kaînatê de dide nişandan



# Exlaqê Resulullahî Ra عليه السلام

✍ İbrahim Çabakçurî

Peyğamber aleyhi selam zaf kerîm/cumerdi bi. Yi malê xu qey muxtacon înaq kerdên. Eshabê xu teşvîqê tîcaret kerdên û yi ina dehkera ser hina vatên:

“Ê şîma rî tîcaret tawsîye keno; çîmkî des ra new kâr ho ticareti do.” Labêlê yi ticareti di eshabê xu zûr û xapnayîşi ra menkerdên.

Yi zerrê keye û tebere keye di gureyê xu bi deste xu kerdên, kes deste x udi nêçarnên! Mueşna ditên, kincî xu pînekerdên, barê xu bi paştê xu kirîştên...

Tutoni ra zaf heskerdên. Yini di pîya kaykerdên, wextêko raywonî ra agerênî serê heywonê xu di tût nişnên penîyê xu.

Resulullah, yarî kerdên. Yarî ra heskerdên. İna yariyê yi ra mîsalêk a.

“ Yi cînêka extîyari ra va: ‘Extîyar, nêşînî Cennetî!’ Cînêka extîyar ina qal ser berma.. O wext, Resullulah aleyhi salat û selam ayi ra va: ‘Ti şînê Cennet pawa xuertîyê xu!’

Resulullah, çîkêko rindi ra heskerdên. En rind kînc dênê x ura, buya wêş sawitên xu ra.

Yi eshabê xu bi rîyêko peşmirîyaye vera ci omên. Û rayê peşmirîyayîş musnên eshabê xu. İna qalê yi wa: “Rîyê birayê xu rî peşmirîyayîşê tu sedeqa wa.”

\*\*\*

Seba exlaqê Peyğamberê ma ayêt zaf î. Ma enan ra çend hebin nusênî:

“ Bişek, ti yo exlaqo berz sera wê” (Sureyê Qelem: 4)

“Sondi bi, şîma rî peyğamberêk omîyo ku, kowtîyê tengî şîma yi decnêna û qehirnêna. Çîmkî wu bawer-mendoni rî zaf rehîm û şefqîn o.” (Sureyê Towbe: 128)

“ Rasulê mi ma tena ti, ‘alemoni rî qey rahmet şîrawu-ti.” (Sureyê Enbîya: 107)

“ Sondi bi, Resulullah qey şîma û ê hîvî kenî birasê Homey û ruccê axîretî û Homey zaf zîkîr kênî yo mîsalo rind o.” (Sureyê ‘Ehzab: 21)

## Her Tim Zîkr Kên Homerî

✍ Nurettîn Kawarî

Kerg pê haki, bîz pê şiti  
Dar pê peli, gem pê dari  
Behr pê awki, erd pê bezri  
Her tim zîkr kên Homa'ri

Rêy gurên varon varen  
Verg zuren, paskuvî remen  
Keku wanen, melî çeren  
Her tim Zîkr kên Homa'ri

Ser virêni inson mirenu  
Haywon qaleno vaş çerenu  
Felek gerena inson mirenu  
Her tim zîkr kên Homa'ri

Kera teqena vilik bena zergun  
Wor varena horês teqenu  
Laser yenu awk xûşena  
Her tim zîkr kên Homa'ri

Ristim konu erd, dar vejina  
Wesar yenu bezrî teqenu  
Heyvon venu inson'ir benu qeravaş  
Hem tim zîkr ken Homa'ri



# Di Hedîsên Axir Zeman De Cereyana Deccal û ‘Hz. Mehdî 2



📖 Selamîyê Bilêderî

Tevahîyên ‘hemd û sena layiq û babetê Ellah Te’ala ne. Bi qasî hejmara zerratên kâinatê selat û selam li ser Resulê Ekrem û al û es’hab û etba’ên Wî bin.

## Gelî xwendevanên Banga Heq yê heja û bi rûmet!

Me di nivîsa xweya berê de behsa astengên di pêşîya fehmkirina hedîsên di derbarê cereyanên **Hz. Mehdî u Deccal** de kiribû. Înşaallah di vê nivîsa xwe de ji emê liser hikmetê wan hedîsa bisekinin.

Resulê Ekrem (a.s.w), di gelek hedîsên xwe de behsa cereyanên Hz. Mehdî û Deccal kiriye. Di kitêbên hedîsên se’hihê wek **Buxarî, Muslîm, İbn-î Mace, Tirmizî, Ebû dawûd, ‘Hakim, Nesaî, Musned, Muwatta’, Taberani, İbn-î Sunnî, İbn-î ‘Esakîr, Darimî, İbn-î Hibban Bey-heqî, Eş-Şida û hwd.** de di vê derbarê de, bi gelek wecha pir hedîsên se’hih hene.

Cumhûrê’ulemayên ehlê Sunnetê di derbarê heqîqeta Hz. Mehdî û Deccal de muttefiq in. Elbet wê muttefiq bin. Lewra ‘hedîsên di vê derbarê de bi gelek terîqên saxlem hatine neqilkirin. ‘Heta di kitêbên hin se’habîyên ku hedîs dinivîsandin de jî hinek ji van ‘hedîsa derbas dibin. Hem jî imamên Ehlê Beytê û gelek se’habîyên ‘alim bi itifaq ev hedîs dewrî ê pey xwe kirine. Wekî din jî gelek ehadîsên ji vê new’ê wek îxbaratê xeybî çewa Resulê Ekrem ferman kiribe ‘eynî wisa derketîye. Hem tarîxa derbasbûyî hem jî ‘esra me şahidê vê heqîqetê ye.

Di ‘esra se’adetê de meşhûr e kû Resulê Ekrem (a.s.w), carekî di Mescîda Nebewî de sê roja li ser hev ji se’habîya re behsa Hz. Mehdî û Deccal û cereyanê wan û bûyerên axirzeman kiriye. Tarîx, ji vê xutbeya ku sê roja li ser hev

behsa îxbaratê xeybî kiriye pê ve behs nake ku Resulê Ekrem (a.s.w) di derbarê tiştekî din de hewqas dirêj xutbe dabe.

Helbet gelek ‘hikmet û gelek luzûm hebû ku Peyxember (a.s.w), bi îstinada wehyê, bi gelek wecha xebera Hz. Mehdî û Deccal û cereyanên wan bide. Lewra di hedîsên kû behsa dewra Deccal û cereyana wî dikin de xûya ye kû di wî zemanî de bobelat û bêtifaqî û qetlî’amên pir mezin wê bèn serê Ummeta İslamê û gelek musulman wê herin sifra Deccal a manewî. Gelek musulman wê îmana xwe wenda bikin. (Ne’üzubillah)

Ji ber sîrrê îmtîhanê Allah Te’ala wê sûreten qeweta candayîne û qewetekî maddîya pir mezin û cennet û cehennem derewîn bide Deccal. Gelek kesên mu’min jî wê pê bixapin û îmana xwe wenda bikin.

‘Heta di hinek hedîsan de tê behskirin ku wê hin kesên mu’min, ji bo ku kelîmeya heq ji Deccal re bêjin wê herine hizûra wî lê Deccal, bi îstîdracên wek si’hr û îspîrtizma û teknoloji û gotinên avzerî û Cenneta xwe ya derewîn wê wan bixapîne. Di encamê de, ew mu’min di ‘eynî rojê de wê bibin tereftarê Deccal.

Jiber vê xetera mezin e kû Resulê Xweda di tarîxa insanîyetê de di derheqê xetera kû wê piştî hezar û çar sed-hezar û pênsed salî pêkbên de ummeta xwe haydar kiriye.

Di vê derbarê de, muceddîdê ‘esrê Ustad Bedî’uzzaman wiha kerem dike: **“Resulê Ekrem (a.s.w) bi îstinada we’hyê, ji bo ku di her ‘esrî de quwweta me’newî ya ehlê îmanê mu’hafeze bike, hem ji bo ku di hadîseyên**



**bi dehşet de nekevin ye'sê hem jî ji bo ku ehlê îmanê me'nen rebtî Alê Beyta xweya kû silsileyekî nûranî ya 'alema Îslamê ye bike, xebera Mehdî daye."**

Wekî din jî Pêxember (a.s.w) ji hezar û pênsed sal berê bigre heta qiyametê ummeta xwe li hember gelek kesên virekê ku bi navê Mehdî wê rabin şîyar bike û Mehdîyê heqîqî û cereyana wî bi ummetê bide nasîn, ewsafê Hz. Mehdî û cereyana wî bi tefsîlat gotiye.

Hikmet û sebebek jê jî: Cereyana Deccal dê li ser ruyê 'erdê, îfsad û tuğyanekî pir mezin derîne û hem wê di nav însaniyetê de hem jî di nav Ummeta Îslamê de înkara ulûhiyetê bike. Ji bo kû di tarîxa însaniyetê de bi şeklekî

kû nehatiye dîtin eglebê însaniyetê têxe bin bandora xwe wê nîfaqê bela bike. Wê bê'hed însanên mu'min bibe ser fikra kufra mutleq. Ha ji ber vê musîbeta herî mezina kû wê were serê ummetê, Resûlê Ekrem (a.s.w) bi emrê Îlahî, xebera Mehdî û Deccal û cereyanên wan daye. Da ku mu'min bi cereyana Deccal nexapin û wî binasin û cereyana Mehdî nasbikin û xwe pê ve bigrin.

Sebeb û hikmetek jî ev e: **Di zemanê kû Ummeta Îslamê wê here fesadê, bibe firçe bi firçe û bikeve qirika hev û hev qir bike de ji bo ku ehlê îmanê bidin pêy Alê beyta Resûlê Xweda û herin ser riya selametê Resûlê Xweda hewqas behsa Mehdî û cereyana wî kiriye.**

## EM ÎRO MUHTACÊ TE NE EY RESÛLÊ XWEDA!



✍ Mamoste Hezexî

Bi navê Xwedayê dilovan û dilovîn,  
Vaye dîsa hat meha nîsanê, meha xêra, meha bereketê.  
Heta barana vê mehê bi bereketeke cûda ye.

Ev meha ku tê de gîha û dar şîn dibin, ev meha ku tê de rih bi erdê ve tê û bi vê hêzê her der bi kulîlkên cûrbecûr tîn xemilandin. Ajal jî piştî sir û seqema zivistanê, bi xêr û bereketa vê mehê bi xwarin û vexwarinê hêçdibin.

Gelo ummeta pêxember (s.x.l) ma ne hewce ye ku ji vê meha hevqasî bi xêr û bereket îstifade bikin? Ma qey ne pêwîst e kû em pêxemberê xwe nas bikin û li pey herin? Ma qey em nabînin vî halê kû gelê kurd îro têdeye? Hema hema maye ku bi destê Ebû Cehil û Ebû Lehebên zeman di nava kufra tarî de noq bibe. Gelo jiber çî em di vî halî de ne? Ma qey ne ji ber ku em pêxemberê xwe nasnakin û em rêya Wî na şopînin? Ka em çî bikin vêca? Pêwîste ku em ji vir û pêde bi hev re bêjin:

**1- Emê emrê Rebbê xwe yê ewwil ku "îqre" ye bi cî ênîn û pêşî Qur'ana xweşik naskin û pehînekê li van fikr û ramanên qirêj ê ku îro ketine nav me û me bi hev didin kuştin bidin.**

**2-Kirinên kû Xweda û Resûlê Wî ji me re gotine "heram**

**in" em wan heram bikin û kirinên ku ji mere gotine "helal in" jî em wan helal bikin.**

**3- Emê xwe bi teqwayê bixemilênin da ku Rebbê me ji me razî be û em jî ji Rebbê xwe razî bin.**

**4- Em Xweda yê xwe, Îslama xwe û Pêxemberê xwe ji kaniya paqij a zêrîn ku Qur'an a pîroz e û sunneta pêxember e nasbikin. Wê demê emê wan bel'emên ku li ser hesabên şeytên dixebitin naskin û bidine naskirin.**

Gelî bira! Ji dîya me 'Eyşê dipirsin, dibêjin ma ka exlaqê pêxember (s.x.l) çawa bû? Dîya me 'Eyşa dibêje: Exlaqê wî Qur'an bû. Madem ku exlaqê pêxemberê me Qur'an bû, hînkirina jiyana Wî ji kesayetên misilman re dibe ferz. Çawa ku ferz e misilman Qur'anê bixwênin û pê'emel bikin, hînkirina jiyana pêxember jî dibe heman tişt.

Vaye rê jî li ber me ye û rêkok jî li ber me ne. Heke ku em pêxemberê xwe nas bikin û li pey rêya Wî herin, Wellahî emê ezîz û ser bilind bin. Lê em xayîn û bêolan ji xwe re bikin serok û rêber, hê emê li ber gelek bayan bikevin weke ku îro em li ber bayê Emrîqa û Rûs ketine. Bimênin di xêr û xweşiyê de.

**Nepenî:** Gizli, muamma

**Zaboq:** Çöplük

**Kavil:** Enkaz, harabe

# NÎ'META HERÎ MEZIN ÎMAN E

✍ Mustafa TÛRAN



بَلِ اللّٰهُ يَمُنُّ عَلَيْكُمْ اَنْ هَدَاكُمْ لِلْاِيْمَانِ

“...Bil’akis ji bona hûn gihandine îmanê Xwuda minnetê li we dike”  
(Sûretê Hucûrat-17)

Rebbê ‘âlemê Xwuda Te’ala, çi minnetek mezin li me kiriye ku em kirine xwedî îman. Lewra îman, ji nav ni’metên ku Xwuda Te’ala dane me, ni’meta herî mezin e. Îman, ronahîya qelb û çe’va ye... Îman, hizûr û sekna qelba ye... Îman, zewqa mestirê ji her zewqa ye...

Îman, ni’metê fanî bi xwe re baqî dike. Lewra li dinyayê çiqas ni’met hene ew tev fanî ne, fêda wan li dinyayê dimîne; derbasî axretê nabe. Ger îman bi me re tune be, dixwazî mulkê dinyayê bera tev ê me be, ew fêdeyek daîmî nade me. Her çiqas em, xwedî sihhet û selamet bin, em dewlemend û maldar bin; em xwedî quwwet û qudret bin jî, piştî domekê wê ev ni’met tev ji dest me herin. Hetta ewê tev li me bibin barê giran. Wê hesabê wan ji teref Xwuda ve, ji me yek bi yek bête pirsîn...

Kesê mu’min ji ber ku îman bi Xwuda anîye, ew her û daîm dilşad e. Dilê wî rehet e, piştî wî qewîn e. Ew xweş dizane ku kê piştî xwe bi Xudê rast kiriye, piştî wî kesî qet nayê ‘erdê. Ew baş dizane ku sedema hebûna ‘erd û ‘ezmana jibo çi be, sedemê hebûna wî jî jibo wê ye. Çi tiştê di ‘erd û ‘ezmana de hene, çawa ku ew tev ji Xwuda re serî danine û ji wî re ‘ibadet dikin; wî jî serê xwe ji Xwuda re tewandîye û jê re çûye secdê. Bi vî awayî wî jî, xwe xistîye ber aheng û nîzama kainatê. Wî li ber çerxa kainatê serî ne rakirî ye û ‘isyan ne kirîyê.

Xwuda Te’ala, şeref daye însan; ku ew xuluqandîye û ew ji xwe re kirîye muxateb. Heya însan pê çêkirîye ku Xwuda Te’ala rebbê însan e û însan ‘ebdê Xwuda Te’ala ye. Însan bêserî nehiştîye û ew bi serê xwe neberdaye. Jê re Kitab û pêxember şandine û rêya rast dane ber



wî û ew ji rêyên xerab hayîdar kirîye. Sedema hebûna însan jê re beyan kirîye û di Kitaba Mûbîn de gotîye: **“Cinn û însan hew jibona ji min re ‘ibadet bikin min ew çêkirine.”** (Sureyê Zariyat-56)

Xwuda Te’ala, her însan bo müddeteke mu’eyyen şandiye dinyayê. Her însan li dinyayê di îmtîhaneke giran re derbas dibe. ‘Umrê însana ji wan re nehatîye gotin. Hinek însan dirêj, hinek însan kin ‘umir diborînin. Lê belê firset carekê tene tê destê însan. Kesê ku dimre, deftara wî tê girtin û ew kes careke dî nema kare bê ser dinyayê. Jiber vê yekê, kesê mu’min xwe naxe gîfletê. Sedemên hatina xwe ya ser dinyayê, ti carî ji bîra xwe dernaxe. Di rêya Xwuda Te’ala ku daye ber de dimeşe. Ji kirina ‘ibadetên xwe zewqê distîne. Dilê xwe hew bi Xwudê û Hebîbê wî girê dide. Em binêrin bê serhosteyê şîrê Melayê Cezerî vê rastîyê çawa tîne ziman:

...

**Tali’ ko têt û fursat muhlet li nik heram e  
Min ‘umrê Nûhî nîne wer saqiyo bi lez xweş**

**Neyşekkera şîrînced me-j dest te mey divêtin  
Da sîne pê cela dîn rewşen bikîn dilê reş**

...

Însanên xwedî îman, di daîra helal de xwe ji xerabî û çepeliya diparêzin û li ser teb’ê **“ehsenê teqwîm”** dimînin û xwe xelas dikin. Lê belê gelek însanê gafil hene ku guhê xwe ji bang û gotinê Xwuda û Hebîbê wî re girtine. Wan benê xwe dane destê hewa û nefsa xwe. Şeytan ji xwe re kirine rêber û li pey wî, gav bi gav dimeşin. Ew bûne ji **“esfelê safilîn”** a û ew bi ‘eqlê xwe nameşin û li ser ayatê Xwuda Te’ala nafikirin. Soza ku dane Rebbê xwe jiber kirine û sedema hebûna xwe nayînin bîra xwe.

Ew însanê gafil û nezan qîma xwe bi dinya fanî anîne û axret berdane. Nî’metê baqî terikandine û nî’metê fanî ji xwe re bijartine. Mêzêna qelbê van însana şaş bûye û qîmetê tiştê nerast diwezîne. Ruhê wan mirîye û bûne esîrê nefsê û digel Şeytan. Nefs û Şeytan, tiştê xerab bi wan baş; tiştê qenc jî bi wan xerab didin xuyakirin. Di vir de emê dîsa li Mela’yê xwe guhdarî bikin:

**Camid çi kin bi husnê ko wan nezer li xwar e**

**Xer-teb’etên di ebleh çi nêrgiz û çi kerbeş**

**Kore xwe nasipêrit carek bi dest delîlan  
Ebleh çi kit tewafê nabînitin Berê Reş**

**Bêzî dikit ji qencan ji remz û naz û xencan  
Qedrê gulan çi zanit kerbeş divêt kerê reş**

Ew însanê ku bêruh in, çi ji xweşkayî fêm dikin ku nezara wan her li jê re. Ew wekî kera ne. Li cem wan ew kulîlkê nazik û narîn û xweşik ku jê re tê gotin **“nêrgiz”** û ew giyayê bi sitirî, ku jê re tê gotin **“kerbeş”** wek hev in.

Ew însan, qelbê wan hatine mohrkirin û ji dengê ayet û ji dengê murşida re guhê xwe girtine. Ew qîmeta Qur’an û murşidê Qur’anê fêm nakin û nabînin. Çawa ku insanê ebleh û bêfêhm ji kirina tewafê fêm nakin lewra **“Heceru’l-esved”** nabînin.

Ew însan, ji qencê Xwudê, ji delîl û we’z û nesîhetan heznakin. Çawa ku li cem kerê **“gul”** û **“kerbeş”** yek in û ker jibona ku qedrê gula nizane kerbeşê dixwaze, ev însan jî wekî kera ne. Qîmeta tiştê ji wan re bixêr nizanin û tiştê ji wan re nebixêr dixwazin. Xwe nadine rêya rast, rêya Xwuda Te’ala. Xwe didine rêyên çep û xwar, rêyên nefis û şeytana.

Xwuda Te’ala, me neke ji van insanê bêfêhm û nezan! Û me ji nî’meta îmanê ti carî bêpar nehêle. **Amîn.**

Em, vê du’aya me di **‘Mewlûda Pîroz’** de kirîye dîsa dikin û dembîhêrka xwe bi dawî dikin.

**Ey Xudâyê bê-şerîk û bê-mekân  
Tu me bê îmân nehêli tu zemân**

**Dûr nekî me tâ hebîn ku em bijîn  
Yek demê yâ Reb ji dînê xwey mubîn**

**Me bikî yâ Reb ji ehlê pir wefâ  
Tâbî’ê rêkâ Muhammed Mustefâ**

**Şaş nekî me-j vê rêyê tâ âxretê  
Tâ herin em nêv cinân û cennetê**



# BIRANO

✍ Ezîz Mezraqenterî

Dizek bûne ezbenî  
Tazî bûne medenî  
Ev çi fen û çi benî  
Heylo li min birano

J'libek mahsere çêkir  
Tî yû birçî te-b rêkir  
Ka binêre kê çikir  
Ma qey ne bes birano?

Herdem ez hêvidar im  
Li hêviya bihar im  
Ji vî warî qe narim  
Heta paşî birano

Hewar l-kurdê misluman  
Xerabûye warê wan  
B-şewte mala zaliman  
Heywax li min birano

Cil û libsê Ewrûpa  
Bû gaye perew çûpa  
Zêr dizîne bi kûpa  
Heylo li min birano

Kê çi got tu xapiya  
Tu ketî-j qam û piya  
Diqîrin bav û diya  
Deng nayê we birano?

Wê bilindbe qîra min  
Dermanbe birîna min  
Wê were mizgîna min  
Li bende me birano

Feqîra teva barkir  
Bi xûrbetê de karkir  
Zalima tarûmar kir  
Heywax li min birano

Feqîra ji birçîna  
Reng dane bi qirçîna  
Bêedeb derewçîna  
Ling radane birano

Vê 'illeta bi sala,  
Kuştîye xort û kala,  
Li dû xeyalên vala,  
Bes bimeşin birano

Roja ku wê ew yar bê,  
Ev can xelata wê bê,  
Kî çi-d bê bila bibê,  
Ezê bêjim birano

Bombew lexem û kortal  
Millet kirye dîl û lal  
Kes nabêje ev çi hal  
Heywax li min birano.

Gurê qol derket holê  
Ziman direj kir olê  
Pencika binê solê  
Ka çi bêjim birano

Çi kirin li me şaşan  
Berê me dane kaşan  
Em xapandin nebaşan  
Hewqas salan birano

Ez bilbilim ew gulî,  
Ewe şewata dilî,  
Sermin bibare xwelî  
Ger wê berdim birano

Agir dane camiya  
Erd û ezman hejiya  
Bêkes ketin bin piya  
Dikin hewar birano

Van seroka çi kirin  
War welat xerakirin  
Fedîw heya rakirin  
Ma we nedî birano?

Dixwestin me fedakin  
Bi kemîna hundakin  
Ji nav gela cûdakin  
Tu şahidî birano

Ew yara min Îslam e  
Aşîtî yû selam e  
Rebbê 'alem ew da me  
Li sersera birano

Bajar bûne xerabe  
Wê ev hal çawa çêbe?  
Ya Rebb tu alîkar be  
Dikim hewar birano

Hovên li daristana  
Bûn bilbilê meydana  
Çepik lêdan nezana  
Heta kengî birano?

Hezar felsefê derew  
Bi çîroka anîn xew  
Ji desta firiya kew  
Hêjî diçe birano

Ne hozan û dengbêj im  
Çend rastiya dibêjim  
Ezê herdemî bêjim  
Ji gelê xwer birano

Ew zana tu nezani  
Te firotî b'erzanî  
Qey tu bi xwe nizanî?  
Nafikirî birano?

Bûn seyran û temaşe  
Di destê geld û fehşe  
Li ser me bûne paşe  
Hey wax li min birano

Silopîw Cizîr û Sûr  
Cihê nêzik bûne dûr  
Birîna xelkê min kûr  
Heywax li min birano

'Ezîz tu bes dirêjke  
De hew guhdaran gêjke  
Pêşî ka tu xwe rastke  
Min rast bikin birano





# NIMÛNA WEZÎFEDARIYÊ

✍️ Ehmed Zejtûnî

Mela Fenarî (1350-1431) şêxulîslamê yekemîn ê Osmanîyan bû, berî bibe şêxulîslam li bajarê Bûrsayê ye. Di dema qazîtiya wî de mirovekî ji bazarê hepsek ji xwe re kirîye. Piştî kirîna hespê bi çendakê jê haydibe ku hesp nexweş e. Ji ber wê dixwaze hespê lixwedî vegeşîne, lê belê mirovê firoşkar cira xwe nexweş dike, nexweşiya hespê qebûl nake. Ew mirov jî dixwaze bi fermî wê pirsgirêka xwe çareser bike, ji ber wê dikeve rê diçeba qazî. Çi fêde wexta digihê dadgehê, qazî Mela Fenarî li cîyê wî nabîne. Mirov ji mecburiyetê ve pirsgirekê dihêle roja din. Belê wê şevê hesp dimire. Ad rojê mirovê hesp kirîbû û hesp li cem dimre ve meselê ji qazî Mela Fenarî re dibêje û dibê “ka ev pirsgirêk wê çawa çareser bibe, xisara mi wê kî bide?”

Qazî Mela Fenarî jî dibê “xisara te ezê bidim” Zilamê ‘ecêbmayî dibê “xisara min çima hûnê bidin, tu ‘eleqa we pê tune, tu sucê we tune.” Qazî Mela Fenarî jî dibê “Belê wilo xuyaye, lê di heqîqetê de sucê min girane. Eger wexta do tu hatî dadgehê ez li wirbama, minê pirsgirêk çareser bikira, hesp li xwedî vegeranda, wê wî jî perê te bida te. Hesp jî wê li cem xwedî xwe bimra. Me’lesef ev îmkan nemaye. Yanê ji ber ez ne li cîyê xwe bûm te ev xisar kir, ezê jî ji ber ve yekê xisara te bidim” û dide.

Wexta mirov li ser ve çîrokê difikire, mirov kare gelek ders û şîreta ji xwe re jê wergire. Di serê her tiştî de kesê bawermend ehlê wezîfê ye. Wezîfa wî doz û de’wa Xwedê ye. Xweda ew, ji bo armançê xuluqandîye. Ew ji xwe re kirîye xelîfê li ser zemînê. (Beqere-30) Yanê wezîfa însên, xelîfetiya Rebbê ‘alemê ye. Li gor ve wezîfê divê

ala “laîlaheîllallah” bilindbike. Dîsa Rebbê ‘alemê, di aye-teke xweya pîroz de dibêje “min cin û insan xuluqandî-ne, encex ji bo ji min re ‘ebdîtiyê bikin.” (Zariyat-56) Ji vê fermana pîroz jî tê fêhmê ku insan wezîfedarek e. Ji xwe ev ayeta pîroz dide zanîn ku insan ne vikîvala ye, ji bo armançê hatîye xuluqandin. (Qiyame-36) Ew ayetên pîroz yek yek dubare dikin ku insan wezîfedarê ‘ebdîti û xelîfetiya Rebbê Re’hman e. Berî her tiştî em ‘ebdê Xweda ne, ev jîyan, çîya, dar, ber û av, bira, dê û bav ji bo ve meqsedê hatine xuluqandin.

Piştî vana teva, tiştê ji me re muhîm ew e ku divê em wezîfedariya xwe bihessasîyeta Mela Fenarî binin cî û li wezîfeya xwe miqate bin. Li ala “laîlaheîllallah” xwedî derkevin û bidin zanîn, bidin qîrîn, bidin fêmkirin ku doz û e’hkamê Xweda li ser zemînê keştiya PêxemberNûh (‘e.s) e û gopalê Pêxember Mûsa(‘e.s) ye. Kesê li dinya û axretê şahî û edaletê, azadî û necatê bixwaze, bila li doz û e’hkamê Xweda xwedî derê.

Belê çawa ku keştiya Pêxember Nûh, kesên bawermend ji tofanê xelaskirin, divê dema tarî de keştiya Mûammed -selat û selamên Xweda li ser bin- Qur’an û sunnetê jî bawermendên ve demê ji tofana cehalet û zilletê xelas dike. Belê çawa ku gopalê Pêxember Mûsa, zarokên Îsraîliyan jizulma fir’ewn xelas kirin, îro jî keştiya doza Qur’an û Îslamê wê bawermendan ji fisq û ficura ve ‘esra dawî xelas bike. Bes em bi Xweda re, bi pêxemberê Xweda re û bi doza Xweda re rast bin, rêya armanca xuluqandina insan wê heta mirinê bi rastîyeke mezin bidome.

**Dadgeh:** Mahkeme

**Keştî:** Gemî

**Bawermend:** Mümin, inanan



# اِقْرَأْ بِاسْمِ رَبِّكَ الَّذِي خَلَقَ

## Sûreyê ‘Eleq “Ser Yo Vateyo Kilm”

✍️ YUSUF ARİFOĞLU

Îna sure, Mekke di omîya wuar, 19 âyet a. Nomeyê ina sure ra vonî sureyê Îqra zî. Îna sure, îna meseloni ra behs kena:

**1- Omayîşê wehyo sifteyin Hz. Muhammed ‘aley-hîselami rî.**

**2- Bi sebebê malî, pêldayîş/îsyonê û emrê Homey rî sarevedartişê înonî.**

**3- Qissayê bêbext Ebu Cehîl û Peyğamberê ma nimaci ra menkerdişê yi.**

‘Eleq, yena me’nayê ‘gûna cemednaye’. Dusyaya rehm û alıqyaya inay ra nomeyê ‘eleq dîyo ci.

‘Lenesfe’eb-bînnasîyetî/Ma çare yi ra kaşkenî’ bi pît û zixmî kaşkerdiş o. Nasîye, puero hetê çare yo.

Zebaniye, çekuyêka me’nayê tohndayîşi da. Ê kesêke tohn donî. Îta di zebanî ra meqsed ê meleketê ku sêrt û birehm ê. ‘Ereb, kesêko, pît bidepişo in nome nonî pawa...<sup>1</sup>.

Bismillâhirrahmânirrahîm

**1- Bi nomeyê Rabbeko viraştog/Xaliq o, biwun!**

**2- Yi, înon yo guna cemednayî(‘eleq) ra viraşt.**

Xîtabê ‘Îqra’, hetê Homey ra peyğamberî û wahîy ser xitabo sifteyin o.

Wextêko Hz. Muhammed (s.a.s), bi çoras seri, Homê waştî ku, hîn emrê xu, qasidê xu Muhammed aleyhîselami rî bişirawo. Seba inay ra in wehyo sifteyini ra ver peyğamberê ma bi hownon sadiq û bi heskerdişê înzîwa in gure ri hedre bîyo.

Peyğamberê ma îna serroni di her serr şîyen koyê Nur, miğarayê Hîra û kowtên îtiqaf. Eg feqir biomên ceyê yi wuer dêne yin. Ê hownê ku yi diyên zey ruca ve-cên wuerte. Peyxamberê ma, halê înonon ser decên, zerrê yi yini rî veşên, qey şîyayîşê yin yo çare waştên;

çimkî înonon Homê xu wuar verda bi û sanemonî rî ‘ebdî kerdên, zulum bi bi zêd, tutî kenayin gonî gonî eşten her, faîz wuerdên.

Muhammed aleyhîselam zaf fikirnên; labelê yo hal û çare nêdên. Ay ra waştên tena bimon, bioncy uzlet û înononi ra dûr bimon.

Hîn a ruca Homey peyğamberî dêne ci, rehma îlahî înononi rî bîyene xelat omî bî.

Aşmê Remez, şewê Qadîrî bî. Gawa ku Peyğamberê ma xu ra şî bi, kowti bir a meleketê wahîy Cebrail omî û wu şat î, şedina. Peyğamberê m ara va:

-Biwun! Peyğamberê va:

- Ez wendiş nêzono. Inay ser Cebrail, rina Peyğamberê ma şedina û heta nefesê yi biriya. Peyğamberê va bêla ez mirena. Dima Cebrail wu verada û va:

- Biwun! Peyğamberê ma rina va:

- Ez weniş nêzono. Cebrail, rina Peyğamberê ma şedina û heta nefesê yi biriya. Peyğamberê va bêla ez mirena. Dima, seba xelasîyê şedinayîşê Cebrail va:

- Ez çita biwunî. Cebrailî zî va:

- Îqra bismî Rabbike...( 5 ayetê sare ina sure de wendi.) Peyğamberê ma zî îna ayet wendi. Wextêku Cebrail yi ra cîya bi şî, ti vatên ê ayet qelbê Peyğamberê ma di nusîye bî.

Îna xîtabî di qey wendiş, nuştîş û musayîşê ‘ilm yo de’wet bi bî. Çimkî, ‘ilm sembol û nişonê dinê Îslom a. Yanî yena vatiş; Ya peyğamber! Biwun, bimus! Labelê wa wendişê tu, inê ummetê tu bi nomeyê Homey bi. O Homa ku, mexluqat viraşt, heme ‘âlem ardî wuerte, bi emre yi û yi ra bi ardim waştîşî biwun!

Dima Homa, çimeyê viraştîşê înon ano verê çimon. Nişon dîyena ku, înon senî virazîyo, çita ra xelq bîyo ku wa duştê ina qijî û zellîyê xu pîlî û ‘ezametê Rabbê xu bizono. O Rabbê ku, înon ‘Eleq( gûna cemednaye) ra



virašto demê hemlê cînî ra yo dem a. İna dem, hemli di ê ruc ewwîlîn ê. Dima, gûna cemednaye bena gueşt û hîn gom bi gom însôn rehmê daye xu di şekl geno.

**3- Biwun û Rabbê tu zaf cumerd(ikrom kerdog) o.**

**4- O (Rabbê) ku, bi qalem da musnayış.**

**5- A ku însôn nêzono a musna ci.**

Weherê her çî Homa yo. Kesêki zî nî'met dayişi di, cumerdî di, ikrom kerdişi di Yi rî hember nêbeno û hemberî di nêşkeno biraso versîyê Yi. Rina, ê çîyê ku 'ebdî Yi nêzonî û wu îna çîyon musnêno yin. İna zî muecnêna ku kerem û cumerdîyê Homê rî peni çînî ya.

Wu, bi qalem nuştiş û çizkerdiş musneno. O 'ilm û ê ma'lumatî însôn nêzono musneno ci. Çendek Homa zey qalem bi wasita çik musneno însôn rina wu eşkeno bi wasita zî bimusno. Yo însôn wendiş û nuştiş nêzoni zî Homa biwazo 'ilm, hikmet musneno ci. Senî ğarê Hîra di biwasita 'ilm û hikmet musna Peyğamberê ma aleyhîs- salat û wesselamî.

Qurtubî hina vono:

**"Homa, (bi îna ayeton) diqet onti fayda û qiymetê musayışê nuştişî. Çimki ayi di, endek faydê pîl estî ku însôn ( xu xu) nêşkeno fohm bikero. Bi nuştiş 'ilm tedwîn bî, hikmêt qeyd bî, xeberê verînon û qalî yin depişîyê û kitabêk hetê Homey ra şîrawuyê nusîyê. Eg nuşte, çine bî nê gureyê dunya nê zî ine axiret raşt nêbiyen."**

Îna ponç âyêt, ayetê Qur'onî sifte ome wuarî. İbn-î Kesîr vono:

**" Ê ayetî Qur'oni ra sifte omê wuar îna ayêt bimbarik ê. İna rahmet û nî'metê Homê tewr verîni yi 'ebdonê xu rî ihson kerdi.**

**İta di diqqet oncîyêna keremê Home rî, yi însôn 'eleq ra viraşti û dima musnayışê 'ilmî ku însôn nêzonên. Homayo Berz, bi 'ilm şeref do însôn û wu kerdo ercayin. 'İlm hina yo zixm û rumet a, Hz. Âdem bi enan melektoni ra biyo berz."**

**6- Nê, bişek însôn helbet heddi ra vecîyêno.**

**7- (Wextêko) yi xu dewlemend(nê rasîyeno ci) bivîno.**

**8- Bişek agerayış (huzurê) Rabbê tu ya.**

Raşt ina ya însôn, muhaqqeq nefse xu dima şino, heddi ra vecîyeno û beno har. Vera Homey xu di pîrnîk keno derg û bi kîbr xu pîl vînêno. Çimki, wu biyo weherê mal û serwetî xu dewlemend vînenê û rî geno.

Mufessîr vonî:

**"İna ayeti ra heta penîyê sure derheqqê Ebucehil a. İna ayêt, ponç ayêt verînoni ra dima zaf yo wext vîyerto omê wuar. Ebu Cehil, bi 'eql, meqam û malê xu heddi ra vecîyên, Homey rî sare dênivera û Bisilmononi rî heqerat û işkence kerdên, Peyxamberê ma rî duşmenî kerdên. İna ayêt semede kerde yi ra nazil bî; çendek ina ayêt hetê sebebê omîyayışê xu xususî ya labelê lafz û me'na ser umumî ya."**

Eya İnsôn! Bizon, îna 'erd û 'ezmon, ina aşm û tîj, in nî'met û mexluqat hemê ine Home yê. Wu Malîk ti memluk ê, wu Xaliq ti mexluq ê, wu Rabb û ti 'ebd ê. Nîşonê meqamê yi pîltî, berzî, 'ezamet û bîkemîtî ya; ine tu 'ebdî, 'ecizî, bîçareyî û kemîtî ya. 'Eceb ti nêşermayênê, ti ceyê xu û heddê xu nêzonê ti hina qurretî kene!

Bizon, bişek rasayış û agerayış Rabbê tu rî yo. 'Amel û karonê tu ser wu tu ra hesab persêno. Xelatê holî û cezayê xirabî ha destê Yi da. İna ayet, ê însônêk heddê xu ra vecîyênî, nî'meti rî bîşikir î qey penîyê yin yo îqaz a.

**9, 10- Ti nêdî o (har bîyaye) ku 'ebdêk çi wext nimac kerd (yi nimaci ra) men keno?**

Guerê rîwayêt, ruccêk Ebu Cehîlo le'îna ombazonê xu ra va: " Muhammed miyonê şima di rîyê xu nêşawên 'erd? Verê çimonê şima di nimac nêkên nêşino secde?" Ombazê yi vonî: "Erê!" İna dima Ebu Cehîl vono: " Ez Lât û 'Uzza rî sond wunêna, eg ez yî bivîn wu hina nimac keno, muheqqaq ez nişeno milê yi ser û rîyê yi sawêno 'erd!" Ruccêk omî û dî Resulullah ho nimac kênê. Ū omî duştê yi bigero milê yi ser. Ombazonê yin çi bivînên! Ebu Cehîl tavîl gera a û bi destonê xu, xu pawitên. Yi ra persa: "Se bi tu?" Yi va ku: "Benatê mi û yi di adiri ra yo çal, mexluqatêk û pelî însôn ci ra tersêno peyda bî." Peyğamberê ma(s.a.s) qey ina mesele va: " Eg wu duşê mi ra biomên, melekton wu depiştên û kerdên lete lete."

İna mesele dima Homey ayetî 'Ti nêdî o (har bîyaye) ku 'ebdêk çi wext nimac kerd (yi nimaci ra) men keno?' şîrawutî.

Mufessîr vonî, 'ebdêko nimac kêno' Muhammed aleyhîsselam û 'kesêko yi nimaci ra men keno' Ebu Cehîl o. Çimkî Ebu Cehîl vati bi:

"Eg ez bivîn Muhammed nimac keno, muhaqqeq mile yi cawêno!"

În wurd ayêt qey ê kâfir û zalimon ê ku, yi a rueci ra heta êr, êri ra heta qiyamet nimaci rî duşmenî kênî, nimaci ra men kênî. Çira kâfir û zalim endek nimaci ra tersênî, nimacyeroni rî duşmenî kênî? Çimkî nimac, nişonê bawerî yo; benatê heq û batili dî yo sînor o. Nimac, xirabî û nêbaşî ra men kêno. Helbet, kâfir bawerî, heq, rindî û holî nêwazênî.

Aha ina ayeti zî muecnêna ra, kafirêko nimaci rî duşmeni bo û nimaci ra men bikero halê yi çi gîrîb o. O suçdar kâfir, halê çi yaman, 'eqlê çi tay û gureyê yi çi xirab o!

### **11, 12- Ti dî? Eg (o 'ebd) ho reya raşt ser ra yan bi teqwa emirkeno (ti vono se)?**

Eya Ebu Cehîl yan ê ku kufre Ebu Cehîl xu rî mîras gurewt o! Ê kesek şima seba Bisilmoniyê û baweriyê yin yini rî duşmentî kenî û yin nimac û 'ibadeti ra men kênî eg o 'ebdêko nimac keno, qal û kare xu di raşt o û raşt ine yi wa. Şima inay ra vonî se? Şima rina, hedd ra vecîyênî û har benî zulm û heqeretê xu dewom kênî? Yan zî o 'ebd(Muhammed aleyhîsselam) veneno reya heq û hîdayet, rina bi îxlas û yoyitîyê Homey emr keno? Hîn ti senî yi/yin men kênê û verê yini di vinênê! Eya ehmeq! Ti çendek hînt ê, yo merdimo hinayin nimaci ra men kênê, nimacê yi rî herb kênê a. Wu 'ebdê Allêh, mu'tî, reya raşt dîya, Homê rî mil kerdo çowt û venêno hîdayet û reya raşt. In, çendek halêko 'ecaîb o. Îta ra pê Homayo Berz, xîtabê xu çarnêno Hz. Muhammed aleyhîsselam û hina fermon kerd:

### **13, 14- Ti dî( vono se)? Eg wu zur bierzo, verê xu biçarno, qey yi nêzono bişêk Homa vînen!**

Zey Ebu Cehîl û Umeyye b. Xelef -ku yi Selmano Farîs nimaci ra men kerdi bi- kâfir, eg nubuwwetê peyğamber înkâr bikerê, baweriyê Homey ra rî biçarnên, reye şeyton, nefis û xirabî bidepişên hol kênî? Yî, cezayê in hereketonê xu nêbaşî nêfikirên?

Ê bêbext nêzonî, Allah yî seken senêkên hemin zono, hal û şîyayîş yini ra xeberdar o. Kerdenê yin vînen o û

yin çi kerdi se heqqê yin dono.

**15- (Ey Muhammed) Nê! Eg (in halê xu ra) nêvîyero helbet ma çareyê yi ra depişên,**

**16- (A) çareyê(puerê) yi zurker û xetakar ra.**

**17- Înahal wa vendo paştgeronê xu.**

**18- Ma zî venênî zebanîyon.**

**19- Nê! Yi rî îteat (Gueş pawa) mek! Allahi rî secde beri û (Rabbê xu ra) nîzdi bi!**

O Ebu Cehîlo gunakar û ê ku reyê çepi ra çînî, gueş donî şeytonî wa in hinayin heddi ra vetîşî û çowtî xu ra bivîyerê! Eg yi, zulm, heqeret û gunakarî xu ra nêvîyerê; Peyğamber û bawermendonî rî eziyet bikerê; kufir û çowtî xu ra fek veranêdên ina yi rî nêmonêna. Wa ina dunya di keyf nêkerê, wa nêvacên in şîyayîş ma rî monêno, yo zî ma ra hesab nêperson! Ma bişek çareye, puerê yi ra depişnên û bi şedinayî yi qaş kênî ceherme û erzênî uca.

Weherê ina çare zaf zurker û gunakar o, sucê yî zaf î. Îbn-i Cuzey hina vono.

"Zurkerî û gunakarîyê çare û puerî yo me'naya mecazî ya. Raştî ra zurker û gunakar weherê puêr/çare yo."

Wextêko Homey Ebu Cehîl û ê kuz ey yi reyê kufirî ra şînî, Bisilmononî rî duşmenî kênî, nimaci ra men kênî ma qaşkerd û eşt cehermi eşkeno wa biveno hetkaronê xu ma zî venênî pawitoğonî ceherme yanî ê zebanîyo ku yi wuşk, zixm û bîrehm ê.

Guerê rîwayet, Hz. Peyğamber meqamê İbrahîmî di nimac kerden. Ebu Cehîl omî û hina va:

-Ey Muhammed! Mi tu ra nêva nimac meker? Peyğamberê ma wext in vate şinawut yi ra hers bi û wu tehdit kerd. Ebu Cehîlî zî va:

Ey Muhammed! Ti mi pê çita tehdit kênê. Wallahî ita di tewr zaf hetkarî mi est î. İna mesele ra dima Homey in ayêt şirawutî.

Îbn 'Ebbas vono: "Eg Ebu Cehîl bivendên paştgeronê xu, meleketon 'ezabî a helî di tavîl wu depiştên."

Homa vono: "Nê, ey Muhammêd! Gueş medi Ebu Cehîl û zey yi kafiron! Ti û bawermendî şima ça bênî bibên secdeyê xu wuar meverdên, nimacê xu tima tim bikerên û bi inon nîzde Rabbê xu bi!"

Hedisi di hina omîya vatîş:

"Yo 'ebdêk Rabbê xu ra tewr zaf halê secde di beno nîzdi!"



# ٧٤٧

## Şêx 'Elîyê 'Herîrî

Dilê mehzûn kefaret bêt ke êm şeb taze mihman têt  
Be mizgînî beşaret bit ke mihman canê canan têt

Ke mihman canê canan e le ser cavê me mihman e  
Be mala cumleê xane ke şahê cumleê xan têt

Were ey şahidê şêrîn ji eşqa te dil êxsîrin  
Be can menzilgehê mîrin telebkarî ke sultan têt

Telebkarin dil araim medîm yarin bû yî şaîm  
Le bejna 'er'erin daîm sîyeh mar lê be colan têt

Sîyeh maran kire seyran le cotê şubhetê cîran  
Ku xas û 'am bibûn heyran le cîran 'enber efsan têt

Du zulfên 'enber efsan in du le'lên şekeristanin  
'Eqîq û durr û mercan in le hewzan abê heywan têt

'Ecêb bir ke mirarî têt le sedde qewsê tarî têt  
Sîyeh pencên xumarî têt ji mexmûran du eslan têt

Ji mexmûran tu mexmûrî be cî hişt 'eqreba jûrî  
Tewafa beytê me'murî le burcan xûn be sîran têt

'Eqarib hat û bê hed hat le wê burca zeberced hat  
Vebala qewsê eswed hat le tilbey mahî taban têt

Le heyva kewçêrîn kamil ve ehlan ra nehiştin dil  
Û cumle da sefên sunbul le hinda vê gulîstan têt

Gulîstana Xuda riste le çar etraf dilan xuste  
Binefş û nêrgiza mest e cinisrê le'l û reyhan têt

Reyahîn sosin û werdin le Şêx Elîyê xerîb ferd in  
Weristê ehmer û zerdin herû sed car bi efxan têt

Ji efxanan nemayim têt du'a goyê te ez bê vir  
Bebête şer du esleh dîr 'heta vî qasidî can têt

Bebîne rû şemalîne were hindavî balîne  
Ji dest ahan û nalîne çe reng feryad ji esman têt

Be feryad û be hewar e ji dest ahan min ew kare  
Me lazim bendeê jar e ji seyyidî çe ferman têt

Seyyidî heq nezer vêra di îqlîman ilim gêra  
Qitara gewheran vêra ji nêv kana bedexşan têt



# ŞÊX 'ELIYÊ HERÎRÎ -2

✍ Ehméd Zeytûnî



**MEXLESÊN WÎ:** Weke ku em dizanin di edebiyata kurdî ya klasîk de her helbestvanekî mexlesekan jî gelek mexles di berhemên xwe de bi kar anîne. Mînak çawa ku Melayê Cizîrî mexlesên "Melayî" û "Nîşanî" bi kar anîne, Feqiyê Teyran jî "Feqî", "Miksî" û "Mîm" û "Hê" wek mexles bi kar anîne. Her wiha Şêx Eliyê Herîrî jî di helbestên xwe yêni niha di destê me de, sê mexles bi kar anîne. Di her helbestek xwe de mexlesekan bi kar anîye. Mexlesên wî; 'Elî, 'Eliyo û Şêx 'Elî ne.

**PERWERDEHIYA WÎ:** Şêx 'Eliyê Herîrî û malbata wî

li herêma xwe de bihêz û navdar bûn. Bavê wî hem şêx bû hem jî muderrîsê medreseyê bû. Ji ber vê yekê perwerdeya xwe ya pêşîn li cem bavê xwe digre û piştî bavê wî wefat dîke, di bin 'hîmaya apê xwe de mezin dibe û di heman demê de ji apê xwe se'netê hîn dibe. Wek tê zanîn ku gelek kurdên navdar jî ji bo 'ilim tehsîl bikin, di wê serdemê de berê xwe didan Şam û Beğdayê. Şêx 'Eliyê Herîrî jî di temeneke biçûk de ji bona tehsîla 'ilim diçe Şamê. Ji malbata Şêx Eliyê Herîrî gelek şêxên terîqatê gihîştine.



**BERHEMÊN WÎ:** Şêx 'Eliyê Herîrî li gorî lêkolîner û nivîskarên, piştî pejiwandina Îslamê helbestvanê yekem e ku helbestên xwe bi zaravayê kurmancî nivîsandine. Em karin bêjin ku edebiyata Kurmancî ya klasîk digel Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran ji aliyê Şêx Eliyê Herîrî ve hatiye avêtin. Ango di bingeha edebiyata klasîk de stûneke giranbiha ye. Şêx 'Eliyê Herîrî mitesewifikî pêşeng e. Çi qas berî Şêx Eliyê Herîrî helbestvanên kurd hebin jî berhemên wan negihaştine roja me. Lê helbestên Şêx Eliyê Herîrî gîhaştine roja me û niha 6 helbestên wî li ber destê me hene. Di helbestên xwe de gelemperî li ser eşqa xwedayê Teala radiweste. Wek mutesewifên din li ser heman mijarên din jî radiweste. Mijarên wekî lihevhatin, rastî û dirustbûn jî mijarên wî yên taybet in.

Li gorî helbestvanên kurd ên navdar Ehmedê Xanî û Siyahpoş, dîwaneke Şêx Eliyê Herîrî heye, lê belê ev dîwan negiştîye roja me û li ber destê me tune. Lê belê em karin bêjin ku 6 helbestên wî mîna dîwançeyekê li ber destê me ye. Navê Şêx 'Eliyê Herîrî cara peşîn di berhema Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî de em lê rast tên. Ev zanîn jî tê wê wateyê ku Şêx 'Eliyê Herîrî beriya Ehmedê Xanî jiyaye. Ji nav helbestên Şêx 'Eliyê Herîrî helbesta wî ya bi navê "Têt" di nav gel de navdar e. Hinek bendên wê ev in:

**Dilê mehzûn kefarek bit ke em şeb taze mihman têt**

Ji ber kirinên xwe yê gunehkar gêmgin e û dema dibe şev destê xwe li hember rebbê xwe vedike û ew mêvanê ku rebbî wî ye jê naçeyîde û wî dibexşîne. Ji ber vê yekê her dem hêvîdar e û qet gêmgin nabe. Deriyê dî'aye her dem vekirîye. Kî li gorî rê û rêgezên pergala îlahî bijî û bi dî'ayek nesûh li ber Rebbê xwe bigere, wê bêguman Xwedayê Teala dî'aya wan qebûl bike. Di pejiwandina diayê de şev hîn hêja û meqbûltir e. Xwedayê Teala ji her kesî re nabe mêvan, tenê yên deriyê dilê xwe jê re veke jê re dibe mêvan.

**Be mizgînî beşaret bit ke mihman canê canan têt**

Ew dizane ku ji sedî sed Xwedayê Teala ji bo diaya

wî li cem wî bûye mêvan. Ji ber vê yekê dilê wî aram e. Dia di navbera mirovan û Xwedayê Teala de têkilîyekê pêk tîne. Di vê têkilîyê de Xwedayê Teala wekî bûye mêvan û ji bawermendan tenê diayeke nasûh dixwaze. Wexta ku bi saya diayê bi Xweda re dikeve têkilîyekê, xwe dilgeş û aram hîs dike. Lê belê hakimê hakimên Xwedayê Teala hatiye bûye mêvanê wî.

**Ke mihman canê canan e, le ser cavê me mihman e**

Ev mêvanê ku tê, ne mêvanekî jî rêzê ye. Ew mêvanê ku hatiye cem wî jixwe aşîqê wî ye. Ango jê re maşûq e. Çawa ku dema aşîq nêzikî maşûqê xwe dibe, asta kêfxweşî, aramî û dilgeşiyê ya herî bilind peyda dibe, mirovên bawermend jî bi rebbê xwe re di diayê de dikeve nav helwesteke wiha.

**Be mala cumleê xan e ke şahê cumleê xan têt**

Xwedayê Teala xwediyê milkên bêjimar e ku daye mirovan. Şahê milka ye ku çawa bixwaze wiha diserifîne. Çi li ezmanan û çî jî li ser rûyê erdê tiştên heyî bi tevayî yên Xwedayê Teala ne. Bixwaze bide kê, ewê bidê û nexwaze jî nade. Ji bo ku em ji van nîmetên Xwedayê Teala bêpar nemînin, divê em her gav li ber rebbê xwe şukurdar bin.

**Were ey şahidê şerîn ji eşqa te dil êxsîr in**

Dilê min ji eşqa te re hêsîr ketiye. Vê hezkirina ku di dilê min da ye, tu şahidê wê ye. Ev dilê min ne ji tu tiştêkî, tenê ji evîna te re hêsîr e. Bi vê hêsîrbûna bi rebbê xwe re ez kêfxweş û azad im. Ji ber vê yekê ji xeynî rebbê xwe ji tu kesî re ne hêsîr im.

**Be can menzilgehê mîr in telebkarî ke sultan têt**

Ji Xwedayê Teala re dia bike û daxwazên xwe bîne zîman. Bêguman wê Xwedayê Teala dengê te bibihîze. Kî ku li gorî pergala îlahî tevbigere û ji rebbê xwe re dia bike, wê diaya wî bê pejiwandin. Dîsa Xwedayê Teala dibêje ku bê guman ez gelekî nêzikî we me. Yen ku destê xwe ji diayê re veke, ez ê diaya wî qebûl bikim. Îroj bi rastî di destên misilmanên mu'stezef de çek û mertala herî xurt dia ye. Ev rêgeza îlahî ewê her dem heta qiyametê bidome.

<b>Ango:</b> Yani	<b>Perjirandin:</b> Benimsemek	<b>Hêman:</b> Öge, unsur	<b>Nijadperest:</b> Irkçî	<b>Rawestandî:</b> Durdurmak
<b>Aram:</b> Sakin	<b>Gelemperî:</b> Genel	<b>Komar:</b> Cumhuriyet	<b>Ol:</b> Din	<b>Rêgez:</b> İlke
<b>Ast:</b> Düzey	<b>Gengeşî:</b> Tartışma	<b>Mafdar:</b> Haklı	<b>Pênas:</b> Tanım	<b>Rojhilatnas:</b> Doğubilimci
<b>Bîrdozî:</b> İdeoloji	<b>Helwest:</b> Tavr	<b>Mêtingeh:</b> Sömürge	<b>Pergal:</b> Düzen	<b>Teqez:</b> Mutlak
<b>Dagirkirin:</b> İşgal	<b>Heman:</b> Aynı	<b>Mînak:</b> Misal	<b>Peyker:</b> Heykel	<b>Tomarkirin:</b> Kaydetmek
<b>Dijber:</b> Karşit	<b>Serdem:</b> Çağ	<b>Mixabin:</b> Maalesef	<b>Pispor:</b> Uzman	<b>Zanyarî:</b> Bilginlik



## ✍️ Xelî MISQEQYNTERÎ

Bi navê Xwedayê dilovan û dilovîn. Temamê hemd û pesna, sipasî û wesfên bi qencî ji ezel heta ebed her ji Xwedê re bin, ewê ku em ji tarîtiya tunebûnê anîn ronahiya wicûdê, ewê ku em ji tarîtiya kufr û delalet û cehaletê derxistin, em gihandin nûra îman, hîdayet û 'ilmê wehyê û ewê ku em ji tarîtiya zivistan û şeva reş xelas kirin, em gihandin şeveq û sahîla selameta buhara rengîn. Êdî li dinya û axretê her demê pesn û hemd her ji wî re bin.

Selat û silavê Xwedê li ser nûra çava, tebîbê dila, diloka ser zimana, mehbûbê şêrîn, fexra kaînatê, mizgîndanê cinn û însana, li mezinê me Mûhemmed (e.s.w) be, li ser malbata wî ya pak û paqij, li ser eshabê wî yê fedekar û heta roja qiyametê li ser tamamê mu'minan be.

Deşt û çîya, qilaçê dila hişk bûbûn. Ji pel, pincar û gîya mehrûm, mabûne rût û tazî. Li ser seranserê cîhanê, ğelara bûbû. Bêrîvan ne diçûn bêrîyê. Dengê pez û berxa nedihat. Ji şivan û bilûrvanan deng û his tunebû. Tevê daran pelên xwe weşandibûn, **gul û fêkiyê wan şewitî** bûn, 'hişk bûbûn. Kewê gozel, şalûl û bulbulan nema dixwendin. Pejna hudhudê mizgîndan nedihat. Ji şênaya dengê azana dîka nedihat bihîstin. Subhanallah! Her der tarî, sar û kerr bû, te digot qey tev ketine temara mirinê, xuşxuşa çem û kaniya nedihat. Şewqa birûskên buharê, xumxuma baranê, giregire tava û reqereqa ewra ji beşeriyetê re mabûn hesret. Qeqeba kunda bû bi dengê hêl dixwendin, şevşevoka li qada cirîd diavêtin. Her der tarî, her der zulûmat... Himhimê şêr û pilinga, 'ewte 'ewta çeçel û roviya, zûrezûra gura, 'ore 'ora keftar û hirça, serê çîya berf û mij û dûman bû. Fîrefîra bayê gûr û cemidî dihat ziravê meriv ji cîhanê diqetîya...

Dengê sitranên dengbêja, helbestên 'eşq û evîne nedi-

hat. Dengê silav û merheba, dengê aşîtiyê ji civakan nedihat. Guh kerr bûbûn, ziman lal bûbûn, çav kor bûbûn, dil mirî bûn, reş û tarî hişk bûbûn, Dengê kêf û henekên zaroka, dengê lîstikên lîstikvanan nedihat bihîstin. Ken bi ber devê dayik û qîzên biçûk nediket. Dil bi birîn, bi ax û nalîn bûn, karê wan şîn û girî bû. Çav ji ber girîne zuwa bûbûn, miçiqî bûn. Te dil û çav biguvaştana dilopek hêsir ji wan dihat. Gelo çî bûbû? Çi qewimibû? Cîhanê çerxa xwe şaş kiribû, berovaci dizîvirî, yan jî qiyamet radibû.

**Civaknas, 'aqilmendê jîr û zana wek Zeyd lawê 'Emr, Wereqe lawê Newfel û wek 'Usman lawê Hûweyrîs li wê rewşa xerab temaşe dikirin**, ğemgîn dibûn. Wek pinpinikê bêçare li rast û çep ziz dibûn, dipengizîn, çavê xwe li şewq û nûrekê digerandin bi hesret û axîn, bi du'a û amîn. Dilê tîbûyî bi guman û hesreta avê bi sed salan li çol û sehraya qûmê li pê leylanê revîya bûn, betilî bûn, ji qawet û taqet de ketibûn. Çavtirsîyayî bûbûn, hêz di çoka wan de nemabû, qudûmê wan nedîşûjîlî. Rihan, ne'ne' û 'indeka bîna xwe ya wek miskê wenda kiribûn. Kulîlka dila çîlmisî bûn, reng li wan nemabû, bulbulê dilan mest û lal bûbûn, deng ji wan biliyabû. Mêrg û zozan, rez û bîstan hişk bûbûn, çem û behr miçiqî bûn, kanî zuwa bûbûn, erd terikî bû, baran nedihat. Ji tenûr û tîfkê dilê bindesta, duxana agrê nan û xwarinê bilind nedibû. Jiyana cîhanê pêç bûbû. Ğela, birçîbûn û tîbûnê konê xwe li ser insan û heywana tevda vegirtibû.

Mecnûnê dilê bievîn, dîn bûbû, jibo bighêje Leyla xwe, çol û çîya û gelek astengî derbas kiribûn. Lê belê bi wîsala hebîbê bi miradê xwe şa nebûbû. Tu dev ji jiyana bi rastî berde, di xewnê de jî wîsal çê nebûbû. Lewra wê demê xewn jî tirs û kabûs bûn, gurê manco bûn, lewra dem zivistan bû,



hîna bihar nehatibû. Mecnûn, Ferhat, Mem û Siyamendê dîroka wê demê bi miradê xwe şa nebûn, bi hesreta wîsala meşûqên xwe mirin ji vê dinya fanî bar kirin, miradê wan di qirika wan de ma, bi wan kul û meraqa çûn goristanê.

**Cîhan bêsermiyan bû, însaniyet bê serok û rêzan mabû,** rêya xwe şaş kiribûn, serserî di kendalê hilakê wer dibûn, digindirîn binê newala esfelessafilînê. Keçikê biçûk bêguneh bi saği di bin axa sar de dihatin veşartin. Mafê mirovan, azadî û heqê jîyanê ji holê rabûbû. Xwînmijî, kedxwarî û koledarî ketibû rewacê, hukum dimeşand. Bextê dayik û qîzan reş bû, yetam û sêwî, sutûxwar bûn, li nav civaka şerefê cîyê rûniştina kesê qels, kole û xizana tunebû. Lewra dem zivistan bû. Cîhan tarî bû, cîhanê axîn û keserek kûr, ji kezeba şewat dikişand. Bi zimanê hal digot: Gidîno şev û zivistan, çiqaşî dirêj bûye! Qey îşev nabe sibe? Ma gelo qey îsal buhar nayê? Lewra çav qerimîn, nig betilîn, rûh û dil westiyan li hêviya şeveq, buhar û mizgîndanekî ne.

**Sal 571!** Tarîxa miladî diwazdê meha rebî'ulewwelê, **bîstê Nîsana Miladî,** şeva duşemê, destê sibê, li bajarê Mekkê, ji nav Qûreyşîya, ji bavikê Benî Haşîm, Malbata 'Ebdulmuttalîb, ji 'Ebdullah û Amîne, bi navê Mûhemmed ('e.s.w) Xwedê Te'ala xilateke mezin da cîhanê. Cîhana tarî nûr veda, buhar hat, dar şîn bûn, ji her celebra pel û pincar xemilîn, gul û kulîlkê rengo rengo bişkivîn, bi xeml û xêza xwe cîhan neqîşandin. Teyr ji qefesa azad bûn, mizgîn dan şalûl û bulbula. 'Aşîq û meşûq gihan hev. Ji şeraba qedeha 'eşqê vexwarin, mest bûn, derd û kulê xwe ji bir kirin û gotin ya Rebbî: Hemd û pesn ji te re bin ku te ji mer buhar anî û di vê buharê de te ji mer dermanê dila, melhema birîna, nûra çava Mûhemmed Mûstefa ('e.s.w) anî.

Bihar xemilî, gîzala çîndik dan xwe. Dewar, pez û deveyan têr xwarin. Bereket ket guhanê wan, şîr zêde bû êdî, bêrivan çûn bêriyê. Li veşerê 'iyarşîrê tije şîr dan ser milê xwe, bikêf berî dan malê. Pîreka meşk û lolibê xwe girê dan, çatma xwe li dar xistin, bi çoşek mezin dest pê kirin dew kilan. Dengê kulpe kulpa meşkê, ji dengê def û 'erbanê xweştire. Pez û berx li hev dan bûn. Barebara berxa, agahiya kêfxweşiyê didin û ji dengê saz û nağmeyê stranbêja xweştire. **Dengê Kewê gozel û dengê bilûrê şivanan** ji çîya li hev veşerîyan guhê 'aşîqan, ji ber mest bûn. Kêf û lezzeta wan denga ji şeraba 'eşqê xweştire. Wek da'weta bûk û zava, bulbulan helbestên 'eşqê xwendin û

govend li dar xistin, evîndar bi cezbê ketin. Mêşê hunguv ji kêfa buharê li ser gulê rengîn, bi du desmalan reqîşin, soz û mizgîna hunguvê heqîqî dan cîhanê.

Barana nîsanê barîya, çemê dila herikîn, newal û gol tije bûn, mêrg û deşt û zozanên mirî sağ bûn. Rez û bîstan şîn bûn, çîya û qilaç bi rengê kesk xemilîn. Pîrêze û şûvan bereketa xwe derxistin. Kulîlkê qawanê, beybûn, qurnefîl û nêrgîza ji kêfa re dilan kirin. Pinpinik bûn qasid, bi reqş û çoş mizgîna da'wetê dan. Kulîlkên kesk û sor cîhan boyağ kirin. Teyrên ebabel ref bi ref hatin bûn mizgîndanê buharê. Hudhudê 'eşqê ji Bûsra, ji cem Behîrayê rahîb peyama 'Îsayê Mesîh û **mizgîna Mûhemmed Emîn ('e.s.w) anî.**

Kesên bindest û kesên dilşikestî ji newala zilletê bilind bûn, hilkişîyan asîmanê şerefê. Devê dayikan ji kêfan nedihat ser hev, qîzên biçûk gihaştin mafê xwe, ji kuştinê azad bûn. Ji ser girê şerefê li cîhanê qurîyan helbesta "Tale'el bedrû 'eleyna" bi dengê bilind xwendin, dengê wan li hev veşerîya, zimînî ji Medîna Munewwer hat. Ev helbesta bi şeref bi herfê zêrîn di rûpelên dîrokê de dane nivisandin. Buhar hat, mizgîni hat, geş bû war û welat û heyat. Şên bûn meclîs û civat. Ji serê çiyayê Nûr ji şikefta Hîrayê bi fermana Xwedê bi wasîta Cibrilê Emîn li ser zimanê Mûhemmedê Şêrîn ('e.s.w) bi dengê "îqra-Bixwîne"yê hêv derket, nûr der bû û rojek nû li ser cîhanê hilat. Ev nûr li nav netewa teva belav bû, 'Ereb, 'Ecem, Kurmanc û Romî. Mij û tarîti bela kir, tevê cîhanê ronî kir, bakûr û başûr, rojava û hem jî rojhilat.

**Ey bulbulê dilê minî bievîn!** Çavê xwe ji xewa gîfletê veke, serê xwe ji qefesa koletiyê derxîne. Hela were careke binêre bi çavê xwe yê azad binêre, carekê temaşe bike, tê bibîni ku dunya bûye buhar, Nîsan hatiye, gulîstan xemilîye. Tu bi qedrê Xwedê ke de ka were tu bi dengê xwe yê dawûdî helbestên 'eşqê ji mer bixwîne, me çoş û meczûb bike, bera çavê bigirî disa bikenin, dilê birîndar melhem bibin, bera 'aşîq bighên hev. Fîraq û gîribî rabe, bera serê yetam û sêwîyan bi destê rehm û şefqetê bêne mesihkirin û bera hêsîrên hefsa azad bibin, ew ji beşdarî şahîya nîsanê bibin, de bera hesreta dê û bav û pîrek û zarokan xelas bibe. Ey bulbul! Em jî temam ji dîra te re dibêjin Amîn!

Salvegera wîladeta Resûlê Ekrem Mûhemmed Mûstefa (s.e.w) ji me û we re, ji ummeta Îslamê re û ji tevê cîhanê re pîroz û mubarek be. Bimînin di xêr û xweşiyê de.

**Lolib:** Yayîk

**'iyarşîr:** Hayvan postundan yapılan süt kırması

**Çatma:** Çatma, Kurma

**Beybûn:** Papatya

**Pinpinik:** Kelebek

**Qurnefil:** Karanfil



✍ Mehmed Mircan

Pizeyi yow dadi dı, dileti estibi. Dileton ra yewi, ey bini ra va:

"Tı welıdayış a dima cûyayış ra bawer keni?"

Ey bini cewab da:

"Xwıra! Gani welıdayış a dima yow heyat bıbo. Beno kı, sebebo kı ma etya dı moneni, ma semedi hadre biyayışi welıdayış hê etya dı yi."

"Absurd", va ey bin.

"Welıdayış a dima yow heyat çiniya.

Bacna zi xwı bı xwı fıkrıya û mereq kerd, va: "Gelo, eg ina yow heyat bıbeni, çı tewır yow heyat beni?"

Ey bini va:

"Ez nizona. La gorê mı, aca dı etya ra zafêr roşnayı esta. Bêlka ma aca dı seri lingoni xwı dı şo, û ma pey feki xwı çik bıwer. Beno kı aca dı her yow çik esto kı hişê ma etya dı nêşkena fehm bıkeri."

Ey diyın va:

"İmkoni yi çiniyo. Ma seni seri lingon xwı dı şini, imkon ey çiniyo. Merdım seni bı feki xwı dı çik weno? Etya dı ihtiyacıyê ma çı bıbo, ma naki ra weni. La enı nak zi zaf kılm o. Aye ra, ez bawer nikena kı welıdayış ra dima yow heyat bıbo. Hişê mı enı fıkr qebul nikeno."

Ey diyın va:

"Gorê mı, welıdayış a dima yow heyat esta. Bêlka

ena heyat ra zi ciya ya, û aca dı ihtiyacıyê ma nak dı zi nimonena."

Ey yowın cewab da:

"Absurd. Ek biyayış a dima yow heyat bıbeni, qey kes nigêrawo a? Welıdayış, peyniyê heyat o. Bad welıdayış a, beno tari û zulumat, û ma her çı xwı vira keni. Yani, bad welıdayış a yow heyat çiniya."

"Ez nizona. La ez bawer kena kı welıdayış a dima ma dadiyê xwı vineni. Ya awniyena ma ra."

Ey yowın va:

"Twi va dadiyê ma? Tı raşta bawer keni kı yow dadiyê ma esta? Enı zaf komik o. Eg yow dadiyê ma esta ha ça?"

Ey diyın va:

"A ha her ca dı. A ha derdormaleyi ma dı. Ma aye ra yeni. Ma zerreyi aye dı cûyeni. Eg ya mebeni, nê ma beni, nê zi ena dinya beni."

Ey yowın va:

"Ez aye nivinena. Çiko kı ez nivinena ez bawer nêkena."

Ey diyın va:

"Rey rey, zeg tı bêveng û ason biyi, û bale xwı bıdı cı, goşdari bıkeri, tı şık fineni cı kı a esta. Tı eşkeni bieşnaw kı ya ha cuar ra bı sinayış û şefqet veyn-dona twi."



# NÛR MÛHEMMED HAT DINYAYÊ



✍ Xelîl MISQEYNTERÎ

*Hebîbê min gula cîhan, Mizgîndanê cinn û insan  
Roja duşem bîstê Nîsan, Nûr Mûhemmed hat dinyayê*

*Ya Mûhemmed navê şêrîn, Tu dermanê êş û birîn  
Ji 'ezmana kulîlk barîn, Nûra dila hat dinyayê*

*Jibo qelsa buhar seyran, Coş û cezbeya bulbulan  
Buhar hatî çû zivistan, Nûra dila hat dinyayê*

*Bîstê Nîsan îd û newroz, Nûr Mûhemmed çiqas pîroz  
Ji aşiqar eşqa wî doz, Nûra çava hat dinyayê*

*Sutûnê Kîsrayê şikest, Vemrî agrê agirperest  
Kolew mzlûm bûne serbest, Nûr Mûhemmed hat dinyayê*

*Ya Rebb hezar şukr û minnet, Bi lutfa te dîs roj derket  
Serme barî nûr û berket, Nûra qelba hat dinyayê*

*Gula bêreng dîs vegerya, Çavê-b girî dîsa kenya  
Hat mizgîna hemû sêwya, Nûra pîroz hat dinyayê*

*Şeva tarî ronî veda, Şewq û nûrê da her erda  
Azad bûnej kul û derda, Nûr Mûhemmed hat dinyayê*

*Ez Salih im birîndar im, Şev û roja ez gemxwar im  
Meha Nîsan bextewarim, Nûra çava hat dinyayê*

# LI SER BIRATÎYÊ

Yehya ÊZDARÎ

**Ez dixwazim** di vê hejmarê de bahsa biratiyê bikim. Lewra biratî yek ji muhîmtirîn dustûrên Îslamî ye. Xwudayê Te'ala di sûretê Hucûrat ayeta 10an de ferman dîke ku "Ancax mu'mîn bira ne." A rastî di dinê Îslamê de ev dustûr ji esasê 'eqîdeyê ye jî ku ev biratî li pêşiya biratiya xwînê tê. Jiber vêna mûminek nikare bêje "ğeyrî muslîm birayê min in" Dema ku wiha yeqîn bike, wê ev tişt zirarê bide îmana wî.

**Di dîroka Îslamê de** biratiya ku bi awayekî heqîqî ya ewil hatiye tetbîqkirin, biratiya ensar û muhacira ye. Li Medîne Resûlê Xwuda (s.a.v.) ev biratî ava kirîye. Di tu dîrokan de biratiyeke bi vî rengî, dîrok lê ne bûye şahid. Ev biratî ne tenê bi gotinê bû. Yan di fikrê de bû. Gelek tişt hene hew bi tenê nezerî ne, di serê însan de derbas dibin. Lê însan nikare van tiştên bikarbîne. Resûlê Xwuda (s.a.v.) di Medîne de xwest ku cema'eteke nû li ser biratiyê ava bike, daku tu neyar nikaribin vê cema'etê ji ser rûye erdê rake. Ew çaxa ku li ser biratiyê cema'eta Medîne ava kir, hingî bi rehetî ji dinyayê re meydan xwend.

**Belê** biratiya ensar û muhaciran, a Îslamê bû. Resûlullah (s.a.v.) dersek dida însanan. Ev ders ne ku tenê dida yên di heyama xwe de. Dida însanên ku wê heta qiyametê bîn. Bi rastî Resûlullah (s.a.v.) gelek ders dabû însanan. Lewra medeniyetek nû dibin siya wehyê de ava kiribû. Jibo meriv medeniyeta ku Resulullah (s.a.v.) ava kiribû fahm bik, lazime meriv li dewra cehaletê meyzeke bê însan di hundirê çî wehşetê de bûn. Piştî ku Îslam hat bê çawa pêş ketin. Medeniyetek ku dirokê heta vê rojê nedîtî bû, ava kirin. Îslam biratiyeke wilo ji însan dixwaze ku hebûna xwe bi birayê xwe yê musulman re par bike. Jixwe lazime ku bi her hawî li birayê xwe yê musulman xwedî derkeve û alîkariyê pê re bike. Ji ber vê yekê Hz. Enes (r.a.) rîwayet kirîye ku Resûlullah (s.a.v.) wiha gotiye: "Zalim be jî mezlûm be jî alîkariya birayê xwe bike." Li ser vêna yekî got: "Ya resûlê Xwuda (s.a.v.): Eger mezlûm be, ezê alî wî bikim, ancax zalim be ezê çilo alîkariya wî bikim?" Resûlullah (s.a.v.) ferman kir: "Tê wî ji zilmê dûr bixî ya jî tê bibe manîe' zilma wî. Alîkariya ku tê pê re bike ha ev e." (Buxârî)



**Ji xwe dilêşandin** û ezîyate ku însan bide birayê xweyî mu'mîn, bi tu awayî ne caiz e. Ji ber wêna di nehazirbûna birayê xweyî mu'mîn de, tu nikarî bi xerabî behsa wî jî bike, ğeybeta wî heram e. Îslam bi vî awayî xwestiye ku biratiyeke wilo ava bike daku cema'at û komela mu'mînan bibin kelha ku neyê xerakirin. Bi tu quwwetî. Bala we ez dixwazim bikşînim ser wêna ku Îslam hem ji aliyê maddî dinyayî ve hem jî ji aliyê manevî ve cema'eta mu'mîna qewîm dîke û dişidîne. Xwudayê te'ala di sûretê saff di ayeta çaran de mu'mînê ku di rêya Xwuda de herbê dîkin, şibandine avanîyeke ji risasê. Bi rastî jî di her demê de divê mu'mîn di biratiya xwe de weke risasê bin. Sefê wan divê tu carî ji hev qet nebin. Belkî hingî heqê biratiyê bi cih bînin.

**Ensar û muhacir** bi her hawê xwe ji me re mînak û numûne ne. Lêbelê di biratiyê de meriv çilo heqqê biratiya dinyayî û maddî bi cih bîne, ensar û muhaciran nîşanî me dane. Hem jixwe di paqîjbûna qelbê de û hezkirin û qîmetdana biratiyê jî nîşanî me dane. Îro û heta roja qiyametê esasê ku cema'et û komal li ser ava dibe biratî ye. Ev biratî hem ji aliyê dinyayî hem jî ji aliyê me'newî ve lazim e. Mînak û numûne di destê me dene, em dikarin îbret û dersan ji wan bigrin. Heyateke nû weke ku Xwuda û Resûlê Xwuda ji me xwestiye li ser biratiyê ava bikin. Heta hejmareke nû bimînin di xêr û xweşiyê de.



# XORTÊN MU‘HEMMEDÎ

✍ Veysî UÇAR

Xortên Muhammedî em in      Em dixwazin ‘hûkmê Qur’an  
Em xwey şeref û ‘izzet in      Li pişt de’wa xwe ne her an  
De’wa Huseyîna em bernadin      Xort dibêjin bi hezaran  
Em talibê şehadet in      Em talibê şehadet in

Me ser hilda li her welat      Me deşt û zozan û çiya  
Bi Îslamê em bûne azad      Hejand bi dengê tekbîra  
Rebbê me da me ev xelat      Wek Hûseynê li kerbela  
Em talibê şehadet in      Em talibê şehadet in

Xort bi xêra van şehîda  
Dîsa rabûne li ser pîya  
Were gûh bide ey dunya  
Em talibê şehadet in



# Min Ji Te re Gotibû

✍️ Muhemmed Şakir



Min ji tere gotibû.

Salên dirêj, tije û bi wate têne û diçin.

Mîna aveke herikan, mîna çem û bestan natebitin, nasekinin

Zîndana min dûrbîna wan e, êsîr hê di nêzde dibînin

An kare bibînin û dîtî di vir de wek hûrdebînekê ye

Gelo ma qey hewceye ku ez bi nav bikim, ji xwe tu dizanî

Tu dizanî ez çi dibêjim.

Her sala ku tê bi qasî heyatê hildigire, mirinê jî hildigire

Weke bayekî qirş û qala komke û digel xwe bi hewaxe

Û Mirin û heyat ev e li ber destê teqdirê

Ha çivîkeke nû derketibe ji hêkê, ha jî çivîkeke diperpîte li erdê

Li alî din mirin û heyat ayetin, reh in, kok berdane nava salan

Mîna şev û rojan.. tu dibê qey du felq in pevra hatine cebirandin

Weke sibeh û êvarê, weke du hespê kihêlî timî li dû hev in

Ne dijî hev in, heval in, alîkar in

Derfetên herî bi nîşan derdixin, didine hevdû û didine me

Bi rastî di pê pazîyeke çetîn da ne

Di kaşekî bêserî de weke du bezvanê beza ku dibezine mebestekê

Yanî;

Bi qasî heyat mirinê dixwaze mirin jî wê dixwaze

Çava ku şev û roj hevdû dixwazin

Çava ku zivistan û bihar hevdû dixwazin

Çava ku xortanî û pîranî hevdû dixwazin

Çava ku êsirtî û azadî hevdû dixwazin

Jîn û mirin jî hevdû dixwazin

Hem jî bi evîneke dilşewat

Û ti vê dizanî...



'Ezîzê min! Bîne bira xwe, min berê ji tere gotibû  
Dema ku em şîrmijbûn, pitikbûn di hêlkanan de  
Li ba me **zarok zû kal dibin**, wexta ku em kalbûn min gotibû  
Min gotibû: Sal digel demsalên xwe mîna birûskan vedidin  
Bîrîq û pêtiyên herî mezin jê dikevin, di avêjin, belawela dikin  
Mûsîbet radibine weke çîya pend û şîret qet pere nakin  
Dubendî û pêvçûnan zarok xwarin, hêlîn li me tar û mar bûn  
Çi 'eybeke mezin, çi hetikandineke giran!

**Careke din gund û bajar xera... Têlsincik bûne rê... Ğerîbî bûye ware...**

Min gotibû: Her sala ku tê îlla saw û xofekê diber da bi ser me da  
Pêşî ricfeke bi dirrî dadixe ji esmanên xwe, jan û strî!...  
Janeke dilsoj dikeve movikên me, bêqidûmî dide navê, bela!!  
Paq li hev têne badan, pardû dikevîne hev, çav dimîne zîq û beloq  
Dûvre jî bidengî û bêdengî dikeve rê  
Bi rêya xwe ya bi taybet de bi lez dixerice û diçe  
Li pêy xwe şop û rêceke ji bîrhatîyan dihêle, Lew  
Ez ğem û kedera xwe bi van bîrhatîyan **distirêm** û  
Li ser singa salan rêzdkim û dihûnim...

'Ezîzê Min! Min gotibû...

Lê sal bi tenê ne ev in

Her sala ku tê îlla bihareke rengîn jî bi xwere tîne

Tu dizanî bihar leqînek e; carna lînûbûn, û carna vejîn, carna jî rabûneke...

Pêşî alem, paşê jî zemin bi afirîneke nû dilebite, dilerize

Careke din hemû tişt jî nû ve têne nivîsandin, em jî...

Kewên nikulsor, binevşên seg û mûrîyên nava te'htan jî...

Nivîskarên bi rûmet dixebitin, wêne jî nû ve têne kişandin.

Asiman rewşena xwe, zemîn xemla xwe bi kar tîne

Cotkar bi simbilan, şivan bi pez û berxikan şad dibin

Bêrîvan diçine bêrîya, zarok ji xewa şêrîn şiyar dibin

Mucahîd ketine rêya gund û bajarên me ava dibin

Musîbet dibe şayî **zarokên me aş û aram** dibin

Ala tewhîdê tê hildan, li kuçe û kolana heta bi gund û bajara li badibe

Her wiha, her sala kû tê îlla nîsan û gulaneke bi xwere tîne

Ewr û tavên rûkenî, baranên zana û mîzginber tîne

Xweda yar! Neqş û mîsalên Rebbanîye bihar,

Şad û şayîya dila kulîlk û gelezara tîne

Hilhatina hîdayetê

Hilhatina îsanîyetê

Hilhatina mistez'efa

Hilhatina delalê yar

Mewlîda Muhemmedî û muminên bi 'izzet tîne.



# DÎROKA UMMETÊ Û 'HALÊ UMMETÊ -2

✍ Nûreddîn QOSERÎ



Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm.

Temamê hemd û pesindan û weskên bi qencî xasê bi rebbê 'alemê ne. Selat û selam li ser seydayê seydaya, qasidê muellimê bêqelem be. Dîsa selat û selam li ser malbat û hevalên wî yên 'ezîz be ku pêxember derheqê wan de gotiye "Es'habî kennicumî, bî eyyihîm îqtedeytum îhtedeytum" Dûvre jî selat û selam heta roja qiyemetê liser temamê mu'minên te'qibkerên rêçika wî be.

Di nivîsa xwe ya berê de me bi kurtayî dîroka Îslamê ya ku temamê rûpelên wê bi şan û şerefê dagirtîne û 'halê ûmmetê yê ku niha em têde ne anîbû ziman. Lê me 'halê xwe yê ku niha em têde ne neanîbû ziman. Hew em gihîştibûn dema ku dewleta Alê 'Usman hatibû perçekirin. Înşaallah di vê nivîsê de emê bi kurtayî be'hs ji 'halê xwe yê rojane bikin da ku em zanibin bê em niha di kîja mer'heleyê dene û ji niha û pêde lazim e em çawa gava bavên. Lewra wexta ku meriv nexweşîya xwe tesbît neke, meriv nikare derman û tiryaka xwe peyda bike. Jixwe rîsipiyên berê wiha gotine: "Kesê ku pêşeroja xwe nizanibe, paşeroja xwe nabîne." Naxwe deka em bihev re li dema NEKBEya xwe binêrin û bihev re çend tesbîtan bikin. Hêvî heye ku ji me re bibe 'îbret û ders.

Dewleta Îslamê ya bi şan û şeref, ronahiya xwe dabû 'heta Ewrûpayê hê di dema Emewîyan de.

Vê ronahiyê, **çavê pêxwas û bindestên Ewrûpî** ku di binê lingê xwedî ax û maldaran de di'eciqîn vedikir. Kesên ku carekê, bi şiklekî ji çewlika axa derketiba û rêya wan bi bajarekî Endûlûse ketiba, nema dixwest vegezin nav qirêj û zilma axayên Ewrûpî. Lewra him paqijî, him serrastî û him jî 'edalet bi çavê xwe didît. A ha vê halê karkerên pêxwas, bala rayedarên Ewrûpî jî bêgûman dikişand. Jixwe qral û prensan, ji pêşî de li ser 'herba bi mislamana re li çareyekê difikirîn. Wexta ku pirsgerêkên ağan û jiber van pirsgerêkan, alîkariya him bi mal û him jî bi neferan pêşkeşî rayedaran kir, 'ezma wan zêdebû. Wexta ku meriv Ji hêla mislamanan ve dinêre, misluman tevî rayedarên xwe, ji maldarî û hebûnê ketibûn nava rehetîyeke ku insan dixwe gefletê. Dewleta mezîna perçe kiribûn, li tu rayedarên dewletê êdî gûhdar nedikirin welew ku 'heq bigotana. Aha ev hal ne 'halê ku misluman bikevnê. Lewra Xweda Teala vî 'halî jî mu'minan qebûl nake. Wexta gefleta mumîna wexta firseta kuffara ye. Jixwe piştî vê gefletê mumîna ji Ewrûpa bi 'halekî perîşan û bi komkujîyeke bêhempa hatin deranîn. Lê me mumîna ji vê tabloya 'îbretengîz zêde ders negirtin mixabin. 'Eynî 'hilê dijmin û gefleta mumînan, cara dudan dewleta Îslamê ya mezîna, welewki em ji Îslama wê bitemamî ne razîbin jî feşkiland, xera kir.



Xaçperestan piştî vê serkeftina xwe li ser erdnîgarîya Îslamê dest bi sazkirina dewletokên cûda kir. Jibo serektîya van dewletokan jî, ji xwe re ğulamên sadiq hilibjartin û bi wan re hinek peyman û 'ehdên sedsale girêdan daku di ğulamtiyê de tirali û qusûrê nekin. Di vê pêvajoyê de hema hema ji tevê qebileyên 'Ereban ên ku 'ehda ğulamtiyê dane û xwe ispat kirine re dewletokek saz kirin. Jibo Tirka jî ev qaîde derbas dibû, yanî şertê ğulamtiya sadiq hebû. Wana jî ev şert qebûl kirin û bûn xwedî dewleta ğulam. Lê belê li gellê ku qîma xwe bi ğulamtiya wan neanîn û xwe nefirotime wan, cezayeke mezin birîn. Him ew bêdewlet hiştin him jî ew ji hev perçe kirin. Daku ev gel fêr bikin ku bêyî wan tu kes nikare tu mafên xwe biparêze. Him jî di pêşerojê de bi destê neviyên wan ğulamên xwe yên ku nîyeta azadiyê -fikren an jî siyaseten- bikin, terbîye bikin. Piştî ku karê xwe bi vî awayî qedandin, wezîfeya xûlaman bi navê makeqanûna dewletê wan dane destê wan. Di serê van makeqanûnan de çend maddeyên ku nayêne guhêzandin hene, bêguman mafên wan diparêzin. Maddeyên piştî wan jî bikûrtayî te'lîmatên ku ewê çawa zulm û ezyetê bidine xelkê xwe û me'den û petrola herêmê bi çîhawî ji aĝên xwe re bişînin î'htîwa dikin. Bi temami

di heqê van yasayan de meriv dikare wiha bêje: Yasayên wan tev ji dewletên 'Ewrûpî yên filleh hatine stendin. Ev jî dişibihe ku meriv kirasê kesekî ze'îf li kesekî qelew bike. Ewê çawa kesê qelew di nava kirasê teng de bihneke bi hizûr bide? Di ronahîya vê dîrokê de ka em îro li 'halê xwe binêrin. Temamê 'alema Îslamê pirçik û parî bûye, xwîna mislamana weke lehîyê diherike, du dewletên mislamun bihevre dost nemane, yek jibo ya dî ze'îf bike, bi xaçperestan re ittîfaqê dike û bi birayê xwe re xayintiyê dike. Hêviya xelkê mislamun bûye **reva nava xaçperestan**, herroj bi dehan pîrek û zarokên mislamun di deryayan de can didin. Ji ğeyrî yên ku xaçperest bi destên xwe wan noqî deryayê dikin, difetisînin. Em tev li ber çavê xwe van bûyeran dibînin û neînsaniya Evropayê muşahede dikin, lê dîsa hêviya me ji waye. Ev 'hal meĝlûbîyeta herî mezin e. Lewra îro xaçperest plan û 'hîlên xwe yên sedsale nû dikin da ku sedsalê din jî me ji xwe re bikine bende û 'ebîd, lê hê em ji wan hêviya ku wê me xelas bikin û dewletan ji me re ava bikin dikin. Êdî bese, cara sisîya em nebin ê pêvedayi bi je'hra marê xaçî.

Bi hêviya şiyarbûna li ser hilên temamê kuffar, bimînin di xêr û xweşiyê de.



**Nekbe:** Hezimet, çöküş  
**Rayedar:** Salahiyetli

**Feşkilandin:** Dağılma, parçalama  
**Tirali:** Tembellik, atalet

**Guhêzandin:** Aktarma, nakletme



Di Dîroka Îslamê da Dewletên Kurd

## Dewra 'Ebbasîyan -1



✍ Yasîn Demîr

Dîrokvanên Misilman, di qeyd û nivîsên xwe da, Kurd carna qet nedîtine, carna piçûk kirine, carna jî guherandine bi qewmekî dinê cûda ve. Gelek şaxên Kurdan li hêviya ronayikirinê. Di vê xisûsê da, ji nû da gerek li qeyd û arşivên ğerbîyan, zêdetir jî li arşivên Watikanê were nêrîn. Lewra Ğerbî ze'f li ser milletên

Misilman xebitîne, me'lûmat û îstîxbarat berhev kirine, şandinê navendên xwe. Li ser Kurdan jî zêde xebitîne. Loma îro ne li ser şaxên Kurda tenê belkî li ser her 'eşîrekî, terîqekî bi dehan kitêb nivîsîne. Wana bi nîyeteka nebaş jî ev me'lûmatana berhev kiribin, nivîskar û dîrokvanên Misilman bi nêteke qenc ji van arşivan dikarin

istîfade bikin.

Qewmek di dîroka îslamê da dewsa xwe kifş neke, di rojê Misilman de nikare cî bigre... Bi vê meqsedê, li jêr, bi granî jî di dewra Xîlafeta 'Ebbasîyan de hînek Xanedan, dewlet û şaxên Kurdan, wê werne naskirin. (Li gorî rêza dîroka damezrandinê)



**1- CUSTANIYAN:** Dîrok: 805-919: 114 sal. 'Erdnîgarî: Navend, Deylem... Rey, Ruzbar (carina)... Xanedan: 5 Xanedana 'hukum kirine. (Ê paşîyê û ê dawî) 1. Merzûbanê Lawê Custan (805-?)... 5. 'Elî'yê lawê We'hsûdan (913-919)

- Gelek Welîyê Xîlafeta 'Ebbasîyan ji vê malbatê derketine.

- Kelha Alamûtê Custan 1. (yekem) çêkirina wê dest pê kirîye.

- Keça Custanê 2. (duyem) bi Sellarê lawê Merzûban ra zewicîye.

"Oğuz" ji bonî Tirka çî be, "Sellar/Salar" ji wisa derbas dibe ji bonî Kurdan. Lewra Xanedan û dewletên Kurd, bi pirranî ji nesla Sellar in.

**2- 'HEZBANIYAN:** Dîrok: 906-949: 43 sal. 'Erdnîgarî: Mûsil, Urûmiye, Eqra, Rewandiz, Şehrezor, 'Îmadîye... Xanedan: Ca'fer Mu'hemmedê I. Bilal Hezbanî. Di 949'an da di navbera Hemdanî û Hezbanîyan de şerr çê dibe. Hezbanî, nîvek bindest dibin. Nîvek ji koçberî herêma Bakêre Îranê û Azerbêcanê dibin.

**3- SELARYAN:** Dîrok: 930-1200: 270 sal. Bi navê Musafirîyan, Kangerîyan ji têne zanîn. Bi rastî, Musafirî, Merzûbanî, Salûqî, Şeddadî, Rewwadî tev ji nesla SELAR'în. Eqrebatîya wan û Eyyûbîyan ji heye... Sunnî û Şafî'îne... Erdnîgarî: Curcan, Deylem, Erdebîl, Ermenîyye, Azerbêcan, Arran, Nahçivan û Bağistan... Navend: Erdebîle. (Erdebîl û Geylan herêmekin. Şêxê Geylanî) Xanedan:

- I. Salarê lawê Merzûban: 927an de Mîrê ŞEMÎRANÊ ye. (I.=law)

- II. Mekan Şêr-dilê lawê Selar: 928an de Welîyê CURCANÊye.

- III. Ewsar Musafirê lawê Selar: (Musafirîyan navê xwe ji vî hildidin.) Dewleta musafirîyan di nav lawê Musafir de teqşim dibe (NIŞE GIRÎNG: Xanedanê Kurd, Welatên xwe hemasa di nav lawê xwe û birayên xwe da weke mîrasê parve kirine. Loma ne YEKÎTÎ çêbûye, ne ji mezinbûn.)

- IV 'Elîyê lawê Musafir: 913an de Welîyê Îsfahanêye. 916an de Welîyê REY'êye.

- V. E'hmedê I. Musafir: 919'an de Welîyê Tarîmêye. (941'ê da dibe Dewlet)

- VI. Mi'hemmedê I. Musafir: 941-950'ê de Welîyê Erdebîlê ye.

**4- SALÛQÎYAN:** Dîrok: 914-924: 10 sal... Li Deylemê dewsa Custanîyan digrin. Salûqî esas şaxeke Musafirîyan e. 'Erdnîgarî: Deylem, Rey, Ruzbar. Xanedan: Salûqê lawê Mu'hemmedê I. Musafir.

**5- DEWLETA TARÎMÊ:** 915-1065: 150 sal. 'Erdnîgarî: Tarîm li başûrê Geylanê, navbera Reşt û Zencanê li dora çemê Qizil Xozanê welatekî Kurda ye piçûke. 941'ê da dibe dewlet. Xanedan: 8 Xanedan derbas bûne...

- I. Mu'hemmedê I. Musafir (915-919)

- II. Ehmedê I. Musafir (919-941),

- III. Ebû Mansûr We'hsûdanê I. Mu'hemmed (941-966),

- IV. Nû'hê I. Wehsûdan. (Nu'h, Xanedan yê ji lawê xweyî Custan ra dihêle û dibe Welîyê ŞEMÎRANÊ. Di vê dirokê da Tarîm (989-997) 8 sala dikevê bin îşgala Bûweyhîyan.)

- V. Îbrahîmê I. Merzûbanê I. Îsma'îlê I. Wehsûdan (997-1029= 32sal)...

- VI. Musafirê I. Custanê II. (1049-1065) (1049-1065)... 1065an de Selçuqîyan Tarîm îşgal kirin.

(Tirk berya vê diroka hê ji Asya navîn derneketîbûn...)

**6- MERZÛBANÎYAN:** Dîrok: 941-971: 30 Sal... Erdnîgarî: Ermenîyya û Azerbêcan.. Merzûban nevyê Musafir e: Merzûbanê I. Mihemmedê I. Musafir. Xanedan: 1. Merzûban (941-957). 2.Îbrahîmê I. Merzûban (957-971) 971an de Bûweyhîyan Ermennîyye û Azerbêcan îşgal kirin. Merzûbanî tabî'ê wan bûn.

- Keçeke Merzûban bi Ruknûd-Dewle Bûwayhî ra zewicî. Zarê wî hene.

- Nasirê I. Merzûban, 960'ê de Welîyê Erdebîlêye.

- Rewwadî û Şeddadî ji nesla Merzûbanîyan di nav Rewwad û Şeddad de belav bûn.

**7- ŞEDDADÎYAN:** Dîrok: 951-1200: 249 sal... 'Erdnîgarî: Navend 'heta 971'ê DWÎNê dora GENCE'ye... 'Arran(Karabağ), Ermenîyye, Naxçivan, Derbend (Demirçapî). Xanedan: 20 Xanedan derbas bûne. (Ê herî peşî û ê herî dawî). 1. Mihemmedê I. Şeddadê

I. Rewwadê I. Merzûbanê I. Musafirê I. SELAR. (971-979), XX. (20)- Key-Sultanê I. Me'hîmud ê I. Şawer I. Fazlunê IV. (?-1200)

- Di nav xwe da serdest bûn. Di wê dewra da bendeyê Xîlafeta 'Ebbasîyan bûn.
- 1054an da bendeyê Selaqîyan bûn. Middetekî bendeyê Bûwehîyan jî bûne.

**8- REWWADÎYAN:** Dîrok: 1029-1117: 88 sal... 'Erdnîgarî: Navend Meraga... Gence Carekî Tebrîz jî ketîye destê wan. Xanedan: Rewwadî, 'esil di dewra Ebul-Heyva Mihemmedê I. Rewwad de serdest dibin. Ebul Heyca Mih. 987an de Welîyê DWÎNEye.

1. Memlanê I. Ebul Heyca Mihemmed (1000-1025), 2. Wehsûdan I. Memlan (1025-1059), 3. Ehmedîlê I. Îbrahîm I. Wehsûdan (1071-1116) Eva ji alê Batinîyan ve li Beğdayê tê kuştin(?). Memlûkekî wî yê bi navê "Aksungur" heye. Ev derbasî dewsa wî dibe. 1117an de bendeyê Selçûqîyan dibin (Atabegên Meragayê ji vê neslêne).

**9- 'HESENWEYHÎYAN:** Dîrok: 959-1047: 88 sal... 'Erdnîgarî: Paytext, Dînewer. Burûcêrd, Exwaz, Sermac, Hemedan, Nîhawend, Şehrîzor, Rohîlata Başûrê Anatolîyayê. Sunnî-Şafi'îne. Xanedan: 1. Ebul Fewarîs 'Hesnweyh'êl. Hûseynê Berzîkanî (959-980:21). 2. Nûrûd-Dewle Ebû Necm Bedîr (980-1014: 34) hate kuştin. Baweyhîyan, ji Xanedanan 2 birayê 'Hesenweyh, 6 lawê wî, 2 nevyê wî û gelek ji pêşkêşên wî kuştin. 1047an de bi tenê Kelha Sermacê di destê 'Hesenweyhîyan de mabû. Ew jî Femandarên Selçûqîyan Îbrahîm Înal jî destê wan girt.

**10- 'ENNAZÎYAN:** Dîrok: 991-1117: 120 sal... 'Erdnîgarî: Navend; 'Hulvan, Karmîsîn (Kîrmanşah), Daga, Şehrîzor, Lorîstan, Şazencan, Dînewer, Bacîsra, Samgan, Diz-î Mahkî Rawenda, Şîrvan... 'Ennazîyan jî 'Eşîra Sazencanin. Dewsa 'Hesenweyha girtine. Heta 1043'ya bendeyê Buwehîyane. Di 1043'an de bendeyê Selçûqîyan dibin. Carna Selçûqîyan re şer dikin. Xanedan: 1. Ebul Feth Mihemmedê I. 'Ennaz (991-1011: 20 sal). 2. Husamud-Dewle Ebî Şewq Farîz (1011-1046: 35 sal), (Wexta Bedrê lawê Hesenweyh tê kuştin, Ebîşewq Karmîsînê distîne. Dûvra Xane-

dan dibe 3 perçe. Li ser 3 şağa berdewam dike. (Ebul Macîd Muheyhîl: Mîrê Şehrîzorê). I. Nesla Ebul Macîd muheyhîl / II. Nesla Sur'habê I. Ebul-Feth (Li Bendencî Xweseriya xwe îlan dike) / III. Nesla Sa'dî (Ar. Su'da): Rawendayê ji xwe ra navend digre.

- 1102an de, şaxa ji nesla Muheyhîl; Surhabê I. Bedîr, Xanedanê 'Heft zîganê ye. Lawê wî Ebû Mansûr derbasî dewsa wî dibe.
- Sedsala 12. Da Xanedanê Huzîstanê Şumlê û Mîrê Lorîstanê Surhabê I. 'Ennaz berdewama 'Ennazîyan tèn qebûlîkirin.

**11- MERWANÎYAN:** Dîrok:991-1085: 94 sal... 'Erdnîgarî; Amid, 'Herran, Nîsêbîn, Wan, Xelat. Xanedan: I. Ebu 'Evdîllah 'Huseynê Dostîkî. II. Ebu 'Hesenê lawê Merwan (Di 997an de mir.)

**12- MÎREN BATÎXAXÊ:** Dîrok: 949-1215: 266 sal... 'Erdnîgarî; Heremeke Başûrê Iraqê, navbera Firat û Dîclê, zêdetir jî li herdû alê Dîclê dirêj dibe hettanî Bakurê Besrayê... Ji ber zêde hezek (batax) hene, jê re "Bataix" an jî "Batîxa" hatiye gotin. Zû ji destê 'Ebbasîyan derketîye û pir dest guherîye. Xanedan: (...) ji piştî 1047an îdarekirina vira ketîye destê Malbatan "Ebul Cebr". Ebul Cebr ji nesla Sedeqeyê 1. (yekem) ê Sultan Bahaud-Dewle Mansûr e... Bahaud-Dewle Mansûr, Sultanê Mezyedîyanî sêyemîn e (3). Mezyedî Kurd in. Ji Ennazîyan (li jor desbas bûn) hatine. Lawekî Sedeqeyê 1.(Yekem) bi navê Tacul-Milûk Ebî Necm Bedran heye. Di 1108an de hat kuştin.

Eva di çavkanîyên 'Ereban de bi navê "Fulane b. Muhammedul Muhtas b. Ebî Cebr" cî digre. Ev kesa di navbera 1047-1086'an de 39 sala Milûkatîya Batîxayê tev ji vê malbatêne. 1215an de Mîr; lawê Ebu Se'îd Mûzaffer Îsmâ'îl-ul Mustanîe. 1019-1021an de Mîr ê Batîxayê Ebû Şûca Sedeqe, lawê Farîsê Mexyedî ye. Batîxa 1215an de dîsa bendeyê 'Ebbasîyan dibe.

Mîrê Batîxayê ne. Berya Malbatan "Ebul Cebr" jî weke Îmranê Şahîn, Ebul Ferec Mihemmedî (928an de tê kuştin), Ebul Heyca Muhemmed II. (1021), Merzûbanê I. Merdan, bi texmîneke mezin Kurdin. Lewra, Alîgirên (terefdar) Eba Mislim Hemedanî (Xurîstani) li vê heremê zêde bûn.



# Baran têê, barann têê!



✍ Ehmêd NAS

Di biharê de hinek ewr hene. Piştî demên dirêj ku bi zîwayî derbas dibin, kom bi kom nêzîkî hev dibin. Gundîyê ku zadê wan kirî hişk û 'erdê wan zuwa bibin, bi hêvîyek şêrîn li wana temaşe dikin. Her gavê serê xwe radikin û li ezmana dinêrin.

Komê ewra li hev dicivin, li ezmana reş dibin. Wek dibêjin "em tije baran in" Gundî di dilê xwe de dest bi du'a dikin. **"Ya rebbî! Tu li me bê rehmê"** Wexta li hineka rast bên be'hsa wan, ev ewr û barane. "Re'hmet bihata pir baş bû" dibêjin ji hev re. Navê baranê re'hm e wê demê.

Bîstek din çend peşk dikevin erdê. Qîza malê bilêz bazdide serê ban. Wê cil û bergê xweyî li ser têlê raxistî birevîne jiber baranê. Yana ew te'ba ku bi wan ra dîtibû wê giştik vala here. Çawa di derenca de dadikeve çav li kara dikeve. Bi dû wan de berxik û helbet karwênî... "Hûn çi zû revîyan. We yeqîn nekir hûn bên ne?" Bîskêkê xeyidî û pişt re çû em têxe alifa ji bo pez. Çunkî aniha wê pez jî ji ber baranê bianîna mal.

Ji zaroka re dirêjkirin ne hewce ye. Waye hatin malê, ew besî wa ye. Bi destpêkirina baranê kar û berx xistin axur. Rast bû; li me'na bûn ku xwe bigihînin malê û şivê bavêjin. Da ku bighên hevalên xweyî lîskê. Jiber vêna çawa ewr reş bûn dengê bi wan ket "baran têê, baran têê" û berê xwe dan malê. Tobe 'hram hê peşkek baran jî nehatibû. Îcar li benda sekna baranê ne ji bo xwe bavêjin sikaka. Wê bi xêzka dîwara bilîzin.

Baran destpê dike. Kêfa gundiya ana li cî ye. Ji niha de zadê têr av û bilind bûye li ber çava xwuya dikin.

Xwedê zane belkî hineka 'hesabê ma'hsûl jî kirin û di xeyala xwe de deyn û meynê xwe jî dan. Reqreqa tavan coşê zêde dike. Tu dibê qey tav jî dibin şîrik ji kêfa wan re.

Şivan ji ber go dûrbûn, ne wek karwênîya bisiûdbûn. Rebena şil û pil bûne. Lê ne gem e; waye gihanemalê. Bûye barr barra mîh û berxa. Berxikê biçûk bera ber diya wan dan ji bo wan dahn bikin. Dûvre pez bera ser em dan û çûn ber sobê. Sobe ji agirê sergîna sor bûbû. Gumgum tijje avbû. Jibo destmêjê germ dibû.

Wê gavê dilê 'hemûwan xweş bû. Baran dihat wê zad şîv bibana dilê bavê wan pir xweş bû. Zarok giş gihabûn malê dilê diya wan xweş bû. Pez temam bi cî bûbû dilê xorta xweş bû. Şîv hazir bû, sobe dagirtî bû; dilê qîza malê xweş bû. Hela tev cil û berg jî ji ber baranê xelas kiribûn. Tenê zarok nikaribûn derketine sikaka. De bera ew jî li hindir bi heftoka bilîzin.

Û bi rastî dilê mamoste jî nexweş bû. Bi tevayî xelkê di nav karê dunyayê de winda bûbûn. Ummet dibin zulma kafîra de, li benda re'hmetê bû. 'Ewrên tarî li ser misilmana kom dibûn, reqreqa tava guh ker dikirin; lêbelê ew dema kêfxweşiyê nedihat. Mamoste ne bêhêvîbû, belê pir gêmgin bû.

Mellê muğrip bang da. Ji xwêre got "Erê Xwedê herî mezine. Helbet piştî evqas 'ewr û reqreqa tavan wê rehm werê." Rabû çû camiyê. Mâlî jî ketibûn dora destmêjê. Jixwe av germ bibû. Diya wan hinek tert avêtin sobê ji bo nevemire. Qîza malê sifre hazir dikir. Zaroka hîna bi heftokê xwe dilîstin.

# KOMKUJÎYA HELEBÇE NAYÊ JIBÎRKIRIN

✍ M. Mahmud TIBYATÎ

Em ummeta 'İslamê, mezlûm û mehrûmên bi dirêjîya tarîxê re Eraserî zulmê bûne. Ji bil Xweda tu kes û kesekî me tune ye. Heger cesedê me bi hezaran perçe parî bikin jî, em dîsa destê xwe ji mucadela bi zalima re nakşînin.

**Ne yek ne deh ne sed bi hezaran bûyer...** Xwîn dirje, can dişewite, ça'v digrî, bajarê Îslamê bi serhev de xira dibin, hêjayên me yên qûdsî têne cûtin... Heta niha hêsrên bi sedem van felek û bobelatan hatine rijandin, bighêjin hev dê lehî rabe, ku ziman van qetlî'aman bibêjin dê lal bibin, ku tilî dikaribin binivîsin dê felç bibin; van êşa van elema, van qetlîama, van rehqelandina...

Qeyd û zincîr, nefî û talan, qetlîam û zindan, komkujî, hewara dayik û bavên û bi hezaran şeniqandin... Armanca wan nesl û nifşê bi Qur'anê mazin dibin, tune bikin, mejîyan ji bawerîya tewhidê xalî bikin, hêjayê Îslamê ji binî de ji holê rakin...

Bi dirêjîya tarîxê re serok û rêzanê zalim û xwedênenas, qewwet û îqtidara xwe li ser xwîn û xebata xelqê mezlûm û mustezefa ava kirine.

Jibona textê xwe yê zulmê mûhafaza bikin, jibo hebûna xwe bidomînin lazime her roj qulpikekê bi zincîra zulma xwe ve bize-liqînin. Lazime tovê fitne û fesadîyê di nav 'alema Îslamê de biçînin. Çimkî ew herdem hebûna xwe li ser xwîn û xebata mezlûma berdewam dikin. **Qûtê pê dijîn xwîn**, hêsrên çava, zulum, îşgal, rehqelandin û komkujî ye. Weke kena devê xwe dixin xwîna mezlûma. Hetani nebe'ecî jê dernaxin. Çimkî ew bi talanan bi qetlîman, bi îşxalan û bi komkujîyan hebûna xwe li ser linga dihêlin...

Jiber vê agirê îxtîlafa dubendîyan, şerrê biratî û xwe bi xwetîyê, pevçûna mezheban di nava me de pêdixin. Nifşê me yê nûhatî dibîne hilakê, mehsûlê me îfsad dikin, zengîniya serax û binaxa me didizin, dewletên me yên Îslamê yek yek îşxal dikin, xweşîkbûna coğrafîya me ya tabî'î wêran û talan dikin.

Komkujîya Hîroşîma, Nagasakî, Qudus, Sabraw Şatilla, Deryasîn, Darul Beyza, Tîbet, Hûmûs Hama, Duceyd, Bosna, Ğezze û Helebçe rûreşîya tarîxê ya vê sedsala paşî ye. Ev qetlî'am û komkujîyên civakî wehşet û hovîtiya medeniyet û şaristaniya wan a qirêj û zenggirtî careke din li pêş ça'vê însaniyetê raxistiye. Qetlî'am û komkujîyên îro têne kirin, mel'aneta xaçvanê zeftkar careke din di mejîyan de bi can dike.

Komkujîya civakî ya li bajarê Îslamê tê kirin; şewata îxanetan, û qelêşîya di sînga me de hatine çikilandin. Sedema van qetlîam û bûyerên bişewat durutiya serokê xayin û firotî û dûrketina ji Îslamê ye. Belkî jibo hişyarî û serxwebûna ummete, jibo em li hêjayên





xwe yên qûdsî vegerin, jibo em wechê xayînan yê biqirêj nas bikin; Xweda bi xwîna mezlûma pêşya me ronî dike. Çimkî zulum jibo zalima 'ewrê 'ezabê bi xwe re tîne.

Pêla zulmê ya dinya mehû kiribû di 16ê Adara sala 1988an de behra însanîyetê careke din şolî kir. Lewra ferê destarê zulmê bajarekî Kurdistana başûr bi navê HELEBÇE vê carê di nava çerxa xwe de hûr dikir. Belê li başûrê Kurdistanê bajarekî mezlûm bi navê Helebçe di 16ê Adara sala 1988an de bi jehra kîmyasalê ji binî de ji dar dihate danîn.

Bican bêcan her hebûn ji vê zulmê par digirt. Zarok, pîrek, sebiyên di pêçeka de, îxtiyarê hizhizî, xort, qîz, heywan, nebatê erdê, dar û devî; bi kurta hî temamê rûhber û camida ji vê zulmê ji vê qetlîamê, ji vê wehşetê, ji vê hovîtîyê, ji vê rehqelandinê, ji vê xwînwarîya zordijwar nesîbê xwe distendin.

Komkujîya Helebçe ne tesaduf bû. Lewra zalim bi zanebûn bo komkujîya Helebçe neqandibûn. Çunkî bajarê Helebçe dergûşa Bizava Îslamê bû. Bi êrîşkirina Helebçe sê armancê xwe pêk tanîn.

1. Jehra xwe li ser xelqekî mezlum û bêxwedî diceribandin.

2. Bizava îslamî ji Helepçe li Kürdistanê bela bibû, dixwestin pêşya Bizava Îslamî bigrin.

3. Bi vê komkujîyê temamê kurdan ça'vtirsandî dikirin.

Ev hesabê wan bû, bes hesabê Xweda cûda bû. **"Tu zen neke ku tiştê zalim dikin Xweda jê bêxêbere."** (Îbrahîm: 42)

"Û ê ku zulmê dikin pir di nêz de bi înqîlab û dewrîmekê çawa wê bêne qulupandin dê fêhm bikin." (Şuara: 227)

Bêguman qetlîama Helebçe wehşet û hovîtîya 'alema ğerbê û ğulamê wan li ber ça'va radixe. Mas-ka wan ya biqirêj daxistîye, durûtîya wan bi carekê derxistîye holê.

Li Helebçê nêzî 7000 însanê me'sûm, mezlûm, feqîr, bêxwedî û bindest, bi xwînwarî hatine kuştin. Bes ev qetlîam dawîya zalima anîye, nexasim neyartîya ehlê kufr û şirkê hê bêtir bi gelê bêxwedî û bindest daye zanîn. Gelê Kurd bi vê qetlîamê fêhm kiriye ku ji bil Îslamê, ji bil hêjayên Îslamê yên qûdsî tu rê rêç bo wî tuneye. Piştî vê komkujîyê grêdana xwe ya bi Îslamê hê bêtir şidandî ye.

# Helebçe

✍ Azad Rêbîwar

Di destpêka biharê de  
Ew çi qeşa bû kete erdê  
Tevde mirin hişkûn  
Gul û beybûn û nesrîn

Tu kes bi mirineke wiha bêdeng  
Nehata kuştin  
Kal û ciwan digel zarokan  
Bêcan ketin li deştê

Şazdehê adarê ji ezman mirin dibarî  
Ew çi pîlanek xaîn bû neyara danî  
Qet nayê jibîrkin heta em sax bin  
Ew bihara ku bi hêstira hate şuştin



# SEBEBNO!.....



✍ Cewad Qemerî

Berdestê nimêja 'îşayê bû. Qur'ana xwe danîbû ser re'hleyê bi dengê bilind û xweş sûretek ji sûretê Kelamê Qedîm dixwend. Dengê wî wilo xweş bû te digo hêja ye ku milayaketê asîmana ji bo guhdarîya vî dengê xweş û vî Kelamê Qedim dakevin ser rûkê erdê.

Rabû li dora xwe mêze kir. Di hundurê malê de xalî û xalîçe raxistîbûn. Wêneyek li ser dîwar di kêleka demjimêrê de dibêşîrî. Ev wêne wêneya xortaniya wî bi xwe bû.

Bi dîtina wêneyê re bîranînên qirnekî wek xewnek xeyalî di ber çavê wî re derbas bûn. Heybet û xeşyeta Kelha Amed di bin siya vî wêneyî de veşartî bûn. Sal û zeman çî zû diborîn. Dem û dewran çî zû diçûn. Hey felekê, bêbextê, qol xayînê! Tu çî zû per û baskê însana dişkênî.

Wêne bû wesîla xewnek xeyalî sêdar a Kalê Şêx Se'îd li meydanê dixwîya. Dadgeha zordestî û zulmê damezrandî bû. Jiyana herkesî re 'heram bû. Şêx Şemseddîne Mala Bokarkê di meydana me'hkemê de ji zulmê re meydan dixwend. Salih Begê Hênî sêpêkên îdamê wek bilêta cennetê di pejirand. Se'îdê Kurdî dadgeh bi dadgeh digeriya. Sîrgûn û zîndan 'xem nebû bes bila gel bêîman û bêbawerî dinya xwe neguherîne. Sîrgûn dibû mekteb, zîndan û şikeftên zinara dibûn medrese.

Îstêrkên çavê wî ji jor de dawerivîn daketin xwarê. Mendîla xwe ji bêrika xwe derxist sitêrkên çavê xwe paqij kir û bi xwe re nuhurand:

Şikeft neman ku me lê nexwend 'ilmê Qurani  
Zîndan neman ku me nekir medresa Yusufê Kenani  
Zozan neman ku me konê koçeriyê lê danani  
Kanî neman ku me avên sarên zezemî jê neani  
Hey gidî gelo dinya gewrik! Me tiştêkî ji te hilnani  
Îdî wextê nimêjê bû. Ji daweta Îlahî re îcabet lazim bû. Destnimêja wî ji xwe hebû. Lewra qet bê destnimêj nedigeriya. Li gorî şîreta bavê wiyê ku di zaroktiya wî de lê kiribû û ta nuha wek guharek zêrîn di guhê wî de digeriya destnimêj sîlahê mu'mîna bû. Lê dîsa jî di her nimêjê de dubarekirina destnimêjê nûra li ser nûrê bû. Rabû destnimêja xwe taze kir û ji Sûra ku merkeza medeniyetên qedîm bû derket û berê xwe da Camîya mezin.

Cema'etek qelebalix hebû. Çû ket nav refê ehlê nimêjê, milê xwe da milê wan û bi wan re sef girt. Ji xwe nimêj cihê tefekkur û xelweta Îlahî bû. Sefgirêdana di nimêjê de yekîtî û we'hdeta ummetê temsil dikir. Ji lew wî jî bi ehlê nimêjê re nimêja xwe digel xuşû' û 'huzûrê bi xwendina Qur'anê û tefekkura li ser ayetên di wê eda kir. Piştî edakirina nimêjê rabû xort û zarokên ku hatibûn camiyê pîroz kir. Lewra li gorî bawerîya wî xort û zarokên camiya digel xeml û rengê civatê wek teminata pêşeroja civatê bûn.

Her xortekî di koşekî camiyê de çend zarok dabûn dora xwe. Hem ew fêrî Qur'anê dikirin hem jî we'z û nesî'het li wan dikirin. Dilê wî pir xweş bû, kêfa wî hat, ew jî çû di goşekî camiyê de ket nav refê xwende-



vanên Qur'anê. Ji bil tes'hi'ha kêmxeletîyên mamostê zarokan tu têkilî bi usula dersê nekir. Digel pisporîya xwe wek şagirdekî nû di goşê xwe de guhdarîya dersê kir. Piştî ku mamosteyên xort dawî li dersa xwe anîn rabû ji xorta re got:

**-De kerem kin em bi hev re li ber derê camiyê çaykî vexwin.** Xort li dora wî civîn û bi hev re çûn di çayxanekî de rûniştin. Bi wesîla çayvexwarinê hem we'z û nesîhet li xorta kir hem jî tecrûbeyên xwe bi wan re parvekir. Lewra xort nûciwan bûn. Ji ber ku xwîna wan di kelijî car caran hem di usûla de'wetê de hem jî di kar û barên din de mîmkûn bû xeletî bikin. Ji bo têkuzkirina xeletî wî kemilandin û gihaştina xorta kêmasîya herî mezin we'z û nesîhetên mezinan bû. Wî di warê dagirtina vê kêmasîyê de ev wezîfa xwe bikar anî. Hem we'z û nesîhet li xorta kir hem jî tecrûbeyên xwe bi wan re parvekir.

Îdî wext gelek derbas bûbû. Lazimbû ku herkes li mala xwe vegere. Xatir û 'helalkirin ji xorta xwest û berê xwe da mala xwe. Riya mala wî di nav kolanên bajarê Sûra Qedîm ve derbas dibû. Ji lew ew jî ket nav kolanên Sûrê û ber bi mal ve çû. Li derî da ket hundir.

Wext dereng bû. Ji bo ku ji xêra nimêja şevê me'hrûm nemîn e demjimêra xwe li gorî wexta nimêja şevê 'eyar kir û raza. Gelo ji tesîra wêne bû yan na ev ne malûm bû lê xewnên wî yên vê şevê ji bîranînen wî dagirtî bûn.

Di xewna xwe de geh bi kale Şêx Se'îd re derdiket meydana cengê, geh silavek li 'Huseynê Welî dikir, geh diçû ji çiyayên Qerejda'xê berf dianî tevî dimis dikir û bi xorta re dixwar. Çiya bi gul û kulîlka xemilandî bû. Ji deşta Amîdê gulên sorên cûrbecûr serî hildidan. **Carna jî di kolanên Sûrê de sergovendî dikir:**

Lo mîro em 'Huseynî ne lo mîro bi lo lo mîro  
Em torînê Şêr 'Elî ne lo mîro bi mîr wezîro  
Lo mîro em 'Hesenî ne lo mîro bi lo lo mîro  
Em torînê Şêr 'Elî ne lo mîro bi mîr wezîro  
Mîro me li Kurdistanê lo mîro bi lo lo mîro  
Hilda ala îmanê lo mîro bi mîr wezîro

**Re'hle:** Textikek nivvekirîye ku Qur'an an jî kitêbên di li ser tînan xwendin.  
**Kelamê Qedîm:** Qur'an.  
**Demjimêr:** Sa'et  
**Bîranîn:** Xatira  
**Sêdar:** Dara 'îdamê  
**Dadgeh:** Me'hkeme.

Wek 'Emmar û Bîlala lo mîro bi lo lo mîro  
Serhilda ye bi Qur'anê lo mîro bi mîr wezîro  
Hew tedî bi zingîn demjimêrê lêda. Ji xewa şîrîn veciniqî ku wayê dibê: **"Lo mîro em 'Huseynî ne."** Demjimêra wî ya ku ji bo nimêja şevê dagirtîbû ew ji xewê şiyar kir. Rabû ji bo edakirina nimêja şevê û xwendina Kelamê Qedîm destnimêj girt. Nimêja xwe ya şevê eda kir. Re'hleya xwe danî xwarê Qur 'ana xwe vekir da ku bi tertîl bixwîne. Lê mîratê derî fûrset nedayê.

Bû reppîna derî. **Qaşo welatparêz** hatibûn ber derî û nedihîştin kes derê xwe bigre. Van serserîyên welatparêz? Jîn li wan herimandin. Herroj û daxwazek. Rojkî digotin derî megrin, rojkî diwarê xaniyan qul dikirin, rojkî tunel di binê xaniya de vedikirin, rojkî xendek dikolan, rojkî keç û qîzên xelkê bi zor ji bo çalakîyan derdixistin kolan, rojkî digotin 'heta ku Kurdistan azad nebe nimêj qedexe ye. Rojkî malê xelkê dişewitandin roja di jî 'ereba wan... Ew diçûn neyarên sed sala bi nijadperestî dadiketin kolan. Îca dora wan bû. Bi panzêra, bi tanqa dihatin kuçe û kolan xera dikirin. Bajarê qedîm, merkeza şaristanî û medenîyeta qedîm wêran dikirin.

Herdû alîya jî dixwest ku alîkarîya wan bike lê dilê wî li ser yekî jî rûnedinişt. Li alîkî panzêra dor li me'helê girtîbû li alîyê di welatparêzên(!) nenas sûk û bajar ji mayîn û bomba dagirtîbûn. Îdî jîn li vir herimî bû. Li şîreta pêxemberê xwe guhdarî kir û biryara hîcretê da.

Rabû Qur'na xwe pêça xiste kirasê wê û **bi ustuyê xwe de daleqand.** Lewra ev Qur'an li her derî ji bo wî wek ava 'heyatê bû. Jîn bê wê nedibû. Cil û bergên xwe yên zerûrî jî xiste bawulekî û berê xwe da 'xurbetê. Lê dilê wî rî'het nebû ji xwe wêne û bîranînen wî jî li paş mabûn lê bi serda jî welatê wî tarumar bûbû. Geh diçû, geh li paş xwe vedigerî û meze dikir. Hêstirên çavê wî wek baranê dibarîn. Hem digrî, hem digot:

-Sebebno! We mala me xera kir Xwedê mala we li dinya w axretê xera ke. We derîyê me mor kir Xwedê derîyê we li dinya w axretê mor ke. Sebebno, sebebno, sebebno!

**Pejirandin:** Hilbijartin, qebûlkirin  
**Destnimêj:** Desmêj, abdest  
**Xwendina bi tertîl:** Bi tefekkur xwendina Qur'anê ya li gorî qaîdeyên tecwidê  
**Çalaki:** Bi Tirkî yuruyuş.  
**Qedexe:** Yasax

# Gotinên Pêşîyan

- ❖ *Bira meriv kuştîyê şêra be, ne girtîyê rovîya be*
- ❖ *Yê ku tirba hevalê xwe bikole, wê bixwe têkevê*
- ❖ *Xêr tê bi rêz tê, şer tê bi ‘hembêz tê*
- ❖ *Şuşa dil ku şikest, nacebire*
- ❖ *Di tengîya de jî derîyê nemerdan nekute*
- ❖ *Xal xwarzîya radike, ap birazîya dadike.*
- ❖ *Xalê meriv, ceddê meriv e*
- ❖ *Zilamê pîs, tim fena wî li yê baş e*
- ❖ *Yê kû jinê berde, li p’anîyê nanêre*
- ❖ *Xwedîyê lezê her poşman e*
- ❖ *Tu çi bikî ewê bê pêşîya te*
- ❖ *Yê kû ji jina xwe netirse, ne tû mêr e*
- ❖ *Xeysetê pîs xezeba Xwedê ye*
- ❖ *Zanebûna meriv, gelek cara serê meriv diêşîne*
- ❖ *Yê bi ‘ar ji xwe fedî kir, yê bê ar got: “J imin ditirse”*
- ❖ *Xwedê dûr dike lê kûr dike*
- ❖ *Te (ku) derbek danî û yeka mezintir hilañî, te tu kar neanî*
- ❖ *Tasa vala çingîn jê tê*
- ❖ *Bî xelkê nekene, bira neyê pêşîya te*
- ❖ *Xerabîya kû xêr li pey nîne tune ye*
- ❖ *Xwarin hûr hûr, xeberdan kûr kûr...*
- ❖ *Timayî birakuj e*
- ❖ *Timayî dike kêmayî*
- ❖ *Bi dilê kala qîza bînin, bî dilê xorta hespa...*





# DAYÊ

✍ Mela Mîzgîn

Xudayê Heq bibarîne  
Li te tim rehmêtê Dayê!  
Bi Lûfta xwe bigêfrîne  
**Te bêxe Cennetê Dayê!**

Tevên Pêxember û qencan  
Ji te re bêxe Mehdervan  
Nebînî îdî qet derdan  
**Di warê axretê Dayê!**

Te jî barkir ji vê dunyê  
Ji warê te'de û nefyê  
Ti çuyî menzela heqyê  
**Diyarê wesletê Daye!**

Liser çûn û wefata te  
Dilê min jar û berbata  
Nizanim kengê tîm bate  
**Jiwarê firqetê Dayê!**

Te ez hiştim yetîm û jar  
Di zindana de bê pirsyar  
ji dûayên te mam bê par  
**Di warê ğurbetê Dayê!**

Te ez hiştim di nav jana  
Di pişt heft deryê zîndana  
Ezê çawa bikim ana  
**Di nav vê hesretê Daye!**

Di ber de'wa Xwedayê Heq  
Selaha dîn û war û xelq  
Te pir dît te'de û teqreq  
**Nimûna ğîretê Daye!**

Di Cîhad û tekoşîna  
Li ber murtedd û xayîna  
Te Xwe da alê mumîna  
**Bi sed sêdaqetê Dayê!**

Bi sed hawî fedakarî  
Tekir te dît gelek jarî  
Diber HÎZBA XWEDA Barî  
**Bi sebr û muhbetê Daye!**

Te ûmrê xwe di hicrana  
Riya mehkem û zindana  
Li ber deryê hepîsxana  
**Qedand bi ezyetê Dayê!**

Bi exlaq wek melek bûyî  
Bi 'eql û fêh û derk bûyî  
Bi her hawê xwe pak bûyî  
**Numûna fitretê Dayê!**

Ji mere wek sitûn bûyî  
Dilovan û henûn bûyî  
Gelek nerm û zenûn bûyî  
**Numûna şefqetê Dayê!**

Bi şerm û dilşewata xwe  
Bi sebr û hem sebata xwe  
Bi her hawê heyata xwe  
**Numûna ûswetê Dayê!**

Di piştî te de dilzîzim  
Ji vê dunyayê bê bîzîm  
Dema navê te dibhîzîm  
**Ji çavan şape tê Dayê!**

Di pêy te dil birîndarim  
Yetîm û sêwîyû jarim  
Ĝerîbim bê ciyû warim  
**Nema Sebra min tê Dayê!**

Hezînim ez bişînim ez  
Li ser çûna te dînim ez  
Ji nav û dil birînim ez  
**'Ezîza ûmmetê Dayê!**

Ne ez tenê yetîm mamah  
Gelek dilzarê HÎZBULLAH  
Dikin li ser te ah û wah  
**Numûna şefqetê Dayê!**

Xwedayê Xalîqê Rehman  
Bi barîne weke baran  
Li ser te rehmêtê her an  
**Di qebr û Cennetê Dayê!**



# MIZGEFT NAMUSA BAWERMENDANE

✍️ Îbrahîm Êlihî



Bî navê Xweda ê Mihriban u Dilovan

“Ma ji kesê ku di be mani’ê zikirkirina navê Xweda di mizgefta de u ji bu xerakirina mizgefta dişuxile zordartir/zalimtir ti kesê di heye? Ha ew encex bi tirs (divê) biketina mizgeftan. Li dinyê ji wan re rezilî u li axîretê jî ‘ezabekî mezin heye.”(1)

Mizgeft, em bawermend her çiqasî zêde qedrê wê nizanbin jî lêbelê kafir u murted u Xwedênenas girîngî u cîgirtina wê baş dizanin. Birastî nayarên Îslamê dizanin ku di rastî de mizgeft, ne hema bi tenê cîyê limêj lê tê kirine. Ne cîyekî ku hema piştî ku limêj lê hate kirin weka dikaneke bê girtin u qiflê li deriyê wê tê lêdane. Heke ku bi tenê wisa buna, bawerbikin ewê vê neyartîya dijwar pê re nekirina. Dizanin ku mizgeft, cîyê limêjê ye jî, cîyê perwerdehiyê jî, cîyê ku misilman li dora hev dicivin ji derdên hev re dibine çare, li halê hev dipirsin, kêmasiyên di nezanîya dinê xwe de u kêmasiyên hevî maddî diqedînin, cîyê ku ji hev re dibine pişte, cîyê qewîkirina biratîya Îslamî, cîyê

‘evdîtîya bi tenê ji Xweda re, cîyê bi biranîna Xweda, cîyê xwedî derketina li şî’aren Îslamî, cîyê li hember derketina temamê îdeolojîyên dijî şerî’eta Xweda, serî hildana li hember temamê neyarên Xweda ye.

Di ayeta Qurana Pîroz de jî Xweda tişteki bêguman ferman kiriye. Kî bibe asteng ji bu ku di malên Xweda de navê Xweda nê hildan, ên ku wan bişewitînin u xerabikin, ên ku bibin asteng ji bu ku îbadet di mizgefta de neyê kirin ji van însana hê zordartir ti kesê di tineye li ser ruyê ‘erde. Lewra xerakirin u şewitandin u mani’buna çuna mala Xweda di be sedem ji bu na ku Xweda bê ji bîr kirin, hurmet u rumeta dîn u Îslam u şerî’ etê diavêjin nava dest u linga. Ev jî zilma herî mezine u ‘ezabê wê jî Xweda dibê ewê ‘ezabekî mezin bibe para wan.

Kafir u murted va tiştta teva dizanin. Lê mixabin em misilman vî qedr u qîymet u **pîrozbahiya mizgefta ka em çiqasî dizanin**. Pêwîst bu gava ku kafir u murted ji bu xerakirina mizgefta nêzî mizgefta bi-



buna ji tirsisa misilmana bibuna zinge zinga wan, dilê wan bikirana ji cîyê xwe bifire, ziravên wa biqetiyana. Zanibuna ku ev cîyên pîrozbaha ne cî nê wisa ji rêzêne, ne cînê bêxwedîne. Heke ku em zirarekê bidine mizgeft u mala Xwedê misilman me bigirin ewê me ji hev biçîrînin, me perçe perçe bikin. Gava ku kafir u murted di ber mizgeftên me de biçuna, dev ji dana zirarê berdin pêwîst bu ku newêribuna di bin çawa de jî, bi nîyeteka xerap li mizgeftên me birihêntana. Lê mixabin yek bi yek mizgeftên me dişewitînin. Deng jî ji me dernayê.

Avakirin u parêztina mizgefta, nîşan u 'elemetek ji 'elametên îmanê ye. Xerakirin u şewitandina mizgefta ji halê kafira ê herî pîs u rezîle. Avakirina mizgefta çawa ku herî dereca bilindî a îmanê ye, 'eynî wisa xerakirin u şewitandina mizgefta ji herî dereca a binî a kêma fasik u faciraye. Lewra cî u mekan u zeman bi zikirkirina Xweda qerdu u qîymet distînin. Mizgeft cîyê zikr u îbadetêye. Gava meriv diçe mizgefta ji xeynî Xweda ti tiştê dî nayê bîra meriv. Însan çiqasî xafil di be bila bibe gava ku diçe mizgeftê Xweda di bîra wî de tê. Ma neyarên Xweda dixwazin ku XWEDA di bîra însan de bê.

Pkk, pêşî bi navê azadîyê dest avête haya u namusa pîrekên Kurda. Bi wa da gotin ku ne namusa ti kesîne. Bi wan dane gotin ku namus kabuse. Bi xortên Kurda diruşmên wisa dane avêtin ku ji roja dinya avabuye heta îro ti qewmî, gelî bi vî hawî bi navê bênamusîyê xwe eşkerê nekiribun. Ev gotin u diruşme nebesbun rabun parêztina bênamusîyê xistin pêşîya parêztina Kurd u Kurdîstanê. (Çiqasî em dizanin ku Kurd u Kurdîstan ji wan re ne derde jî.) Eyb u şerm nekirin rabun gotin, parêztina bênamusîyê gomlekekî ji agir bu me jî wî gomlekî li xwe kir. Vê 'ecêba ku dijmin bi serê dijmina de nayîne bi serê vî gelî de anîn, lê dîsa jî gelê Kurd şiyar nebu. Ji bu ku ti şiyarbibî ma gelo pêwîste ka hê çî bikin?!!

Ev tev nebes bu rabun bi sîyaseta hendeqa vî çile u zivistana ha vî gelê mezlum perîşan u şerpeze kirin vî çilê ha. Gelê Kurd piştî ku ev çend sale piçikekî ketibu rihetîya ha ji wan re pir ditin. Dîsa boxçikên wan dane ser milên wan u wan terkî welat kirin, wan bi rîya

xistin. Wan dîsa mihacir kirin, bi navê "xweserîtî"yê. Lê belê xweserîtî bu xwelî li serîtî. Xwelî li serê vî sîyaseta u xweserîtîya we be. Ma ev çî xweserîtîye ku gelê Kurd revî revî ji ber we direvin. Ji ber van kantonê we direvin. **Ji rojava bi hezara Kurd ji ber we direvin**, ne ji ber ti kesê dî. Vaye li Kurdîstana Bakur jî win bi navê vî sîyaseta xweyî genî neyartîyê bi malên Xweda re dikin. Li kurê mizgeftek hebe diçin koncalên xwe li dora wê mizgeftê dikolin ji bu ku misilman bi rihetî nikaribin herin wan mizgefta an jî jî tirsisa canê xwe neçin wir.

Mixabin ew her çiqasî bêjin jî dîsa gelê meyî Kurd li ber van gotinê wan gohên xwe digirin, li ber kirinê wan çavê xwe digirin: Pkk, ji roja ku derketîye bawerî u îdeolojîya wan- li ser neyartîya Îslam u şerî'etê derketine, îdeolojîya xwe li ser vî avakirine. Di be ku heta do bi teorîyên xwe vîya dianîn ziman lê îro bi pratîka xwe li her derê Kurdîstanê vîya dikin. Heji em şiyar nabin.

Pêwîst e îdî di pey hevqas neyartîya wa yî bi dînê me re em jî şiyar bibin, çavên xwe vekin, gohên xwe vekin, ji xewa xefletê şiyar bibin. Emê heta kingê vî neyartîya pkk ê yî li hember gelê Kurd nebînin. Wê hogirî u dostanîya ku ji kemalîstên tirka re didine nîsandan ji sedî yek ji wê ewe kingê nîşanî gelê xwe bidin. Kemalîstên tirk anîn li ser piştî Kurda xistin meclîsê, emê kingê şiyarbibin. Hevqas heqaret li dînê me, li namusa me, li şerî'eta me dikin, neyartîyê bi pîrozbahîyên me re dikin ma emê kingê şiyar bibin. Ma vî gelê mezlum heta îro çî zirar daye vî rêxistina ku ti kes nizane bê hevsarên wa di destê kî de ye. Heta îro ji tirsisa xwe vî gelê mezlum çî xwestina u ne dane wan. Namusa wan ji wan xwest, dan. Îman u bawerîya wan ji wan xwest, dan. Te canê wa ji wan xwest, dan. Te malê wan ji wan xwest, dan. Te şeref u rumeta wan ji wan xwest, dan. Hê ti li pey çî yî. Ev ti çîye buyî weka hutekî heft serî tîr nabî.

Te namus avête bin linga, deng ji ti kesî derneket. Te mizgeftên wa şewitand kesî deng nekir. Hetakingê ev bê dengîya we wê bidome? Êdî ne bese.


Heta ku mizgeftên me bişewitin pêwîste ku xweşî jî me re tinebe, tebata me nê...

Bi hêvîya şiyarbuna li hember van neyarên dîn u îman u mizgeftan we dispêrim Xweda ê mezin.

**Mihriban:** Merhametli  
**Dilovan:** Şefkatli, Rehîm

**Bawermend:** Înanan  
**Pêwîst:** Lazim, gerekli

**Dirûşim:** Yüz, çehere



# Kê û çi jibîrkirin?

## ZIMAN Û JÛYAN-2

✍ Şerîf Emîn

Wê çaxê, jibîrkirin! Kê û çi jibîrkirin?

Li gorî ewrûpa Ewropa; gellê cahil, nezan, tazî u birçî, bindest û belengaz yanî kesê dervayê dewr û dunyayê (?) gelek tiştên xwe yên xas, yên bav u kalan, yên hezar salan jibîrkirin. Ewwil ziman jibîrkirin. Paşê din û diyaneta xwe jibîrkirin, 'esl û neslê xwe jibîrkirin. Ji dê û bavên xweyên belengaz şermkirin, revîn û dûr ketin. Paşê jî di nav fuhşiyat û îsrafa 'esrî de winda bûn, xeniqîn. Ji Ewropa, yanî ji cihana medeniyeta bê mîm alikarî û 'îlaç girtin ji bo tenduristî û saxiyê. Wê demê jîyan bû jar. Derd û belayê ku tu car nedizani li wan peyda bûn. Nexweşînen wek AIDS, Sars, Ebola, K.Kongo û...hwd silav li wan kirin. Hasilê kelam; projeya bo dermana derdê mezlûman bû sedema qelandin û qutkirina nesla wan. Piştî hevnasîya koledarên 'xerbî nexweşînen cûrbecûrê bê derman ji ser wan ranebûn.

Mezlûma sermaye maddî û manewîya ab û ecdad a hezar salî jibîrkirin lê belê tiştê hebû ku dê tu car jibîrnekirin. Zehr û jara 'xerba medenî(!) felaketa maddî û manewî ji wan re yadigar hişt.

Birîn kûr e bêderman e

Megrî megrî dayê megrî

Ev çi 'hale em tê de ne

Megrî megrî dayê megrî

Em ji ziman û 'en'neyên xwe yên jibîrkiriyê hezar salî ji hayîdar bûn me ev talan ji jibîrkirinê wêdetir zanî. Em şiyar bun lê belê heyhat û sed heyhat! Îdî mala gelê dunyayê şewitibû. Gelên dunyayê bi şev û roj di bajar û mertopol û palûkeyên koledaran de wek koleyên resmî dixebitîn.

Demê ku mamosteyên Emrîqa hatin ser kursiya antropolojî û sosyolojî ya Zanîngeha Îslambolê xebatên kûr u tarî li ser gelê me jî kirin. Ew temamî casûs bun. Master u Doktora yên ku didan şagirda lêkolînen wan tev li ser zimanê herêmî, lehçe, mezheb û terîqetê me bûn. Ev lêkolîn di sala 1960î de hatin kirin. 1968a de hinek birayên me yê muhafezakar di 'eleyhê van casûsan de yûha û numayîş kirin. **Mamosteyê casûs revîn** û çûn lê belê em dizanin piştî wan casûsan bûyerên Çorum, Maraş, El'ezîzê qewimîn.

Herçî welatên ku mîsyonerên xaç û senem çûnê tim fitne û fesadiya şedîd li wir qewimîn. Mîsyoneran wek îxtîlafên qewmî (nîjadî), mezhebî û terîqî tovê fitne û fesadê reşandin. Bi van xebatên xwe yê nebaş aşîti û aramî ji nav gela rakirin.

Emperyalîzma gîrbê bi dagirkirin û vegirtina welatan ewwil zimanê gel înfaz kirin. Temamên 'alim û lêkolînerên cîhanê dibêjin: Jîyana gelan bi ziman qaîme! Mîmarîya li ser gel û zimanan, liser 'en'ene û toreên milletan li gor Qanûna Navnetewî gûneh û suçê însanî ye!

Li Afrîqa, Asya û Emrîka bo 'hakimiyeta zimanê îngiliz û Fransewî bi hezaran ziman hatin qirkirin û ji hole rabûn. Cîyê ku bi destê zorê zefî kirin ewwil qewm û zimanê wan dera, zimanê 'eslî û niştecih (yerli) wek qewm û zimanê şundamayî, 'xeyrî medenî dan naskirin. Bi navê pêşveçuyîne medeniyeta xwe, bo xizmeta maldarîya xwe ziman û sen'etên xwe yên derewîn bi gelê bindest dan 'eliman-din. Bi vî hawî qîmeta gelan a xwemalî çû, tiştên bêqîmet hate şûn. Yanî gel ji 'eslî xwe bi dûr ketin ne wek xwe man ne jî bûn wek koledaran. Bûn wek teyrek baskjêkirî ne difirîn ne jî dikaribûn bi rê ve biçin.

Ziman hebûn e. Zimanê gel tune nebe gel jî tunne nabe. Mesela jîyana Efğan u Filistin a li hember zaliman bi saya îmana wan e lê belê para ziman jî tê de heye. Îman, bi ziman qaîm dibe. Xelqkirina gelan û zimanê gelan ayetek ji ayetên Xudê Te'ala ye. Redd û înkara van herdû heqîqetan înkara ayetên Xuda ye. Xwedê Te'ala di Qur'ana Hekîm de dibêje; "Min we şu'be bi şu'be, qewm bi qewm xuliqand da ku hûn hev binasin" Tiştên ku ji bo hev naskirinê hatiye xuliqandin lazime neyê înakrkirin û di bin tometê de şermazar nemîne. Ev tiştên normal û fitrî ne. Nuha di nav Ummeta Îslamê de li ser van tiştan gelek 'illet û nexweşînen 'esrî peyda bûne. Ev, ji bo ummetê 'eyb e, şerm e, rûreşî ye. Ne mîmkûne ku aşîti û aramîya Musulmanan li ser tirsê ji qewm û zimanan bê avakirin.

Biratîya Kurd û Tirka hezar salî li ser dîne Mûbîn û heqîqetê domîya. Herêma Kurdan ji dewra dîroka qedîm, û 'heta dewra Cumhuriyeta Kemalîzmê wek Kurdîstan hatî-



ye zanîn û tu pirsgirekek mezin di nav wan de neqewimî-ye. A'xa, beg, mîr, gundî û bajarîyan qîz dane hev û ji hev qîz sitendine. Biratî û hevaltî kirine. Ji şerq û xerbê bigre 'heta Çeneqqe li dij neyarên xwe bi hev re mil bi mil şer kirine. Îro jî di nav Musulmana da pirsgirekek giran tune.

Her tişt li ber çava ye. Dûrketina ji dîn û îman, neyartiya dîn, înkarkirina millet û zimanê wan di nav Kurd û Tirka de fesadî derxist, gel îfsad bû. 'Hakîmîyeta dewleta Kemalîst ne li ser heqîqetê li ser te'hakkumê hat avakirin. Çi nexweşîyên Avrupa û Xerbê hebûn bi saya kemalîsta hat serê Musulmanan. Qomonîzm, faşîzm, qapîtalîzm, femînîzm û...hwd. Temamê "îzma" weledê Xerbê yê 'xeyrî-meşrû bûn û bûn bela serê musulmana.

Qedîrşinasîya ziman û qewmîyete ne'esabîyete û faşîzme. Armanca însan eger naskirin û 'heskirina eqreba û insanen wî be ev neteweperverî ne faşîzme. Xuda Te'ala wiha gotîye: "Cihêbûna reng û zimanê we ji ayete mine" (Rum:22).

#### **Tesîra Farisî û 'Erebî a li ser zimanên gelê musulman:**

Zimanê îngilîzî û Fransewî li 'xerbê çî be, zimanê 'Erebî û Farisî bo welatê şerqê ew e. Jîyan û yekîtiya temamê gelê Musulmanan di dîrokê de li ser van zimanan qaîm bûye. Wek Mewlana, Fuzûlî, Baqî, Cezerî, û... hwd temamên şêx û melayê me Kurda jî gelek nesr û nezm û dîwanê xwe bi zimanê Farisî û 'Erebî gotine û nivîsandine. Edebiyatvanên me ji bikaranîna Farisî û 'Erebî tucar fedî nekirine, bil'ekîs mexrûr bûne.

Emperyalîzma 'xerbî û sîyonîstê Îsrail; jî bo ku yekîtiya ummetê çê nebe zimanê 'Erebî û Farisî bi ummetê dane jibîrkirin. Ev şuxla 'xerbîyan her daîm berdewam e. Ew; li ser zimanê me Musulmanan bi awayek sistematîk dixebitin o tesîra wan zêde heye. Li ser zimanê qewmên şerqî tesîra zimanê 'xerbîyan tucarî tiştêk û xweristî nîne. Ji zimanê Îngilîz an jî zimanên biyanî yê din girtina hinek gotin û mezmûnên 'ilmî pekâlâ caiz e. Lê belê di her 'halî de girtina kelîma çand û edebiyata me teslîmê ecnebiyan dike. Gelê me dibe bi bal 'xerbperestîyê ve.

Zimanê Ewropa jî me re, jî gelê me re, jî çand û edebiyata me re, jî dîn û dîyaneta me re muxalîf e. Girî, ken û kêfa me, 'henek û lîstika me, dostî û neyartîya me tu car li ya 'xerbê neçûye. Îdraka me a di derheqê namûs û fedîkirinê ziddî

a'xerbê ye. Ji lew em bi hêsanî dikarin bibêjin: 'Heskirin û naskirina 'edet û şuxl û zimanê 'xerbî bê-pîvan û qontrol nabe. Di ware 'ilmî de teqlîda 'xerbê caiz e lê di ware îrfan û ziman û 'edetê de caiz nîne. Ev teqlîd dibe sedema bindestîya me.

Biratîya milletên Musulmanên Rojhilata Navîn hezar sal e ku domdar e. Berya Islamîyete jî eleqa wan milletan bi hev re hebû. Ji lew caize ku zimanê Farisî, 'Erebî, Tirkî û Kurdî hev teqlîd bikin. Zimanê Tirkî jî wek zimanê Farisî û 'Erebî birayê zimanê Kurdî ye. Biratîya Tirk û Kurdan xelasiya ummetê ye û ferz e. Lê dibê ev biratî zînhar li ser 'edaletê be.

Ustad Bediuzzeman bo Kurd û Kurdistanê di Rîsale ê Nûr de be'hsa zimanê zarûrî, lazim û caiz kirîye. Hetta di welatê Kurdistanê da inşakirina Medresetuz-Zehra wek Ezhera Misrê jî Sultan 'Ebdulhemît xwestîye. Ustad dermanê terorîzma îroyîn ta wê demê nişan daye. Pir şerm û heyfe ku cewaba dewletê wek tîmarxane, sirgûn û zîndanê li Ustad vegeerî.

Îro jî heqîqet aşîkar e. Înkarkirina ziman, îman, tore, millet û mezheban bûye sebebê **jihvekêtin û bihevketina ummetê**. Bûye sebebê neyartî, komkujî û koçberîyê. Gelên musulman jî ber vê înkare îro li gaz û deşt û çîya û be'hran di xeniqin. Bav û kalên me gotîne; Gul û kulîlk, di gulîyên xwe de rind in. Bi destê zorê rindî nabe. Her teyr bi refê xwe re difire. Îş û kare dunyayê 'ecele nîne hêdî hêdî dibe. Gotin ev e: *Çûna bi lez hespa bi bez, mêrê ku radibe rudine bibêje îlla ez, îdî 'eyb û şerm e. Îlla ez nabe. Ferz e ku em bêjin îlla em.*

Jibîrkirina ziman 'xeflet e, şermkirin û rûreşî cehalet e. Înkarkirina ziman faşîzme, melûlbûna îmanê ye. Jibîrkirina ziman mirina millet e. Avakirina ziman be'su be'del mewta millet e. Ne lazim e ku biratîya yekrengî be. Pirrengî û pirdengî jî bo biratîya Îslamê dewlemendî ye.

Xapandina bi dinê mûbîn, tirsandina bi kotek û qanûnan çare nîne. Ev metatod hat ceribandin û wek terorîzme û wehşetê li musulmana vegeerî. Niha erda musulmanan jî ber vî metodî gola xwînê ye. Di 'heyata sosyal û sîyasî de xizmeta jî gelan re bi zimanê wan mimkûn e. Rastî w mêranî û camêrî her ev e. 'Xeyrî vê her tişt virr e, derew e wes-selam.

Digel silav û du'ayên derûnî bimînin di xêr û xweşîyê de.

**Koledar:** Kole ticareti yapan  
**Zanîngeh:** Üniversite  
**Şagird:** Şakirt, emirkulu  
**Lêkolîn:** araştırma  
**yûha**

**Aramî:** Istikrar  
**Lêkolîner:** Araştırmacı  
**Şermezar:** Mahcup  
**Tomet:** Töhmət  
**Qedîrşinasî:** Kadirşinaslık, değerbilirlilik

**Neteweperverî:** Milletperverlik  
**Biyani:** Yabancı  
**Xweristî:** Tabii, doğallık  
**Mezmûn:** Mana

# Çîroka Şahê Teyran û Qijikê

✍ Kamûran Tûrgay



Havîne hemî çûk jiber germê diçin zozanan. Havînekê Şahê Teyran gazî 'hemî çûkan dike û tev li hev kom dibin. Şahê Teyran ji wan re dibê: "Gelî heval û hogiran, divê em herin zozanan ka hûn dibên çî?"

Hemî teyr vê pêşniyarê dipejirînin. Jiber ku bilbil ji gul û bağan hez dikir, zozan xweş nas dikirin. Her cara ku şah biçûya zozana, jibo hîn bibe kîjan aliyê zozana xweş e, di pêşiya xwe de bilbil dişand. Jiber vê yekê Şahê Teyran ew kiribû şewirmend û aqilmendê xwe. Vê salê jî wusa bû, Şahê Teyran gazî bilbil kir û jê re wusa got: "Zû here li zozanan binêre, ka kîjan zozan delal e. Jibo xerabiyek neyê serê te hevalekî jî bi xwe re bibe. Zû herin û vegezin."

Bilbil û hevalê xwe bi hev re firiyên û çûn zozanan. Li zozanan geriyên, hemî derê zozanan dîtî. Lê li tu derî leqayî şivan û nêçirvanan nehatin. Bilbil û hevalê xwe şaş man. Hevalê wî jê pirsî: "Min tu carî zozan wek îsal xweş nedîtîye. Ne şivanek heye ne jî gavanek. Lê ez gûman dikim tiştê di vî karî de heye." "Rast e. Dibêjin mîrê zozana nexweş ketiye. Çiqas 'hekîm û doxtor anîne, tu çareyek jê re nedîtîne. Di dawiyê de hekîmek dibêje "Ya Mîr! Li dinyayê dermanekî tenê ji te re heye, ew jî goştê şahê teyran e. Ji ber vê yekê Mîr ferman kiriye ku tu mirov nekevin nav zozanan. Li her derê kelaxên ajalan datînin, mirovên tîrvan jî datîne ber û li benda şahê teyran disekin. Bilbil û hevalê xwe di cih de vedgerin. Tê gundê şahê teyran."

Şah ji bilbil dipirse: "Ka bêje, em îsal herin kîjan zozanî?"

Bilbil: "Şahê min, em îsal neçin zozanan." Şah: "Çima?"

Bilbil: "Şahê min, îsal zozan nexweş in. Ji ber vê yekê em îsal li deştê bimînin wê çêtir be."

Piştî çend rojan, Qijik tê ba şah û jê dipirse: "Ya Şah! Emê kengî herin zozanan?"

Şah: "Emê îsal neçin. Bilbil got îsal zozan nexweş in. Ji ber

vê emê neçin."

Qijik: "Ya Şah! Bilbil derewan dike. Ger tu destûra min bidî ezê herim li zozanan binêrim."

Şah: "Bilbil qet derewan nake. Lê tu dixwazî here lê binêre."

Qijik difire, diçe zozana ku bilbil tê de geriyabû. Qijik zozanan gellek xweş dibîne. Ne şivanek ne jî gavanek heye. Qijik vedigere deştê, ji şah re wusa dibêje: "Ya Şahê min, ma min ji te re negotibû bilbil derewan dike. Min tu salan wek vê salê zozan xweş nedîtîbûn. Ne gavanek ne jî şivanek heye."

Piştî gotina qijikê şah, bilbil ji şewirmendiya xwe davêje û qijikê dike şewirmendê xwe! Şah û hemû çûk difirin, diçin zozanan. Li zozanan belav dibin û ji xwe re diçêrin. Piştî ger û çêreke demdirêj Şah leqayî berateyekî tê. Dema ku nêzîkahiyê lê dike zilamê mîr hema carekê re xwe davêje Şahê Teyran û wî diqefilîne. Şahê Teyran ji zilamê mîr re dibêje: "Heyran ez Şahê Teyran im. Min berde!"

Zilamê Mîr: "Na, ez te bernadim. Jixwe ev dek û dolab hemî ji bo girtina te bûn. Mîrê me nexweş e û dermanê wî jî xwarina te ye."

Şahê Teyran nû fam dike bê çima bilbil gotibû îsal zozan nexweş e. Şahê Teyran dibîne ku gotin fêde nak, dibêje: "Temam heyran. Lê daxwazeke min ji we heye, piştî ku we ji min xwarin çêkir hûn nikilê min bixin nava pîsiyê." Zilam: "Çima?" Şahê Teyran: "Kî hevalê qijika be, wê pozê wî ji nav pîsiyê dernekeve!"

Di her çîrokekê de payek heye di vê çîrokekê de jî pay ev e ku meriv ji xwe re kesên zana bike rêber û rawêjkar! Ne ê nezan! Her şolekî rêzanekî wî, rawêjcarekî wî heye. Kesê û gelê ku rêberên wan, serokên wan nezan bin, bêaqil bin serê wan ji belayan, ji mûsîbetan û ji pîsîtiyan dernakeve!

Emaneti Xwedayê Teala bin.

**Pêşniyar:** Teklif

**Şewirmend:** Danîşman

**Pejirandin:** Tanîmak, kabul etmek

**Aqilmend:** Akil, akıllı

**Gûman:** Zan, şüphe

**Kelax:** Leş

**Ajal:** Hayvan

**Rawêjkar:** Danîşman, müsteşar



# ÇIMA DU'Ê ME NAYÊ QEBÛLKIRIN?

✍ Mela Fesîh MEMÎŞ

Rebbê me û rebbê kaînatê Ellah ('Ezîmuşşan) em ji tunebûnê xuliqandine û jibo ku em wî nas bikin ji me re pexember û kîtab şandine. Sedema şandina kîtab û pexemberan ewe ku insan ji nav tarîti û zulûmata cahilîyê û şirkê xelas bibin, bal bi nûr û ronahiya imanê ve biçin... Û jibo ku ji 'ebdîtîya 'ebda xelas bibin, bibin 'ebdên Xweda. Xwedayê Te'ala bi wasita van pexember û kîtaban ji me re emr û ferman kiriye ku ji wî pêve em ji tu kesî re 'ebdîtî nekin û ji wî pêve gaziya xwe navêjin tu kesî. Em alîkarîye ji wî pêve ji tu kesî nexwazin. Rojê pênc wexta di limêja xwe de em dibejin

إِيَّاكَ نَعْبُدُ وَإِيَّاكَ نَسْتَعِينُ

**"Ya rebbî em hew ji te re 'ebdîtîyê dîkin û hew ji te alîkarîye dixwazin."** Xwedayê Teâlâ di Qur'ana Kerîm de wiha ferman kiriye:

وَإِذَا سَأَلَكَ عِبَادِي عَنِّي فَإِنِّي قَرِيبٌ أُجِيبُ دَعْوَةَ الدَّاعِ إِذَا دَعَانِ فَلْيَسْتَجِيبُوا لِي وَلْيُؤْمِنُوا بِي لَعَلَّهُمْ يَرْشُدُونَ

**"Ey hebîbê min! Ku 'îbadê min sûala min ji te kirin; ji wan re bêje: Ez pir nêz im, ez du'aya du'akara qebûl dikim, dema ku ji min re du'a bikin yanî ji min bixwazin. Îdî bira ew bersiva min bidin û bi min îman û bawerîyê binin. Hêvî heye ku rêya rast bibinin."** Ji vê ayetê tê fêmkirin şertê qebûlkirina du'ayên me; bi îman û bawerîya me ve girêdayî ye. Resûlê Xweda di hedîsa şerîf de dibêje: **"Du'a silaha mu'mîna ye."** Îro bi milyonan mu'mîn di camîya de, li ser Çiyayê 'Erefê li wî cihê ku du'a têne qebulkirin, hêsirên çêva dirjînin û jibo ummeta Îslamê du'a dîkin. Em dinêrin ne tiştêk tê guhertin û ne zulma zalima ji ser me kêmbibe û ne jî musulman di dinyê de dibin xwedî peyv. Hûn zanin sebaba vêya çîye. Sebaba vêna ew e ku me terka dîne xwe kiriye. Sebaba vêna ew e ku me terka 'emelkirina bi Qurana xwe kiriye. Sebaba vêna ew e ku terka rêya Pexemberê xwe kiriye.

Yek ji emrê Xwedê jî; emrê bi me'rûf e û nehya ji munkerê ye. Ev emrê hanê li ser her mislimanî bi qasî qûwet û zanebûna wî ferz e. Resûlê Xweda derbarê wî emrî de wiha kerem dîke: **"Ez sond dixum bi wî Xwedayê ku rihê min di deste qudreta wî de ye; yan hûnê emrê bi me'rûfê û nehya ji munkerê bikin, yan jî ewê Xwedayê Te'ala ji alî xwe de 'ezab û 'îqabekê bi ser we de bişîne û paşî hûn du'a jî bikin, du'ayên we nayên qebulkirin."** Ji

ber ku me îro ev emir bi cih ne aniye, 'ezab û gzebe-ke îlahî bi ser me de hatiye. Tu dibê qey 'alema Îslamê miriye, bûye cesedekî bêrih.

Ji Îbrahîm bîn Ethem (rha) pirsîne. Di heqê ayeta

وَقَالَ رَبُّكُمْ ادْعُونِي أَسْتَجِبْ لَكُمْ

**"Rebbê we dibêje gazi min bikin, ezê bersiva we bidim"** lê bele em du'a dîkin du'ayên me nayên qebûlkirin. Sebaba vêna çîye? Îbrahîm bîn Ethem ji wan re got: "Qelbê we bi sebaba deh (10) tiştan miriye, ji ber vê yekê du'ayên we qebûl nabin:

- 1- Hûn Xweda nas dîkin û heqqê wî yê ku li ser we hûn bi cih naynin.
- 2- Hûn Quranê dixwînin û pê'emel nakin.
- 3- Hûn dibêjin şeytan dijmin e û hûn hevaltiya wî dîkin.
- 4- Hûn dibêjin em ji Resûlê Xweda hez dîkin û hûn terka rê û sunneta wî dîkin.
- 5- Hûn îddî'a hezkirina cennetê dîkin û hûn jibo xwe naxebitin.
- 6- Hûn îddî'a tîrsa ji agirê cehennemê dîkin û hûn xwe ji guneha naparêzin.
- 7- Hûn dibêjin mirin heqq e lê hûn jê re hazirîyê nakin.
- 8- Hûn bi 'eyb û kêmasîyên geyrî xwe meşgûl dibin û 'eyb û kêmasîyên xwe jibîr dîkin.
- 9- Hûn rizqê ku xweda daye dixun, lêbelê hûn şukrê nî'metên wî nakin.
- 10- Hûn miriyê xwe bi destê xwe defn dîkin, lê hûn 'îbretê nagrin.

# XWEDÎYÊN BAĞA



✍ M. Emîn Zeynî

Ellah Rebbê me ye, her hebû û wê her hebe.

Carek ji caran, demek ji deman. Du cîran, zilamê malan, weke şêran, serê sibehan, diketine rêyan. Heya digihêne bağ û rezan. Dixebitîn, dibetilîn... Carna birçîbûn, tîbûn, êş û birîn... Carna jî xweşî, dilşadî, kêf û şahî... Bi vî awayî wext derbas dibû, roj dihilat, dîsa ava dibû, dewran dizivirî, demsal diqûlibî û helbet 'umir jî diborî.

Rojek ji rojan, nexweş ket yek ji wan. Hal lê nema. Taqet pê nema. Bi zor û zehmet, bi tehb û meşaqet, radibû, xwarina xwe dixwar. Êdî hew karibû here nav bağê xwe jî. Serê sibê, cîranê wî li derî xist. Û bangî xwediyê malê kir. Zarokê mezin dêrî vekir. Nexweşbûna bavê xwe wiha jê re got: "Emo! Bavê min ji şevê dî ve diêşe. Û xew neketiye ça'vê wî." "Xwedê silamet ke. Silava lê ke. Ezê çûherim, îşê min heye. Bağê min li benda min e."

Û berê xwe şûnde vegerand, biber bağê xwe ve çû. Vî zarokî jî ev xebera vî zilamî'eynî wisa dubare kir ji bavê xwe re. Bavê zarok jî wiha got: **"Hemd ji Xwedê re ku ew Xweda xwediyê me ye û xwediyê rizqê me ye. Kurê min! De ka gazî diya xwe bike, ezê tiştina ji we re bêjim."**

"Dayê! Dayê!" Deng hino hino kêmbû û gavek şûnde bi dawî bû. Bi sedema vî dengî, qasekî din pîreka

malê û sê zarok, li hemberî zilamê malê peyde bûn. Ode bêdeng bû û zilamê malê dest bi axaftina xwe kir: "Ez di seriyê axaftina xwe de hemd ji Xwedê re dikim. Em misilmanin, lazim e em qenc fêm bikin ku **çawa rehetî ji ba Ellah e, nexweşî jî, êş û kul jî ji ba Allah e. Ya girîng ew e ku hem di rehetiyê de hem jî di zehmetiyê de em şikir bikin. Û dîsa lazim e ku em piştî xebat û xîreta xwe, tewekul bikin. Lewra riziq ji ba Ellah e. Tiştên li ber wî zor û zehmet nînin. Ku bixwaze bi zêdeyî jî kare riziq bide me** û dikare bi hindikî jî bide me. Gotina min ew e ku hûn Xwuda jibîr nekin, bila herûher li bîra we be. Hûn jî dibînin ku ez diêşim, ez nikarim herime bağê xwe. Û tu kesê alîkariyê bide me jî nîne. Heger tiştêk ji min were, van gotinê min jibîr nekin..." Piştî van gotinan zarokê mezin bi dilsaftî bi vî awayî got: "Yabo! Ez û diya xwe emê herine bağ, fêkiyan biênîne mal."

Dê û bavê vî zarokî kenîyan bi vî gotinê. Lewra ne dema fêkiyan bû. Di nav rez de tenê darê zip û ziwa hebûn. "Eferim ji kûrê min re. Xwedê bi sitîrîne, kûrê min mezin bûye ji me re." Bi vî henekê şitexaliya li ser nexweşiyê xelas bû. Êdî behsa tiştne dî kirin. Heya dengê azana nivro. Piştî nimêjê, firavîna xwe xwarin. Car car henek, car car şîret roja xwe bo-



randin. Êvarî, nexweşiya zilamê mumin zêde dibû. Lewma nikaribû rakeve êvaran. Heya çil-pêncî rojî êşa vî zilamê mumin kêr nebû, heme wisa nexweş bû. Di van çil-pêncî rojî de heval û hogirê wî dihatine serdana wî. Di'ra ji hev re kirin, daxwaziyên hevdu bi qasî îmkana xwe anîne cî. Lê derdekî zilamê mumin hebû ku ne wî dianî ziman ne jî yekî din. Ev derd jî bêxwedîtiya rezê wî bû. Ji roja nexweş bûna zilamê mumin ve cîranê wî jî nehatibû cem. Wî tu caran gazin nedikir. Lewra zanibû bê çawa çe'vsor û xinzîr bû cîranê wî. Çawa aşîqê malê dinê bû, cîranê wî. Ev zanîna xwe bi tu kesî re hevpar nekiribû. Tenê carna di dilê xwe de derbas dikir.

Nexweşiya zilamê mumin hino hino kêr dibû. Êdî karibû rabe ser xwe bimeşe. Ew çend êvar bûn ku xewa xwe tam distend. Rojekê serê sibehê got; "ezê herim nav bağê xwe" û xwe amade kir. Piştî amadekirinê derket û dest bi rêya çûyinê kir. Li der û dora xwe temaşe dikir. Birastî jî baş guheribûn ewqas der. Heyirî mabû, lewra wî digot qey weqa wext derbas nebûbû. Piştê fikirî ku nexweşiya wî di wextê çandina giya û dara de dest pê kir hetanî wextê derketina fêkiyan. Yanî bê hema sê heyvan, bê hema demsalekê mabû di hindurê xênî de.

Zilamê mumin, pir meraq dikir bağê xwe. Hêdî hêdî nêzik bûbû. **Dema giha cem bağê xwe nihêrt ku axeke hişk û hola û dernê zip û ziwa. Pir heyirî ma bû, lê belê dîsa hemd ji Xwedê re kir. Lewra xebat û xîret nebe, jixwe wê halo be.** Hîna di vê rewşa tevlihev de cîranê wî hate cem. Merheba da zilamê mumin. Rewşa hev pirsîn. Rewşa zilamê mumin eşkere bû. Lê ne eşkere bû ku çima cîranê wî halo bikêfe. Adeta devê wî nedigihê hev ji kêfa. Zilamê mumin hinekî texmîn dikir, lê dîsa meraq dikir. Zanibû wê zû eşkere be sedema vê kefa ne di cî de. Lewma sebra xwe didomand. Piştî tev de li nav bağê zilamê mumin gerîyan, piço piço bi ber bağê dî ve diçûn. Gelekî nedûr bû. Hema qasekî di gihane bağên cîranê zilamê mumin. Dîsa heyirî ma zilamê mumin, lewra tu caran ev bağ halo şipişîn nedîtibûn. Tiştên zilamê mumin didît ev bûn: **Du rezên ji tirîyan hebûn, dora wan herdû rezan bi darê xurman girtibû, di nava wan da jî zeviyên çandinê hebûn. Wan her dû rezan jî, wisa ber**

**dabûn ku qe tu tişt ji wan kêr nemabû, di nava wan da jî cem diherikî.**

Zilamê mu'min bi van dîtina rehma Xweda anibû bîra xwe. Ji lew dihizirî û difikirî nî'metê Xweda. Û anî bîra xwe ku cîranê wî pir xebitibû. Yanî berdêla gîret û xebata wî Xweda jî ev rez û bağê bi bereket dabûyê. Heta zanibû ku hinek mal û milkên wî yê din jî hebû. Jibona van dewlemendiya tu caran hesûdî û zikreşiya misilmanê mu'min nekiribû. Lewra zanibû yê didê Ellah e û yê bistîne jî Ellah e. Hê zilamê mumin di nav van hest û nesta debû, zilamê din xwe da pêş û wiha got: **"Tu çima bi min ra têkoşinê dikî? Bi mal ez jî te hêzdartir im û zarên min jî ji zarên te pirtir in."** Hem diqerî hem jî di nava rezê xwe de diçû û xwe qure dikir: **"Ez guman nakim ku wê dawîya van rezan bîn, bawer dikim ku di hemû wextan de wê ev rez bimînin. Û ez goman nakim ku wê qiyamet jî çê bibe. Heke çê bibe jî dema ez herime bal Xwedayê xwe, bi rastî ezê rastî qencî yên hêj ji van çêtir bim."**

Hevalê wî yê xizan, zilamê mumin, ji wî re wiha bersiv da: **"Tu çawa wî Xwedayê ku ji xweliyê tu afirandiyî, paşê ji piçek av û piştê jî tu xistî merivek, înkâr dikî? Tu bawer nakî lê ez bawer dikim ku Ellah Xwedayê min e, ez jî Xwedayê xwe re tu kesî nakim şirik. Ka qey nabe gava tu herî nava rezê xwe weha bêji: Evna tev hêz û qeweta Allah e. Çiqa hêz û qeweteke mezin e! Hemû hêz û qewet bi Ellah in. A va tu dibînî ku mal û zarên min ji yên te kêmtir in. Dibe ku Xwedayê min hê jî rezê te çêtir bi min ra qenciyan bike û bi ser rezê te da jî ji ezmanan birûsk û aşitan bişîne, êdî ewa rezê te bibe xweliyeke zip û ziwa. Yan jî ava wî bikşîne binê zemîn ku êdî tu qe nikaribî li wê avê bigerî û bibînî."**

Piştî van peyvyan, zilamê mu'min ji cem vî zilamê kafir çû. Berê xwe da rezê xwe û meşiya. Dema kete nav rezê xwe bi dengê bilind wiha got: "Evana tev hêz û qeweta Ellah e. Çiqa hêz û qeweteke mezin e! Hemû hêz û qewet bi Ellah in. Hemd û şikir ji Ellah re. Ji wî Xaliqê Rehman û Rezzaq re..." Piştê zilamê mumin di nav rez de hinek karên dereng mayî pêk anî. Û berê xwe vê neqlê da mala xwe. Piştî gihaştê

mala xwe, tiştên wê rojê qewimîn yek bi yek ji pîreka xwe re hevpar kir. Û tevde bi misilmaniya xwe careke dî şikir kirin.

Piştire ne bi gelekî... Şev wek berê bû.. Heyv li cî bû.. Li dora heyvê bêjimar stêrk xemilî bûn... Û bêden-giya şevê..

Evna tev wek berê bûn... Piştî neh-deh sa'eta... Ku xelk tevde di xew de, fecrê veda.. Mumin tev yek bi yek radibûn, ku medh û tesbîhê Xweda bikin... Roj hilat.. Û xerabûna bêdangiya sibehê... Çûk û teyrik... Av û kêzik..

Û dengê heywanên cûr bi cûr. Yek bi yek pîrekên malan, dest bi karê sibeha kirin..

Zilamê kafir serê sibehê dîsa bi ber rezê xwe ve çû.. Nêzikî rez, pêjna ğerîb dihat zilamê kafir.. Hema lezand û qevzê xwe zêde kir. Adeta baz dida nav rezê xwe. Lewra tiştên xwuya dibûn, heger rast bin heqîqeten bûyereke pîr mezin qewimîbû. Hino hino nêzik bû û bere bere qelbê wî hê bêtir şikel lê dixist. Heyrî mabû, tu dibê qey ji ça'vên xwe bawer nedikir. Lerizî, hecîcî. Ça'vên wî beq bûn, taqeta wî nema ku li ser piya bisekne. Lewra hemû rezê wî belawela bûbû, qe nikaribû tu tiştî bike. Êdî destên xwe dan ser hev. Çokên xwe berdan ser axê. Û hema girî û girî... Di nava vî girîyê de ev heqîqet di-nihûrand: "Xwezîka min ji Xwedayê xwe re, qet'iyen tu tiştî ne kiriba şîrik"

"Ji bona wî komeke ku alîkariyê bike jî, ji ğeyrî Ellah tune bû. Ewî bi tenê jî nikaribû tiştêkî bike." "Di vê gavê da piştgirîya rast, ya Ellah e. Çi qencîyê Ellah bike, çêtir e û encam û aqîbeta wî tenê jî qencîr e." (Kehf 43-44)

## KURTAYÎ

Ji vê qîsse yê du fikrên cûda hatine pêşkêşkirin.

1: Fikra zilamê mu'min, ku ev zilam xizan û feqîr bû. Ji xeynî rezeq piçûk ji zêr û zîbera dinyê, tu tiştêkî wî nebû. Digel vana tevî zehmetî û nexweşîyê jî Ellah jibîr nedikir.

2: Fikra zilamê kafir. Digel debr û bereketê jî, digel mal û milkê zêde jî, wî Ellahê xwedyê her tiştî jibîr kiribû.

**Pêşniyar:** Teklif

**Şewirmend:** Danîşman

**Pejirandin:** Tanîmak, kabul etmek

**Aqilmend:** Akil, akıllı

## QURRETIYA KAFIR Û 'İSYAN

Zilamê kafir, bi mal û milkê xwe qurre bû û xwe mezin dît. Xaliqê xwe jibîr kir. Baweriya roja axretê jibîr kir. Ji lew xwe ji zilamê cîranê xwe mestir dît. Zen dikir ku hem di nav insanan de hem jî li cem Ellah biqedirtire. Dema bi cîranê xwe re diaxivî wiha got: "Ez bi mal û milkê jî bi zariyan jî ji te zexmtirim." Lewra li gor wî raserî û fezîlet bi mal û milkê bû. Neheqî li xwe kir û kete nav kufrê. Zen kir ku wê bağ û rezê wî, daîmî hebe û roja axretê tu car jî vejîn û rabûn çênabe. Û digot ku heke axret hebe jî, wê Xweda bağ û reznê bêhtir mezin bidê wî. Tenê zen dikir û digot zilamê kafir.

## TEWRA ZILAMÊ MU'MIN

Zilamê mumin xwe bi werîsê îman û heqîqetê girt. Ew ne xapand mal û milkê dinyayê. Û bi vî awayî diqêrî li hember zilamê kafir: "Ma qey tu înkâr dikî Rebbê ku tu ji axê, piştire ji dilopek avê afirandî-ye?" Zilamê mu'min, cîranê xwe de'wetî naskirina Xweda dikir. Dixwest ku zilamê kafir fêr bike lutf û rehma Xweda. Û nexape bi zêr û zîbera dinyayê. Û zanibe ku roja vejîn û rabûnê, roja dijwar a axretê li benda me tevaye. Zilamê mu'min di dawî de ew tirsand daku fêr bike wê ev bereketa van bağ û rezên heyî, rojekê biqede. Ev axa şîr û bigiya, bibe zip û ziwa. Û dîsa anî bîra wî ku wê ev ava diherike, rojekê bes biherike. An jî ger ava wî were çikandin, ma qey ji bilî Ellah, kî kare avê bêne?

## ŞİRET Û İBRET

- Mal û milkê zilamê kafir, jibona îmtîhanêye. Ne delîla ku Xweda ji vî zilamî hez dike.

- Ellah, Rezzaq e ku riziq dide. Wehhab e ku alîkariya bêgerew bexş dike. Xîret û xebata însan tenê wasîteye ji bo bidestxistina nî'met û rehmeta Allah.

- Mumin ew e ku şîretan dike li hevalê xwe li cîranê xwe. Û ji bo xelasiya insan herûher dixebite.

- Gerek menfî'etê demborî, zêr û ziberê xapînok ên dinyayê, muminan nexapîne.

- Kesên mumin hem di rahetê de hem jî di zehmetê de Xwedayê xwe jibîr nakin. Lewra zanin ku dînya warekî demborîye, warê zehmetê ye. Rahetî, xweşî li cennetêye.

**Gûman:** Zan, şûphe

**Kelax:** Leş

**Ajal:** Hayvan

**Rawêjkar:** Danîşman, müsteşar



# LI SER SÊ KILAMÊN KU BI TARXAN BEGÊ QELENYÊ VE 'ELEQEDAR IN

✍️ Cewdet Karaman

Geli xwendevanên hêja! Her wekî ku hun jî dizanin, me di van du jimarên dawî de navbir da rêzenivîsa xwe ya bi navê Tew Dinyayê. Ji ber ku me giraniya wexta xwe dabû ser Teza xweya lisansa bilind û tîpguhêziya Dîwana Mela me derfet nedî ku em li ser paşdîroka sitranan lêkolîn bikin. Ji lew em lêborîna xwe ji we dixwazin. Eger Allah Te'ala destûr bide emê ji îro pê ve lêkolîna xwe ya li ser hinek sitranên ku bingeha wan li ser hinek bûyerên nêzdîrokê dagirti ye bidomînin.

Mijara me ya di vê beşe de Tarxan Begê Qelenyê ango bi leqeba xwe ya meşhur Mîrpenc e. Navê wiyê eslî Tahir Xan e. Lê gelê Kurd carî'adeta xwe ya nebaş domandine û navê wî di bilêvkinê de guherandine kirine Tarxan Beg. Ji lew emê jî di vê nivîsa xwe de li ser wî carî'adete nebaş bimeşin û di vê nivîsa xwe de bi giranî navê wî wek Tarxan Beg bikarbin.

Berya Qelenî û Mako bav û bapîrên 'Eşîra Heydera di navbeyna Farqîn û Rihayê de bi koçerî jiyana xwe domandine. Dema ku Serhildanên Celalî destpêkiriye 'eşîra Heydera piştevaniya Celalîyan kiriye. Bi têkçûna serhildanê re Heyderî bi bal Serhedê ve hatine sirgûnkirin.

**Bi te'bîra E'hmedê Xanî** Dewleta 'Usmanî gelek 'Eşîrên Kurda piştî şerrê 'Usmanî û Sefewîyan di sînorê Îran û xwe de wek emniyet subabî ango wek kilîda ser'hedê bicîh kiriye. Ji ber ku 'Eşîra Heyderan xwedî hêzeke berbiçav bûne di nav Îran û Êris û 'Usmaniyan de bi ri'hetî nehatine parvekirin. Uris xwestiye ku Heyderî bi wan re 'hereket bikin, Îranê xwestiye ku li pişt wan bin, 'Usmaniyan jî gotine em hem mezhebdaş hem jî dindaş in. Dibê hun bi me re bin. Êris gotiye werin Rewan û Tiflîsê, Îranê gotiye li Mako bimînin, ev zozan besî we ye. Bi rastî derdê hersê aliya jî ne 'heskirina Kurda bû. Hersê alîya jî dixwest ku di şerrê sînora de Kurda ji xwe re wek mertal îstî'mal bikin. En nihayet ji ber ku Êris ne musulman in Kurd Êris ji xwe re wek neyarek qedîm dibinin û mêla xwe didin ser Îran û 'Usmaniyan. Paşê jî ji ber ku giraniya Kurda sûnnî ne Kurd bi giranî bi 'Usmaniyan re 'he-

reket dikin. Hinek mal û malbatên Kurda jî li Îranê li dorhêla Mako û Tewrêzê dimînin.

Bav û bapîrên Tarxan Begê jî malbatake ji wan malbata ye ku li Mako û Qelenyê bi cîh bûne. Ji ber ku zozanên Qelenyê têra wan nayê 'Elî Xanê Heyderî ji bo ku li hêla Melazgirê bên hêwirandin daxwznameyek ji paşayê Wanê re dişîne. Digel ku 'Usmanî destûr didin jî serokeşîrên 'Eşîra 'Hesenan naxwazin ku 'ela Heyderan li Melazgirê bi cîh bibin. Lewra herême hem wek milkê xwe dihesibînin hem jî dibên têra me nake Îcar Heyderî ji ku hatin. Ji lew Rizgan Axayê 'Hesenî leşkerên xwe kom dîke û jibo astengkirina Heyderan derdikeve qada şer. Di vî şerî de Midûrê Melzagirê Rizgan Axa ji teref 'Huseyn Begê kalikê Tarxan Beg ve tê kuştin. Ev kuştin dibe sebebê şerrek dûvdîrêj. 'Eşîra Heyderî û 'Hesenan gelek mêra ji hev dikujin. 'Heta Ustad Bedî'uz-zeman bi xwe jî di rîsala uxuwetê de şerrê 'Hesenan û Heyderan wek mînak nişan dide. Dibê: "Digel ku di nav xwe de neyarbûn jî dema ji derva ve êriş li yekî dihatkirin ê dî neyartîya navxweyî dida alîkî û dajot pişt wan wî."

Ennîhayet Malbata Tarxan Beg li Qelenyê dimînin. **Tarxan Beg li Qelenyê tê dinyayê.** Tarxan Begê Qelenyê bi neseba xwe ji beşek 'Eşîra Heydera ye ku ji malbata wan re Mala Şero tê gotin. Navê bavê wî Heyder Xan e.

Dîroka welidandina Tarxan Beg bi awayek qet'î ne diyar e. Em di derheqê jiyana wîya zaroktiyê de xwedî agahiyên berfireh nînin lê li gorî diroka buyerên ku Tarxan Beg tê de wek qeheremanek dixwiye em dikarin bêjin ku Tarxan Beg gelek sal berya 1829ê mîladî hatiye dinê. Lewra di vê tarîxê de li Îranê hakimê Bajarê Mako **Teymûr Xanê Qacarî** ye. Ji ber ku Tarxan di şerrê Îran û Êris de serdestiyek berbiçav bi dest dixwe Şahê Îranê digel gelek xelatan leqeba Mîrpenc jî li Tarxan Beg dîke. Piştî vê serdestiyê Tarxan Beg li Mako û Qeleniyê wek 'hakimekî serbixwe 'hereket dîke û serî bi xanedana Qacarî re dikşîne. Ev jî dibe sebebê çavnebarî û dexesîya Teymûr Xanê Qacarî. Teymûr Xan bi destûra şahê Îranê bi Kurdên



Celalî re tifaqek xurt çê dîke û bi heft hezar leşkerên Celalî re li Qelenyê diçe ser Tarxan Beg. Tarxan Beg nikare xwe li ber wan ragre artêşa wî têk diçe. Teymûr Xan û hevkarên xwe gelek zirar û ziyanê didin 'eşîra Tarxan Beg, bajarê wan wêran dikin, talana wan dibin û Tarxan Beg jî dîl digrin. Lê giregirê 'Eşîra Heyderan vê meselê dikin **mesela man û nemanê**, dighên hev û diçin ser hêzên Teymûr Xan û Celalîyan. Tarxan Beg ji nav lepê wan derdixin û rizgar dikin. Dema ku Tarxan beg tê rizgarkirin tê li Qelenyê seroktiya 'eşîra xwe didomîne. Di vê hengâme de serokê Xanedana Qaçar 'Ebbas Mîrze jî li ser text e. Jiber ku Tarxan Beg zimantûj û şervan bû gelege cara bi 'eşîrên der û dora xwe re şer kiriye. 'Heta car cara bazirganê Îran û 'Usmanîyan jî şêlandiye.

Piştî ku Tarxan Beg ji nav lepê Qaçariyan azad dibe tê li Qelenyê selteneta xwe di kemilîne û ji bo su'ûhbet û şêwr û mişêwrê diwanek mezin dadimezrîne. Jibo xweşbêşiya diwanê jî gelek dengbêja îstixdam dike. Di diwana Tarxan Beg de serekê dengbêja Şêx Silê ye. Şêx Silê li Qelenyê dengbêjek navdar e. Di wê heyamê de jî **Surmeli Memed Paşa li Bazidê** 'hukumerma ye. Diwana wî jî damezrandî ye. Di diwana wî de serekê dengbêja, homerosê Kurda dengbêjê bi nav û deng 'Evdalê Zeynikê ye.

**Evdalê Zeynikê** wisa bi nav û deng e ku olama nav û dengê wî gihaye Qelenyê. Ji lew gelek dengbêjên Qelenyê dixwazin ku hem 'Evdal bibînin hem jî dengbêjiya wî bi ceribînin. Rojek ji roja ji hêla Ser'hedê dengbêjek dibhîze ku navû dengê 'Evdal li Qelenyê buye benîştê ser zarê herkesi û herkes dixwaze ku 'Evdal bibîne. Ji lew radibe xwe dike dilqê 'Evdal û diçe Qelenyê dibê: 'Evdalê Zeynê ez im. Wexta ku ev xeber li Qelenyê belav dibe, Tarxan Beg wî vedixwîne seraya xwe da ku bi dengbêjên wî re bikeve lecê. Lê dengbêjê dilqê 'Evdal di destpêkê de mat dibe û têk diçe. Ev jî dibe sebebê 'henek û laqirdiya. Li ser vê bûyerê Tarxan Beg ji Surmeli Memed paşa re xeberê dişîne dibê: "Ma dengbêjê teyê navdar û 'Evdalê meşhur ev lewazok bû ku di du sê kilama de teslîmî dengbêjê min bû. Ji kerema xwe were Qelenyê şad û şudê dengbêja bibîne." Wexta ev xeber dighê Surmeli Memed paşa Surmeli Memed paşa 'Evdal vedixwîne seraya xwe û jê dipirse:

-Gelo tu çima bê xebera min çû Qelenyê? Te hem min û hem xwe rezil kir. Madem tu bi xwe ewle nebû tu çima çû seraya Tarxan Beg? Lazim e tu vê geremola xwe paqij kî. 'Evdal sond dixwe ku neçûye Qelen-

yê. Lê îcar destûra çûna Qelenyê ji Surmeli Memed paşa dixwaze. Çend şahidên ku Surmeli Memed paşa ji wan ewledar e digre û diçe Qelenyê. Ji gelê herêmê çiyê seraya Tarxan Beg hîn dike û diçe bal wî. Surmeli Memed paşa jî nameyek dinvise û bi şahida re ji Tarxan Beg re dişîne. Dibê: "Dengbêjê minê rast ev e. Yê ku berê hatiye ne 'Evdal bû belkî yekî di bû ku xwe kir dilqê 'Evdal. **Hodri meydan**. Tu bê minetî kîjan dengbêjê xwe derdixî pêş 'Evdal derxe."

Wexta name û 'Evdal dighên Tarxan Beg, Tarxan Beg diwana xwe kom dike û dengbêjê xwe dicivîne. Îdî dor dora dengbêja ye. Di diwanê de denbbêjê Tarxan Beg Şêx Silê û 'Evdal 'heft şev û heft roja dikevin qirika hev û lec dikin. Roja hefta gewriya Şêx Silê diwerime û Şêx Silê bi van peyva serdestiya 'Evdal û Sûrmeli Memed paşa qebûl dike.

**Lo lo 'Evdal lo lawo!** Sibe bû ca bêje bêje bejna min ne kine ne dirêje

Lê bejna 'Evdalê Zeynikê fenanî tayek ji tayê rihana Li devê geliyan û newalan mesîla şax davêje Malmîrato hela ji wê derê rabe were qasekî li kêleka min rûnê

Ji derd û kulê min û xwe ra têr bibêje

Bira wer'ad û wer exte be

Li ber destê te w Tarxan Begê tevê cima'etê w komê mêvana

Hetanî navê te li dinyayê hebe êdî Şêx Silê Nabê ez dengbêje

Li ser vê teslîmbûna Şêx Silê Tarxan Beg radibe gelek xelatên giranbiha dide 'Evdal û wek bersiv nameyek bi 'Evdal re ji Surmeli memed paşa re re dişîne. Tarxan Beg di vê namê de hem pesnê 'Evdal dide hem serdestiya wî qebûl dike hem jî Surmeli Memet Paşa pîroz dike.

Dema em li arşivên 'Usmanîyan mêze dikin em dibînin ku di sala 1893ê miladî de ji ber mesela keçrevandinekî di nabeyna Tarxan Beg û Heyderiyên Tirkîyê de nexweşînek derketiye. Şêwirmendê 'Usmanîyan Muşîr Şakir paşa ji bo çareserîya vê nexweşîne gelek xebitiye. Dîsa di arşiva 'Usmanîyan de li ser Kuştina Tarxan Beg qeydek heye.

Lê dema ku em bi dûrbînek hûrgulî li sitranê dengbêja mêze dikin em dibînin ku di nabeyna Tarxan Beg û 'Huseyn Begê Takorî de gelek cara şer qewimiye. Neyartiyek wanê Qedîm hebûye. Ji lew herdû alîya gelek cara êriş birine ser hev malê hevdû talan kirine. Lewra di gel ku Îslamê ev karê nebaş qedexe kiribû jî di wê demê de talan û şêlandina aşîkar wek



nîşanê mêrxasiyê dihat qebûlkin.

Tarxan Begê Qelenyê di sala 1906ê miladî de êrişek bir ser 'Eşîra 'Huseyn Begê Takorî lê di vî şerî de kurê wî hat kuştin. Ev kuştin bû kederek mezin û ket dilê Tarxan Beg. Tarxan Beg piştî çend rojên di se' h kir ku kurê 'Huseyn Begê Takorî miriye û Êla Takorîyan bi şînê ve meş'xûl in, furseta ku Tarxan Beg lê dikudand hatibû ber derî. Lewma Tarxan Beg êrişek gumra'h bir ser Huseyn Beg û êla Takorîya. 'Huseyn Begê Takorî bi mela û rûsiyan re Qur'an şand pêşiya Tahir Xan. Rica û dexalet kir ku Tarxan Beg dev ji êrişê berde. Lê Tarxan Beg sond xwaribû ku wê hem 'Husyn Beg bikuje, hem talana wi bibe, hem jî pîreka wî bavê terkîya hespa xwe ya bi navê Gogerçîn û hespa xwe bibe li ser Mêrga Melxîna li ba nalbenda nal bike û here. Huseyn beg nihêrî ku niyeta tarxan Beg xerab e rabû 'êla xwe civand û derket qada şer. Lê dîsa dilê wî nedixwest îcar wî bi xwe ji Tarxan Beg re got:

–“Tahir xan! Ez bi gorî te bim. Ez xwe davê m bextê te. Rabe dev ji vî karê nebaş berde. Bacê dixwazî bac bidim te. Xwînê dixwazî ez bihayê xwîna te bidim. Tu bi qedrê Qur'anê kî dev ji vê xerabiyê berde. Hem êla me hem êla we perişan bû.” Lê Tarxan carkî sond xwaribû û ji sonda xwe venedigerî. En nihayet şer derket. Xulamê 'Huseyn Begê Takorî derbek berî bedena Tarxan Beg da ew û sê giregirên wî kuşt. Piştî kuştina Tahir Xan leşkerên wî cenazê wî hiştin û revîn. Huseyn Beg rabû cenazê wî anî şûşt, kefen kir, limêja wî kir û da ser piştê Gogerçîn, bir Mêrga Melxîna, li cem nalbenda hespê wî nalkir û ji Êla Tarxan Beg re xeber şand da ku bên cenazê xwe bibin. Êla Tarxan Begê tîn cinazê wî dibin û diçin.

Ev bûyer di nav Heyderî Takorîyan de bû sebebê kîn û hesûdiyêk dûvdirej. Heta gelek sal piştî vê bûyerê pismamê Tarxan Beg Kor Huseyn Paşa jî li pêy tola Tarxan Beg geriya lê bi ser neket.

**Gelî xwendavanê hêja! Bi rastî mewzûbe'hs dûvdirej e.** Meriv dikare di vî warî de kitêbek taybet binvîs e. Lê ji ber ku sînore nivîsa me mehdûde em di vî warî de ji devê dengbêja tenê van hersê sitrana teqdimê we dikin. Di her sitranekî de be'hsa bûyerek muhîm tê kirin ku di jiyana Tarxan Beg de wek muhrek guherînê cihê xwe girtine. Sitrana yekemîn Kila ma Şerrê Tarxan Beg û Teymûr Xanê Qaçarî. A duduya leca 'Evadl û Şêx Silê ye ku bûyer di seraya Tarxan Beg de pêk hatiye. A sîsiya jî kilama Şerrê Tarxan Beg û Huseyn Begê Takorî ye ku Tarxan Beg di vî şerî de

hatiye kuştin û dinya xwe guherandî ye. De kerem kin em bi hev re guh bidin degbêjên xwe.

## KILAMA ŞERÊ TARXAN BEG Û ŞAHÊ 'ECEM



Wayê waa... x

De lo lo de lo lo de lo ....

Ax de lo de lo lo ....

De lo lo de lo rabin lêxin ez birîndar im bira

Wayê wayê

Lê lê dayê rebbenê sibe ye

Şerekî li me qewimiye li qeleniyê

Ji kula dilê min re surekî çiqasî sar e

Xwedayo tu xirav bikî qalekî li me qewimî

Li xopana qelenyê bê bi dar e

Nigara li deste bavê Zezê kekê Cemilê Şîraz e

Welatê jê re ezan nema ye beje gelo serkêşa li serî karîbar e

Mi dî ji siva xwedê da çivîkê li ber derê bavê Zezê kekê cemilê zar e zar e

Cemilê bi sê denga dikere gazî go:

Lê lê Zezê rebenê! Here bêje Tarxan begê

Bê bav were ji bo çivîka ruxê pê ra we rayê

Eskerê Şahê Ecem giran e

Eskerê te hindike yeqîn li dinyayê pê nikar e

Uy waaax ayê

Lo lo keko

Belkî Rebbê 'alemê li dewrana dinyalikê

Ji kesî re xirav neyne gelek zor û zehmet e

Têrpaşa li pêşiyê di deste Tarxan begê da

Selam da li meydanê

Bi Zezo da zare zare lo lo lo

Ê lo lo lo... Hû lo lo hû lo lo...

Ax bê de lo lo de lo lo...

De rabin lêxin ez birîndarim bira

Wayê wayê waaa..x û waa...x



Lê dayêê...

Rebenê sibe ye şerekî li me qewimîye li qelenyê  
Ji kula dilê min ra bêje gelo li sêgira  
Xwedawo tu xirav bikî qalekî li me çêbû li xopana Qe-  
lenyê

Bêje gelo li sê gira

Tivinga Tarxanê bira ji êvara Xwedê de li ser çokê

Diçirise fenanî çira

Tarxan begê bi sê dengê dikire gazî go:

Lo lo Ehmeda bira uyîî

Lo lo keko tu çê be çê lêxîne

Mer be mer bi sekine

Perê Konanî jêr bernede

Şerrê do êvarê şerrê xelkê bû

Yeqîn bikî ji siva xwedê da

Şerrê vî gawirî hatiye ser mile me herdû bira

Lo lo lo... oy

Ax lo lo lo lo .... hû lo lo.....

Wayê wayê waa...x

Ax bê de lo lo lo de lo lo .....

De rabe lêxe bavê min kela mêra ne

Ûyî ûyî waax û wax

Zeze dikire gazî go

Lê lê Cemilê rebenê bêje gelo bavê min kela mêra ne  
Tarxan beg rabû ranebû ji hefta saliya xwe da federe-  
karê ber Kurda ne

Ez ji te ra sond bixwim bi sonda Quranê

Tirsa kekê min tune ji eskerê şahê 'Ecem

Ez çi bikim sibê ra qir bikevê

bi pêşiya me kete koma celalya ne Lo lo lo

Ê lo lo lo ...Hû lo lo hû lo lo...

Ax bê de lo lo de lo lo....

De rabe lêxe Mîrpenço bira bira

Wayê wayê waaa..x û waa...x

### KILAMA 'EVDAL Û ŞÊX SILÊ

Were lo yemaaa... n

'Evdal dikire gazî go lo lo Şêx Silê lo lawo sibe bû

Dîdem e ji kula dilê min û te ra xweş Dîdem e

Le sîngê min kirtûka dengbêja zarê min qelem e

Ez geriyam li gobeka dinyalikê

Min dengbêj bi ser xwe ra nedîtin

Min nav û dengê te bihîstibû li Îranê li Qelenyê li top-  
ra'xa 'Ecem e

Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n

Şêx Silê dikire gazî go lo lo 'Evdal lo lawo



Ca bêje gelo ez ku heme Şêx Silê me

Ez gula govendê me çokdarê dîwana bavê Cemilê me

Ez dengbêjê Tarxan Begê me

Donzde salê min tamam bûn lo lawo li Qelenyê me

Ez ku heme li 'erasa meydanê tim cara qîle pêş çavê  
dengbêjê xelkê me

Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n

Şêx Silê dikire gazî go lo lo 'Evdal! Lo lawo sibe bû

Dilê min bûye pirenga serê 'heft newal û donzde mesîla

Ezê rabim tê re derbas bikim cotek karê kar'hezala

Bira Tarxan Beg tevî komê mêvana şahidê orta min û  
tebin

Ez sibê vî çaxî 'Evdalê Zeynikê bi ser Topraxqelê de  
rast dikim

Serqot pêxwas û piştevala

Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n

'Evdal dikire gazî go lo lo Şêx Silê lo lawo! Sibe bû dîsa  
ca bê je

Gelo şa'îrî newisa ye devê xwe top bike eva dîwana  
maqûla ye

Meriv bi qedîne sefa ye meriv neqedîne paşê li serê  
meriva bela ye

Herçî kesê di meclîsa de rûnê med'hê xwe bide daîma  
rûreş e barê wî ka ye

Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n

Şêx Silê dikire gazî go lo lo 'Evdal lo lawo! Sibe ye bira  
Îran bi şewite

Tu ji destê min xelas nabe nizamî ciyê xwe çê ke li  
asîmanê hefta

Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman



Were lo yemaaa... n  
 'Evdal dikire gazî go  
 Lo lo Şêx Silê lo lawo! Sibeye min dî dîsa lafê te li  
 dîwanê gure gure  
 Le çerxa felekê rast tê cara lê dixîne çep dizvire  
 Şêx Silê bi dengbêjî 'Evdal bi Xwedayê xwe difire  
 Le sibê vî çaxî mêze bike 'Evdalê Zeynikê rizqê çolix û  
 çocu'xê te li Îranê bibire  
 Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n  
 Şêx Silê dikire gazî go  
 Lo lo 'Evdal lo lawo! Ca bêje gelo dîsa vê sibengê li  
 minê ha li minê  
 Tu ji kavilya Turkiyayê ji Toprxaqelê  
 Bi rê ketî hatîbû Îranê Qelenyê ser Şêx Silê mala mirinê  
 Bira Tarxan Beg û tevî komê mêvana w cima'etê şahî-  
 dê orta min û te bin  
 Eger bi sibê re ji me herduya kîjanî kîjan hal kir  
 Emê qewlekî deynin li ser poz û guhjêkirinê  
 Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n  
 'Evdal dikire gazî go lo lo Şêx Silê lo lawo! Sibe ye  
 Ca beje gelo sura sibê bîna bayê Îranê tê lê dixê li ka-  
 vilya Qelenyê gure gure  
 Herçî kesê ji vê soza xwe poşman be bira ji dînê xwe  
 bizvire  
 Bira Tarxan Beg û tevî komê mêvana w cima'etê şahî-  
 dê orta min û te bin  
 Îro bi sibê re ji me herduya kîjanî kîjan hal kir  
 Bira tarxan Beg ji me herduya poz û guhê yekî jêke  
 xwîna yekî bikire  
 Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n  
 Şêx Silê dikire gazî go  
 Lo lo 'Evdal lo lawo! Sibe bû ca beje gelo bejna min ne  
 kine ne dirêje  
 Le bejna 'Evdalê Zeynikê fenanî tayek ji tayê rihana  
 Li devê geliyan û newalan mesîla şax davêje  
 Malmîrato hela ji wê derê rabe were qasekî li kêleka  
 min rûnê  
 Ji derd û kulê min û xwe ra têr bibêje  
 Bira wer ad û wer exte be  
 Li ber destê te û Tarxan Begê tevê cima'etê w komê  
 mêvana  
 Hetanî navê te li dinyayê hebe êdî Şêx Silê Nabê ez

dengbê je  
 Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

Were lo yemaaa... n  
 'Evdal dikire gazî go  
 Lo lo Şêx Silê lo lawo! Sibe bû bira li me nehatiya sura  
 sibê bîna bayê Qeleniyê  
 Malmîrato! Min ji te ra nego germ e ji xwe ra li Îranê  
 bike dengbêjîyê  
 Tu dengbêjî lawo nizanî bi sira şairiyê  
 Ez nizanîm ustadê te kî ye ustadê min Şêxê Nêrî ye  
 Lo yeman lo yeman lo yeman lo lo yeman yeman

### KILAMA ŞERÊ TARXAN Û 'HUSEYN BEGÊ TAKORÎ

Bê de lo lo lo lo .... lo bira  
 Le Zezê dikire gazî digo Cemilê porkirkurê dêranê



Xwedê xera bike ji kula dilê min û te ra Zozanê Ele-  
 ganê zozanekî sar e  
 Cixara destê deste bavê min porkurê kîraz e taxima li  
 serî karîbar e  
 De rabe em herin, ez bejim bavo tu beje kekê  
 Ez bi qurban vê sibengê derê xwe mor neke neçe ser  
 'Huseyn Begê Takorî  
 Bîna bayê fexrê bi ber pozê te ketiye  
 Rebbê 'alemê rebbek mezine fexrê qebûl nake  
 Wê ji esmanê jorîn agir bi eskerê te de bibare  
 'Erf û 'adetê dinê ye  
 Bihêle bira 'Huseyn Beg cinazê xwe ji erde hilîne  
 Çend roja bi dilê xwe şîna xwe bi gerîne  
 Malmîrato tu Qur'anê qebûl nakî  
 Wê ji 'esmanê hefta agir bi te de bibare de lo lo ax de  
 lo lo wayê waa...x  
 Ha hî wayê wayê waa...x

Bê de lo lo o ... ez neminim nemayê  
 Mi dî sibeye 'Huseyn Begê Takorî rabû  
 Bi sê denga dikire gazî go



Tahir Xan Bira Qur'an di nav min û te da be

### **Tu bi Xwedê ki Xwedê dihebîni**

#### **Ji min bigere dev ji xerabiyê berde**

Rabe bi dizgîna Gogerçîn bigre vegere

Dema 'Husyn Begê takorî vê gotinê dibe di zikrine

Tarxan Beg qamçiyê li ser qamçî li Gogerçîn dixîne

Bîna bayê fexrê li ber poza diçe tê

Xwe ji bo şer di şidînê

Le rebbê 'alemê pê re nabe serî nadomîne

Sê Cinazê Mala Şero li 'erasa meydanê bê xweyî dimîne

Ax de lo lo nemim nemayê neminim li dinyayê

Ha hî wayê wayê waa....x

Bê de lo lo lo lo ..... lo bira

Cemilê go, Zezê rebenê porkurê dêranê

De rabe here Mîrata Qelenyê

Bi şewite ji berê de war û meskenê mêr û mêrxasa ye

De tu bala xwe bide li Tarxan Begê simbêl qeytan

Digeriya li bê xwedîya Qelenyê

#### **Forsê bavê min fenanî forsê şahê 'ecem bûn**

Lê lê daye dêranê ez çi bikim bîna bayê fexrê bi ber pozê bavê min ket

Cinazê bavê min maye li deştê bê xwedî û bê xwe-  
da ne

De lo lo neminim neminim li dinyayê

Ha hî wayê wayê waa....x

Bê de lo lo lo lo... lo axawo

Axawo bihare dilê min çivîka li ser benda

Bêxwediyê Gogerçîn par vê çaxa

Di bin bavê Zezê de dibezî li ser zenda

Le îro cinazê Tahir xan dane ser piştê

Demeşînin Deştê Melxîna dibin ser nal û nalbenda

Bê de lo lo de lo lo de lo lo

Xelqê wînda kiriye teke û tûke gede û sûtalên di  
dinayê

Min 'Evdala Xwedê wînda kiriye xanê mîrpenç

Tîrsa dilê şahê 'Ecem Tahir Xanê xwe li dinayê

Ax de lo lo de lo

Bê de lo lo lo lo... lo axawo

Cemilê dikir gazî digo Zezê porkurê dêranê

Zozanê Mala Şero zozanê eleganê

Par van çaxa zozanekî şên bu

Lê diçêrîn keriyê berx û miya

Gogerçîn bi çargavê dimeşî li ser mêrg û kanîya

Taxima ci'xara deste bavê Zezê di çirişî fenanî  
yaq'utek ji yaqûtê li qelenyê

Ez çi bikim îro çerxa felekê ters vegeerî çira bavê min  
temirî

Qanz û qulinga hêlîna xwe çêkiriye li mexelê Êla  
Tarxan Begê

Tu dêna xwe bide dizgîna Gogerçîn ketiye destê  
Huseyn begê Takorî

Dimeşîne bi ser sera mexîna ve hespê nal dike li ba  
nalbenda

Ax de lo lo de lo neminim nemayê neminim li din-  
yayê

Gelî xwendevanên hêja! Bi vî hawî beşa 18.ê re-  
zenivîsa me a li ser hinek sitranên nêzdîroka me jî  
bi dawî bû. Heta jimara dî bimînin di xêr û xweşiyê  
de. Em ji we re duadar in ji duayê we hêvîdar in. Fî  
emanillah

1-) 'Eşîra takorî jî wek 'Eşîra Heyderî li hêla Îrana bîlxase li dorhêla deştê Melxîna dijîn.


1-) Di meqaleki nivîskarê Êzîdî eskerê Boyik de mealen agahiyek wihareng heye ku Cangir Axa Tahir xan kuştiye. Lê me ev agahî piştrast nekir. Pişporê Folklorê Kurmacî 'Ehmed Aras jî bi wesîla telefonê ji me re got ku tu 'eleqekî Cangir Axa û kuştina Tahir Xan nîne. Lê dîsa jî emê vê agahiyê wek jêrenot bi we re parve bikin. Mealên agahiya Eskerê Boyik wihareng e: Dema ku Tarxan Beg malê Takoriya şêland û talana 'Huseyn Beg bir, merivên Huseyn Begê Takorî hewara xwe bi ser Cangir A'xayê 'Ezîdiyê serekê 'eşîra Zuqurî de birin. Lewra Cangir axa hem mêrxas, hem xîretkêş hem qedirşinas bû hem jî gelek çekdarên wî hebûn. Wexta hewar gihîşt Cangir Axa, Cangir A'xa xwe avêt bextê Tarxan Begê da ku Tarxan Beg talana Takoriyan bi ser wî re nebe. Cangir axa jî Tarxan Beg dexalet kir û got:

-Tarxan Beg! Tu merivek heyfî. Were dev ji vê nebaşiyê berde. Talana Takoriyan vegeerîne û bi selameti bi ser me re derbas bibe here. Wexta ku ev gotin ji devê Cangir axa derdikevin Tarxan Beg bi Quretî dibe:

-Hey Cengoyê lawê Xetîb! Ez bi sere Şêx Adiyê te kim piştî Takoriyan dora te ye. Hê gotin di deve Tarxan Beg de ye Cangir axa qalikê serê Tarxan beg bi gulê re hiltîne. Leşkerên Cangir A'xayê Zuqurî gelek kesan ji 'eşîra Tarxan Begê dikujin. Leşkerên Tarxan Beg yên mayî piştî kuştina Tarxan beg di bin zikê hespa de bi mexlûbî, cinazê Tarxan Beg dihêlin direvin û diçin.



# Bexçê Zarokan



## ZAROKNO !!!

Bi navê Xweda yê **Rehman û Rehîm...**

Selat û selam li ser pêxemberê me **Hz. Mûhemmed Mûstefa (s.x.l)**, li ser ehlê beyta wî û temamê muminan be. Û li ser we zarokên xwendevanê kovara kelhaamed be.

Xuşk û birayên me yên bi qedr û qîmet! Xweda te'ala kire qismet, kovara **Kelhaamed** dîsa bi hejmareke xwe ya têr û tije derket!

Hema ji xwe ne hewceye ku ez bipirsim bê ka **gelo we hedîsên hejmara borî ku ji bo ezber kirinê** hatibû weşandin we ezber kirîye an na? Ez pê dizanim ku we hemî tev ezber kirine. Ê ji xwe tev hêsan bûn ne wusa?

**Belê di vê hejmara xwe ya nû de jî emê hem bikenin, hem bifikirin û hem jî ders û şîretan jê hilînin.**

Berîya ez we bi baxçê zarokan re bi tenê bihêlim, heta hejmareke din ez we emanetî Xweda dikim. Her şad û bextewar bin.



# Bexçê Zarokan



## DERDÊ NANO JÎ DANO YE

Rojekê du zarok bi kelecana hatin ba dîktor. Wusa bi bazdan hatine ku hilm li wan çikyaye.

Dîktor dipirse: “Xêre law hûn çima ewqas hilmçikyayî bûne? Ma qey nexweşekî we yê giran heye?”

Yek ji wan zarokan dibêje: “Belê dîktor beg, min ğar (şaqûl) daqurtandîye û ez dixwazim ku hûn wê ji nav hûrê min derxînin.”

Dîktor, difitile ser zarokê din û ji wî jî dipirse: “Xêre yê te, çi bi te hatiye?” zarokê duyemîn dibêje: “dîktor beg, ew xara (şaqûla) ku wî daqurtandîye ew ya min e. Ez li hêvîyê me ku hûn wê derxînin ezê xara xwe bibim.”

Dîktor hema wusa di ber xwe de dibêje: “Erê law derdê nano jî dano ye.”



## GER WUSA YE ÇIMA QESABA NAKUJIN?

Mamoste ji xwendekaran pirsî gelo çima xelkê gunda gurê çîya dikujin?

Gelekî xwendekaran tilîyên xwe bilind kirin. Mamoste ji Mehemed ‘Elî re got: “De ka bira Mehemed ‘Elî bi cewab bike.” Mehemed ‘Elî rabû ser pîya û got: “Mamoste, ji ber ku gur berxa dike û dixwe lewma wî dikujin.” Husyîn hema ji cîhê xwe rabû got: “Ê wê demê çima qesaban nakujin?”





## SÛALA PÊ DERXIN (PIRSAN BI CEWAB BIKIN)

Di vî qismî de jî çend pirsên me henin. Ger hûn cewaba wan nizanibin, hûnê bi'elimin hîn bibin. Pirsên ji we re pir zor û giran bèn hebin, bi alîkariya mezinên malê li cewaba wan bigerin û hîn bibin. Ji xwe ger hûn cewaba wan bizanibin jî wê zanîna we bêhtir qewî bibe. De haydê Bîsmîllah...

1) Em însan ji axê, cin jî ji êgir hatine xuluqandin,

lê melaîket ji çî hatine xuluqandin?

A) ji avê    B) ji axê    C) ji êgir    D) ji Nûra Xweda

2) Melaîket pîrekin an jî Mêrin?

A) Pîrek    B) Mêr  
C) Ne pîrek û ne jî mêr    D) Pîrek jî henin, mêr jî henin

3) Li gorî hedîsa pêxemberê me "..... stûna dîne."

A) Qu'an    B) Nimêj    C) Sunnet    D) Kâbe

4) Şertên îmanê çend in û çînin? Ka bifikirin, ger nehat hişê we an jî we pê dernexist, herin ba mezinên malê, bila ji wer alîkar bin.


5) Şertên Îslamê çend in û çînin? Ka bifikirin, ger nehat hişê we an jî we pê dernexist, herin ba mezinên malê bila ji wer alîkar bin.



Be xwe zûn

# Berçê Zarokan

## HÛN DIKARIN SÊ CARAN LI SER HEV BI LEZ BIBÊJIN?



- Rovî li rê zîvirî rê li rovî zîvirî.
- Yek camêr û yek ne mêr, yekî rahiştiye kêr, ê din rahiştiye tevr û bêr.
- Yek li mal, yek bi bar, yek li kar, ji wan kêye kal, kêye xal
- Kurm qurm qulkir

## TIŞTEK BALKÊŞ!

C-ebraîl A-zraîl M-îkaîl Î-srafil Bû çî? Bû **CAMÎ**. We berî niha zanibû?

## MA HÛN EVANA DIZANIN?

- ⇒ Gêrîk dikarin bi qasi du hefteyan di binê avê de bijîn (bimînin)
- ⇒ Gêrîk dikarin barê 50 qatî ji xwe girantir hilgirin
- ⇒ Mar dikarin sê salan razên di xewde bimînin
- ⇒ Neynokê desta 4 qatî bêhtir ji yê linga zûtir dirêj dibe.
- ⇒ 47 heb diranên kelmêşan hene.
- ⇒ Di temamê dinyayê de herî zêde navê **MÛHEMMED** li zarokan tê danîn.

